

T. C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Şeyhmus ORKİN

FEQÎYÊ TEYRAN'IN ŞİİRLERİNDE TASAVVUFÎ UNSURLAR

YÜKSEK LİSANS TEZİ

MUŞ – 2015

T. C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Şeyhmus ORKİN

FEQİYÊ TEYRAN'IN ŞİİRLERİNDE TASAVVUFÎ UNSURLAR

YÜKSEK LİSANS TEZİ

TEZ YÖNETİCİSİ

Doç. Dr. Nurullah ULUTAŞ

MUŞ – 2015

K. T.
ZANÎNGEHA ALPARSLAN A MÛŞÊ
ENSTÎTUYA ZANISTÊN CIVAKÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Şeyhmus ORKÎN

DI BERHEMÊN FEQÎYÊ TEYRAN DE HÊMANÊN TESEWUFÎ

TEZA LÎSANS A BILIND

RÊVEBIRÊ TEZÊ

Doç. Dr. Nurullah ULUTAŞ

MÛŞ - 2015


SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜ'NE

Muş Alparslan Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlanmış olduğum “Di Berhemên Feqîyê Teyran de Hêmanên Tesewuff” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

Tezim sadece Muş Alparslan Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

Teziminyıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.


22.12.2015

Şeyhmus ORKİN

TEZ KABUL TUTANAĐI
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĐÜNE

Doç. Dr. Nurullah ULUTAŞ danışmanlığında, Şeyhmus ORKİN tarafından hazırlanan bu çalışma 22/ 12 /2015 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan : Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ

Danışman : Doç. Dr. Nurullah ULUTAŞ

Jüri Üyesi : Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ

İmza: .....

İmza: .....

İmza: .....

NAVEROK

NAVEROK	I
ÖZET.....	VI
KURTE.....	VII
ABSTRACT	VIII
PÊŞGOTIN.....	IX
KURTEBÊJE	X
DESTPÊK	1

BEŞA YEKEM

JÎYANA FEQÎYÊ TEYRAN Û BERHEMÊN WÎ

1. 1. JÎYANA FEQÎYÊ TEYRAN	6
1. 2. NAV Û MEXLESÊN WÎ.....	8
1. 3. XWENDINA FEQÎYÊ TEYRAN	14
1. 4. KESAYETÎYA WÎ YA EDEBÎ Û BERHEMÊN WÎ	15
1. 4. 1. Kesayetîya Wî Ya Edebî	16
1. 4. 2. Berhemên Wî	21
1. 4. 2. 1. Di Warê Ruxsarîyê De Berhemên Wî	22
1. 4. 2. 1. 1. Cureyên Nezmê	22
1. 4. 2. 1. 1. 1. Qesîde	22
1. 4. 2. 1. 1. 2. Xezel	23
1. 4. 2. 1. 1. 3. Muselles	26
1. 4. 2. 1. 1. 4. Mureba'	26
1. 4. 2. 1. 1. 5. Mesnewî.....	26
1. 4. 2. 1. 2. Hêmanên Ahengî.....	27
1. 4. 2. 1. 2. 1. Wezn	27

1. 4. 2. 1. 2. 2. Qafiye	28
1. 4. 2. 1. 2. 2. 1. Qafiyeya Lawaz	28
1. 4. 2. 1. 2. 2. 2. Qafiyeya Asayî	28
1. 4. 2. 1. 2. 2. 3. Qafiyeya Zêdebar	28
1. 4. 2. 1. 2. 3. Redîf	29
1. 4. 2. 2. Di Warê Naverokê De Berhemên Wî.....	29
1. 4. 2. 2. 1. Şêx Sen'an	29
1. 4. 2. 2. 2. Bersîsê 'Abid	31
1. 4. 2. 2. 3. Zembîlfiroş	32
1. 4. 2. 2. 4. Kela Dimdim	33
1. 4. 2. 2. 5. Ellah Çi Zatek Ehsen e	34
1. 4. 2. 2. 6. Ey Av û Av	34
1. 4. 2. 2. 7. Îro Ji Dest Husna Hebîb	35
1. 4. 2. 2. 8. Bi Çar Kerîman	36
1. 4. 2. 2. 9. Îro Girya Me Tê	36
1. 4. 2. 2. 10. Feqe û Bilbil	36
1. 4. 2. 2. 11. Dilber	37
1. 4. 2. 2. 12. Feqe û Melê	37
1. 4. 2. 2. 13. Dilo Rabe	38
1. 4. 2. 2. 14. Îlahî Lew Dikim Zarî	38
1. 4. 2. 2. 15. Ez Çi Bêjim	38
1. 4. 2. 2. 16. Ay Dilê Min Ay Dilo	39
1. 4. 2. 2. 17. Qewî Îro Ze'îfhal im	39
1. 4. 2. 2. 18. Çiya Anî Li Deştê Kir	39
1. 4. 2. 2. 19. Îlahî 'Ebdukel Atak	39

1. 4. 2. 2. 20. Ji ‘İşqê Sotime Welleh	39
1. 4. 2. 2. 21. Bizan Ku Min Yar Tu Yî	40
1. 4. 2. 2. 22. Ey Dil Hilo Terk Ke Sefa	41
1. 4. 2. 2. 23. Ordeka Ava Cizîrê	41
1. 4. 2. 2. 24. Fesla Bihara Cennetê	42
1. 4. 2. 2. 25. Xwedawenda Gunehkar im	42
1. 4. 2. 2. 26. Xwedawenda Tu Sebbûh î	42
1. 4. 2. 2. 27. Îro Ji Eşqa Sorgulê	42
1. 4. 2. 2. 28. Dilo Carek Xwo Hişyar Ke	42
1. 4. 2. 2. 29. Min Dî Di Xewnê Da Gulek	43
1. 4. 2. 2. 30. Ji Eşqa Te Ezî Dîn im	43
1. 4. 2. 2. 31. Hatim Ber Dergahê Rehmet	43
1. 4. 2. 2. 32. Ah Ji Dest Cama Wîsalê	43
1. 4. 2. 2. 33. Ellah Sehergaha Ezel	43
1. 4. 2. 2. 34. Îlahî Ger Gunehkarem	43
1. 4. 2. 2. 35. Sînem û Çerxa Felekê	44

BEŞA DUYEM

LI GORÎ FEQÎYÊ TEYRAN TESEWUF Û DI BERHEMÊN WÎ DE HÊMANÊN TESEWUFÎ

2. 1. MAHÎYETA TESEWUFÊ Û LI GORÎ FEQÎYÊ TEYRAN TESEWUF	45
2. 2. DI BERHEMÊN FEQÎYÊ TEYRAN DE HÊMANÊN TESEWUFÎ.....	56
2. 2. 1. Eşq	56
2. 2. 1. 1. Eşqa Mecazî û Eşqa Heqîqî	61

2. 2. 2. Aşiq.....	64
2. 2. 3. Yar	65
2. 2. 4. Muhebet.....	67
2. 2. 5. Arif, Sûfi, Derwêş û Merîfet.....	69
2. 2. 6. Şêx, Pîr û Murşîd.....	71
2. 2. 7. Hikmet	73
2. 2. 8. Hal û Meqam	74
2. 2. 9. Tewhîd û Wehdet	78
2. 2. 10. Nefs.....	80
2. 2. 11. Saqî.....	81
2. 2. 12. Dil û Qelb	82
2. 2. 13. Kemal	84
2. 2. 14. Fena	87
2. 2. 15. Beqa.....	88
2. 2. 16. Cemal.....	90
2. 2. 17. Zikir.....	91
2. 2. 18. Rûh	93
2. 2. 19. Ru'yet	95
2. 2. 20. Felek	96
2. 2. 21. Uzlet	97
2. 2. 22. Firqet.....	97
2. 2. 23. Dilber.....	99
2. 2. 24. Xewf.....	100
2. 2. 25. Heybet.....	101
2. 2. 26. Wisal û Wuslet	102

ENCAM.....	104
ÇAVKANÎ.....	106
ÎNDEKS.....	110
PÊVEK.....	114
JÎNENÎGARÎ	

ÖZET

YÜKSEK LİSANS TEZİ

FEQİYE TEYRAN'IN ŞİİRLERİNDE TASAVVUFİ UNSURLAR

Şeyhmus ORKİN

Tez Danışmanı: Doç. Dr. Nurullah ULUTAŞ

2015, 159 sayfa

Tasavvuf, kendisine özgü usul ve kaideleri bulunan bir yol ve baştan sona bir müreşid önderliğinde devam ettirilen bir yolculuktur. Bu seyirde, sufiyi ayakta tutan güç aşktır ve sufiler, bu aşk ile Hakk'ın hükümlerine teslim olurlar. Bu tezde, tasavvuftan etkilenen Feqiye Teyran'ın bilinen tüm eserleri tasavvuf ve onun kavramları açısından incelenmiştir. Feqiye Teyran'ın eserlerinde işlenen bütün tasavvufî kavramlar tek tek sınıflandırıldıktan sonra, Feqiye Teyran'ın anlamlandırıldığı şekilde ele alınmıştır. Bu tez, iki bölümden oluşmaktadır. Birinci bölümde, Feqiye Teyran'ın hayatı ve eserleri incelenmiştir. İkinci bölümde ise, Feqiye Teyran'ın eserlerindeki tasavvufî unsurlar ele alınmıştır. Bu unsurlar içinde en çok işlenenler aşk kavramı ve Feqiye Teyran'ın yaşadığı hallerdir.

Anahtar Kelimeler: Feqi, Feqiye Teyran, Tasavvuf, Feqiye Teyran'ın Şiirleri, Kürt Şiiri

KURTE
TEZA LÎSANS A BILIND
DI BERHEMÊN FEQÎYÊ TEYRAN DE HÊMANÊN
TESEWUFÎ

Şeyhmus ORKÎN

Şewirmend: Doç. Dr. Nurullah ULUTAŞ

2015, 159 rûpel

Tesewuf hem rêyeke ku xwedî usûl û qaîdeyan e û hem jî rêwîtiyeke ku ji serî heta binî bi serokatîya murşîdek tê berdewam kirin. Di vê seyrê de hêza ku sûfîyan li ser pîyan digire eşq e û sûfî bi eşqê ve teslîmê hukmê Xweda dibin. Di vê tezê de hemû berhemên Feqîyê Teyran ji aliyê mefhûmên tesewufî ve hatine vekolîn. Pêşî fikrên Feqî yên di derbarê mahîyeta tesewufê de hatine dayîn. Paşê jî mefhûmên tesewufî yên helbestên Feqîyê Teyran yek bi yek hatine sinifandin û li gorî terîfa Feqîyê Teyran hatine îzah kirin. Ev tez jî du beşan pêk tê. Di beşa ewil de jiyana Feqîyê Teyran û berhemên wî hatine vekolîn. Di beşa duyem de jî fikrên Feqîyê Teyran yên derbarê tesewufê de û mefhûmên tesewufî yên di nav helbestên wî de hatine vekolîn. Di nav mefhûmên tesewufî de ya ku Feqî herî zêde li ser sekinîye mefhûma eşqê ye. Digel vê Feqî herî zêde behsa hal û meqamên menewî kirîye.

Peyvên Sereke: Feqî, Feqîyê Teyran, Tesewuf, Di Derhemên Feqî de Tesewuf, Helbestên Kurdî, Helbestên Tesewufî

ABSTRACT

MASTER'S THESIS

THE MYSTICAL INGREDIENTS IN FEQÎYÊ TEYRAN'S POEMS

Şeyhmus ORKİN

Advisor: Assis. Prof. Nurullah ULUTAŞ

2015, Page: 159

Islamic sufism is a path having some specific method and norms, and a journey conducted with the master from beginning to end. In this process, the strength sustaining sufi is divine love and sufis trust in the judgments of Allah with this divine love. In this thesis, Feqiye Teyran's all known literary studies were analysed in terms of sufistic concepts. After all sufistic concepts processed in his studies were singly categorised, they were dealt with his meanings. The thesis consists of two parts. In the first part, The life of Feqiye Teyran and his literary studies were examined. In the second part, sufistic concepts in his studies were dealt with. The most handled notions in the sufistic concepts are divine love and are also situations in which he lives.

Key Words: Islamic Sufism, Feqiye Teyran, Kurdish Poems, Kurdish Sufism

PÊŞGOTIN

Dema ku mewzubehs edebîyata tesewufî ya kurdî be, bê guman Feqîyê Teyran di vê mijarê de yekî ji şairên herî navdar e. Berhemên wî yên ku di warê mefhûmên tesewufî de têr û tijî ne, bi salan li ser zimanê sûfîyan û di nav gel de hatine heta îro. Feqîyê Teyran bi xwe jî, di warê belavbûna çanda tesewufê de li welatê Kurdistanê roleke girîng wergirtîye. Ev şairê ku ji ehlê halê tê hesabandin bi honandina helbestên xwe yên derwêşane ve bingeha edebîyata tesewufî ya kurdî xurttir kirîye û di vî warî de xizmeteke heja danîye holê.

Me di vê xebatê de hewl da ku di helbestên Feqîyê Teyran de hal û mefhûmên tesewufî, yanê hêmanên tesewufî tespît bikin û bi nêrîna Feqîyê Teyran ve van hêmanên tespîtkirî di çarçoveya prensîpên bingehîn yên ilmê tesewufê de pêşkêş bikin. Bi rastî tesewuf mijareke pir berfireh û kûr e, digel vê berhemên Feqîyê Teyran her çi qas di warê ziman û uslûbê de hesan bin jî di warê meneyên tesewufî de gelek kûr û asê ne. Ji ber ku li ser berhemên Feqîyê Teyran tu şerh û xebateke berfireh nehatiye kirin xebata me jî di nav zehmetîyan de qedîya. Me bi hevîya ku kêmasîyeke biçûk bê qedandin dest bi vê xebatê kir û em hevîdar in ku ev xebat ji bo vekolînên li ser helbestên Feqîyê Teyran û edebîyata tesewufê ya kurdî bibe çavkanîyeke biçûk.

Di amadekirina her merhaleya vê xebatê de şewirmandê min birêz Doç Dr. Nurullah ULUTAŞ alîkarîyên xwe li min kêr nekir. Ji bo şewirmendî û alîkarîyên wî yên cur bi cur spasdar im. Di destpêka vê xebatê de mamosteyê min ê heja Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ bi tecrubeyên xwe, çavkanîyên bingehîn yên ilmê tesewufê pêşniyazê min kir û bi rexneyên xwe ve xebata min kamiltir kir. Ez spasîyên ji dil û can pêşkêşê cenabê wî dikim. Ji bo mamosteyê heja Canser KARDAŞ jî ku di nav kar û xebatên xwe yên zêde de dema xwe veqetand û xebata min xwend ez gelek minetdar im. Di warê tespîtkirina alîyên ruxsarî yên helbestên Feqîyê Teyran de min ji agahîyên birêz İhsan ŞEHİTOĞLU jî gelek îstifade kir û ez ji vê derê spasîyên xwe pêşkêşê wî dikim.

KURTEBÊJE

amd.:	amadekar
b.n. :	berhema navborî
C.:	cild
ç.:	çarîn
b.:	bend
h.:	hejmar
hwd.:	her weki din
b.n.ç.:	berhema ne çapbûyî
j.:	jimare
r.:	rûpel
wer.:	werger
Dr. :	Doktor
Prof:	Profesor
Doç. :	Doçent
Alk. :	Alîkar
bnr.:	binêr

DESTPÊK

Li ser ziman û berhemên Feqîyê Teyran ku yek ji şairên edebîyata tesewufê ya kurdî ye xebatên akademîk pir kêr in. Em dikarin bibêjin ku ji xeynî çend pêşkêşiyên sempozyuman û çend beşên biçûk yên ku di kitêbên di vê dawîyê de hatine çap kirin, tu xebateke ku bi rêk û pêk li ser aliyên wî yên tesewufî sekinîbe tune ye. Ji ber ku li ser şairekî mîna Feqîyê Teyran ku di edebîyata tesewufê ya kurdî de ev qas xwedîyê cihekî muhim e xebateke berfireh nehatîye kirin û aliyên wî yên tesewufî heta niha bi giştî veşartî mane, me xebateke wiha hewce dît. Di vê çarçoveyê de xebata me ji ber ku di beşa xwe de xwedîyê modelek nîne di bin şertên dijwar de qedîya û di mijara xwe de dibe ku wekî xebateke ewilîn bê hesibandin. Di xebata me de mefhûmên tesewufî, pêşî di çarçoveya klasîkên tesewufê de dê bîne terîf kirin û paşî jî li gorî fikr û terîfa Feqîyê Teyran dê bîne vekolîn. Li gorî qeneeta me ev xebat, hem ji bo ku aliyên veşartî yên Feqîyê Teyran dîyar dike û hem jî ji bo ku ji zimanê mutesewifekî kurd mefhûmên tesewufî vedikole dê di qada vekolînên li ser Feqîyê Teyran de valahîyeke muhim tijî bike.

Di derbarê jîyana Feqîyê Teyran de hem di çavkanîyan de hem jî di destê vekolîneran de agahîyên pir kêr hene. Her çî qas dema ku ew lê dijîya bê zanîn jî di derbarê jîyana wî de agahîyên di destê me de ne, bi tenê çend agahîyên kêr in ku ew jî ji helbestên wî hatine wergirtin. Li gorî wan agahîyên ku di helbestên wî de hene jî bi tenê salên ku lê jîyaye, çend mexlesên ku bikaranîye, çend cihên ku bi armanca xwendinê yan jî geştê çûye tê zanîn. Bi taybetî jî navê malbata wî yan jî navê dê û bavê wî û agahîyeke di derbarê rewşa wî ya malbatî de bi delîlan ve li holê nîne. Di vekolînên dawî de cihê gora wî li Şandisa Hîzana Bedlîsê hate tespît kirin û nivîsên li ser kêla gora wî hatine kifşe kirin. Ji ber kêmasîya agahîyan, di xebata me de jî beşa jîyana Feqîyê Teyran mixabin kêr ma.

Çend agahîyên ji helbestên wî yên ku di derbarê şexsîyeta wî ya tesewufî de ne bi rastî hinek jî di derbarê jîyana wî de texmînan didin. Feqîyê Teyran ku her çî qas bi remz û helbestên ku di warê meneyê de kûr in ve peyamên veşartî dabe xwendevanên ehlê halî yên dewra xwe û dewrên piştê xwe jî, agahîyeke ku di nav gel de murşîdbûna wî îspat bike di helbestên wî de tune ye. Feqîyê Teyran bi helbestên xwe ve ji bo belavbûna çanda tesewufê xizmeteke mezin pêk anîye lê belê ji ber ku di destê me de

tu delîlek tune ye, em nikarin bibêjin ku wî şêxtî kirîye û xwedîyê murîdan bûye. Ji ser agahîyên di dest de, em dizanin ku wî, ji xeyrê helbestên xwe, wezîfeya îrşadê bi wesfa murşîdîyê di nav gel de pêk neanîye, eger ku ji xeyrê helbestên xwe şîretê kiribe jî Feqî murşîdî nekirîye û murîdên wî jî tune ne. Feqîyê Teyran bi berhemên xwe ve hem behsa halê xwe yê tesewufî kirîye hem hin mefhûmên tesewufî ji bo sûfîyan terîf kirîye û hem jî bi remzên kûr ve rêya aşîqan ronî kirîye. Ji berhemên wî jî, ji vekolînan jî teqez nayê derxistin ku mensûbê kîjan terîqetê bûye. Lê ji bo ku terîqeta Nexşibendîyê li Kurdistanê zêdetir xwedî tesîr bûye (Tavakkoli, 2010: 215), tê texmîn kirin ku Feqîyê Teyran jî mensûbê Nexşibendîyan bûye. Me di xebata xwe de ji helbestên wî nekarî terîqeta ku mensûbê wê ye tespît bikin. Lewra me di vê mijarê de tu nîşaneyek peyda nekir. Bi rastî ji bo ku Feqîyê Teyran ji gelek alîyan ve di binê tesîra Ferîdudîn Etar de maye, meriv dikare ji ser terîqet û şêxên Ferîdudîn Etar ve terîqeta Feqî jî texmîn bike. Lê belê ji ber ku terîqeta Etar jî nayê zanîn (Subhanî, 2007: 267), di vê mijarê de encamek dernakeve holê.

Berhemên Feqîyê Teyran bi kurdîyeke zelal û sade hatine nivîsîn û ji bo ku di warê naverokê de xwedîyê çîrokên herikbar û helbestên balkêş in, di nav gelê kurd de meşhûr in û hê jî gelek tene xwendin. Di berhemên wî de nîrxên dînî û tesewufî bi hostatî hatine dayîn. Di gelek helbestên xwe de Feqîyê Teyran xwastîye ku sûfî, xwe ji xerabîyên nefsê xelas bikin û bi ‘emelên salih ve xwe nêzîkê Xweda bikin. Di helbestên xwe yê ku tê de behsa çîrokên tesewufî dike, di çarçoveya giştî de ji alîyê hemû astên xwendevanan ve bi hêsanî tene fêhm kirin. Lê belê ji ber ku tesewuf ne karekî hêsan e û jê re temen û şexsîyeta kamil divê, gelek beşên helbestên Feqî jî di warê meneyê de pir kûr in û ji alîyê her kesî ve fêmkirina wan ne mumkun e.

Xebata me ya ku di makezanista Ziman û Çanda Kurdî de wekî teza lîsansa bilind hatîye amade kirin digel edebîyatê, bi ilmên îslamî re jî gelek têkildar e. Pêşî berhemên edebîyata klasîk a kurdî, paşî jî berhemên ku bi ilmê tesewufê, dîroka tesewufê, felsefeya tesewufê, dîroka îslamê, exlaqê îslamê û psîkolojîya dînî re eleqedar in materyalên bîngêhîn ên vê xebatê ne. Digel van, ayet û hedîsên bi mijarê re têkildar jî di nav çavkanîyên xebata me de cih digirin. Ji bo ku di xebata me de hêmanên tesewufî hatine vekolîn, bi awayekî tebîî ferhengên mefhûmên tesewufî jî di xebata me de bûne çavkanîyên ku herî zêde hatine bikaranîn. Çarçoveya ilmê tesewufê gelek berfireh e û mefhûmên tesewufî bi tenê bi terîfên ferhengan ve ne

mumkun e bêne fêr kirin, digel ferhengên mefhûmên tesewufî, kitêbên navdar yên ilmê tesewufê jî wekî çavkanî hatine bikaranîn. Di nav van çavkanîyan de yên ku herî zêde me jê îstifade kirin Rîsaleya Quşeyrî, Keşfûl Mehcûba Hucvîrî, Te'errûfa Kelabazî û Lûmaya Serac bûn.

Ji ser destxetên berhemên Feqîyê Teyran ve em dizanin ku wî gelek berhem nivîsîne û bi tenê beşeke van berheman gihîştîye îro. Divê ku em di serî de destnîşan bikin ku berhemên Feqîyê Teyran, heta niha ji edîsyon krîtîkeke akademîk derbaz nebûne. Me di beşa esil ya xebata xwe de bi zêdehî sê kitêbên ku li ser berhemên Feqîyê Teyran hatine amade kirin bikar anîn. Di van her sê berheman de jî digel agahîyên heja hin agahîyên kêr û xelet jî hebûn. Xusûsên di mijara ruxsarîyê de carinan agahîyên kêr carinan jî agahîyên xelet hatibûn dayîn.

Me di vê xebatê de herî zêde ji kitêba M. Xalid Sadinî ya bi navê “Jîyan, Berhem û Helbestên Feqîyê Teyran” îstifade kir. Di vê kitêbê de bi tevahî 35 helbestên Feqîyê Teyran hene. Helbestên, “Îlahî Lew Dikim Zarî” û “Sînem û Çerxa Felekê” bi tenê di vê kitêbê de hene û di kitêbên din ên ku li ser Feqîyê Teyran hatine amade kirin de tune ne. Bi taybetî jî helbesta “Sînem û Çerxa Felekê” li gorî tu qalibeke erûzê nehatiye honandin û dixuyê ku helbesteke kêr e. Di derbarê jîyana Feqîyê Teyran de li gorî yên din herî zêde agahî di kitêba Sadinî de cih girtine. Bi taybetî di derbarê dema ku Feqî lê jîyaye de agahîyên zêdetir hatine dayîn. Lê belê di derbarê tesnîfa ruxsarîyê de kêmasîyên vê kitêbê hene ku li gorî cureyên nezmê tu helbesteke Feqî, nehatine tesnîf kirin. Di derbarê mijara qafiyeyê de hinek agahî hatine dayîn lê belê di mijara qalibên erûzê de agahî nehatine dayîn. Di kitêbê de hatîye îdia kirin ku Feqî, kêşa heceyê bikaranîye, lê belê Feqîyê Teyran şairê erûzê ye û ji ber vê jî di mijara weznê de agahîyeke xelet hatîye dayîn.

Di vê xebatê de piştê kitêba Sadinî me herî zêde ji “Dîwana Feqîyê Teyran” a ku ji aliyê Seîd Dêreşî ve hatîye amade kirin îstifade kir. Di kitêba Dêreşî de bi tevahî 25 helbestên Feqîyê Teyran hatine çap kirin. Dema ku bi kitêbên din re bê muqayese kirin 10 helbestên Feqîyê Teyran yên ku di kitêbên din de hatine çap kirin di vê kitêbê de tune ne. Lê belê di kitêba Dêreşî de helbesteke bi navê “Ebdî Elisyan” heye ku di kitêbên din de tune ye. Di mijara bijartina helbestên Feqîyê Teyran de Dêreşî, ji M. Xalid Sadinî û Kadri Yıldırım xesastir e. Lewra digel helbestên ku di nav dîwanê de

nedane çap kirin, ji bo hin helbestên ku di dîwanê de hatine çap kirin ji îfade kirîye ku ihtimal heye ev berhem ne yên Feqîyê Teyran bin.

Me di xebata xwe de agahîyên di derbarê destxetên Feqîyê Teyran de bi giştî ji vê kitêbê wergirt. Dêreşî di mijara destxetên Feqîyê Teyran de li gorî her du kitêbên din agahîyên berfirehtir dane. Di derbarê çîrokên ku li ser Feqîyê Teyran hatine gotin de Dêreşî, di kitêba xwe de beşek amade kirîye û ji kitêbên din bi rêk û pêktir agahî dane. Lê belê di vê kitêbê de agahîyên di derbarê jîyana Feqîyê Teyran de pir kêm in. Di derbarê alîyên ruxsarîyê yên helbestên Feqîyê Teyran de agahî nehatine dayîn û di vî warî de jî tesfînek nehatîye kirin. Di derbarê qafîye û wezna helbestan de jî agahî nehatine dayîn.

Kitêba sêyemîn ku me di xebata xwe de jê îstifade kir a Prof Dr. Kadri Yıldırım e. Navê kitêbê “Faki-yi Teyran Divan” e. Ev berhem wekî du cild ji alîyê Wezaretê Çand û Turîzmê ve hatîye çap kirin. Di vê kitêbê de digel helbestên Feqîyê Teyran tercumeya wan a bi tirkî jî hatîye dayîn. Di cilda duyem de jî destxetên helbestan hatine çap kirin. Di kitêba ku ji alîyê Yıldırım ve hatîye amade kirin de bi tevahî 33 helbestên Feqîyê Teyran hene.

Xebata Yıldırım û Sadînî ji gelek alîyan ve dişîbin hev. Ji xeynê helbestên, “Îlahî Lew Dikim Zarf” û “Sînem û Çerxa Feleke” ku bi tenê di kitêba Sadînî de hene hemû helbestên her du kitêban heman helbest in. Di vê xebatê de cureyên nezmê yên helbestên Feqîyê Teyran hatine tespît kirin û li gorî van cureyan hatine tesnîf kirin. Di mijara qafîyeyê de jî agahî hatine dayîn lê belê di derbarê weznê de agahî nehatine dayîn. Di nav dîwanê de muqayeseya Feqîyê Teyran û Yûnis Emre hatîye kirin ku ev muqayese her çî qas muhim jî be di çarçoveya giştî ya dîwanê de ne hewce dixuyê. Di qismeke vê berhemê de bi awayekî kurt li ser mijara tesewufê jî hin agahî hatine dayîn. Ev jî wekî tespîtkirina cureyên nezmê yên berhemên Feqî, xusûsîyeteke muhim e ku xebata Yıldırım ji gelek xebatên din vediqetîne. Lê belê di vê qismê de jî li ser alîyên tesewufî yên Feqîyê Teyran agahîyên bes nehatine dayîn, bi tenê bi çend mînakên ve kurteya meseleyê hatîye pêşkêş kirin.

Di nav berhemên Feqîyê Teyran de, qesîde, qesîdeyên musemmet, muselles, murebbeyên muzdewîc, murebbeyên mutekerîr, xezel û xezelên musemmet cih digirin. Di kitêba ku me li ser vekolîn pêk anî de 35 berhemên Feqî, hene ku ji 1288

bend û beytan pêk tîn. Di helbestên Feqîyê Teyran de bi giştî qalibên erûzê yên mîna “Çar Mûstefîlûn”, “Çar Mefâ’îlûn” û “Du Fa’îlatûn” hatine bikaranîn. Hemû helbestên wî yên ku ji 80yî zêdetir destnivîsan pêk tîn perçe perçe ne û hin perçe li pirtûkxaneyên mezin in, hin perçe jî bi destê mela û hezkerên Feqî ve gihîştine îro.

Em bi vê xebatê ve armanc dikin ku peyamên şairê edebîyata tesewufê ya kurdî Feqîyê Teyran îzah bikin û di navbera peyamên Feqîyê Teyran û mirovahîya nûjen de pîrek ava bikin. Ji ber ku zimanê helbestên tesewufî mîna zimanê teyran e û xwedîyê remz û îşaretên dijwar e, em nikarin îdia bikin ku di vê xebatê de alîyên tesewufî yên Feqîyê Teyran bi tevahî û bi hemû kûrahîya xwe ve hatine îzah kirin. Lê belê ji ser halên sûfîyan yên ku di berhemên tesewufî de hatine terîf kirin ve me xîret kir ku hal û mecazên sûfîyan fêhm bikin û ji ser halên wan ve halê Feqî kifşe û şîrove bikin. Digel her tiştî eger ku me beşeke biçûk ji fikrên Feqîyê Teyran karîbe pêşkêşê xwendevan û vekolîneran kiribe ev dilşadî ji bo me bes e.

BEŞA YEKEM

JÎYANA FEQÎYÊ TEYRAN Û BERHEMÊN WÎ

1. 1. JÎYANA FEQÎYÊ TEYRAN

Di tu çavkanîyek de û di helbestên Feqîyê Teyran bi xwe de jî di derbarê navê dê û bavê wî de agahîyek tune ye. Di înternetê de li gelek malperan behsa jîyana Feqî tê kirin û tê îdia kirin ku Feqî kurê mîrekî bûye û di dewra Osmanîyan de jîyaye. Belê ji tarîxên ku ji berhemên wî tene derxistin ve tê fêm kirin ku ew di dewra Osmanîyan de di dema mîrektîyên kurdan de jîyaye, lê belê di derbarê malbata wî de hê agahîyê li holê tune ye. Agahîyên ku di înternetê de hene dibê ku ji ber telihevîyêke navbera Feqîyê Teyran û Zembîlfiroşî de pêk hatibe. Lewra em dizanin ku Zembîlfiroş lawê mîr e lê belê ne dîyar e ku navê dê û bavê Feqî çi ye yan jî mensûbê malbateke çawa ye.

Ji bo kesên ku bi edebîyata kurdî re têkildar in meseleyêke dîyar e ku Feqîyê Teyran di edebîyata tesewufê ya kurdî de û di nav gel de yek ji şairên herî navdar û naskirî ye. Navê wî “Muhemmed” e, di nav xelqê de bi navê Feqîyê Teyran meşhûr bûye. Navê bavê wî Şêx ‘Ebdullahê Miksî ye û ji gundê Werezûzê ye. Mexlesa wî ya “Mîm û Hê” kurtkirina Muhemedê Hekarî ye ji bo ku Miks û gundê Werezûzê nêzîkê Hekarîyê ne digel nisbetkirinên din (Sadinî, 2014a: 31; Sağniç, 2002: 369) nisbeta Feqîyê Teyran bi Hekarîyê ve tê kirin (Zivingî, 2014: 49). Li gorî hin vekolîneran jî mexlesa “Mîm û Hê” bi tenê kurtkirina navê Muhemed e. Vekolînerên li ser edebîyata klasîk a kurdî dixebitin di mijara gihîştina bîyografîyên şair û navdaran de gelek car asê dibin. Ev tengasî ne bi tenê ji bo şairên ku zêde nayên nas kirin, belkî ji bo şairên herî navdar jî mewzubehs e. Her wiha di derbarê tarîxa jidayîkbûna Feqî de vekolîner bi tevahî negihîştine heman encamê. Lê belê di vekolînên dawî de ji helbestên wî tarîxa jidayîkbûna wî hatîye kifşe kirin ku ew tarîx jî 1561ê Mîladî ye.

Birîndarê îşqê me

Dûr im ji siha bihan

Dizanim meddahê kê me

Di hezar û yek û sihan

Senaxanê Melê me

Li hemû erd û cihan¹ (Feqîyê Teyran, Feqe û Melê, b. 49 r. 201)

Ji hezar û yek û sihan hezar û sih û yek (1031) tê qesd kirin ku ev tarîx di teqwîma mîladî de teqabulê 1621an dike. Di vê helbestê de bi hêsanî tê fêhm kirin ku Feqî di wextê Melayê Cizîrî de sax bûye û van herdu şairên navdar di vê tarîxê de hev dîtine (Adak, 2013). Di derbarê emrê Feqî de M. Xalid Sadinî (2014: 41) jî îdiayeke balkêş dike. Li gor wî ji helbesta Ehmedê Xanî tê fêhm kirin ku ihtimal heye Feqî ‘emrekî dirêj kiribe û heta dewra Xanî jiyabe. Lewra kesên mirî nikarin kêfê bikin divê ku kesê kêfê bike sax be.

Bînave ruha Melê Cezîrî

Pê hey bikira ‘Elîyê Herîrî

Keyfek we bida Feqîhê Teyran

Hetta bi ebed bimayî heyran (Xanî, 2013: 42)

Vekolînerên ku li ser jiyana û berhemên Feqî ked dane di meseleya tarîxa jidayîkbûna wî de bi giştî dibin du beş. Li gor hinekan Feqî di sedsala 14an a mîladî de hatiye dinê. Li gorî hin vekolîneran jî Feqî di nîvê dawî ya sedsala 16an de hatiye dinê û her wiha di dawîya sedsala 16an û di nîvê ewil a sedsala 17an de jiyaye. Daneyên ji helbestên Feqî, nêrîya duyemîn piştrast dike. Di edebîyata klasîk de tê zanîn ku şair, hin tarîxan bi rêya nîşaneyan ve îfade dikin û dema ku meriv li vê helbesta Feqî binêre tarîxa jidayîkbûna wî dikare texmîn bike.

Mîm û Hê heftê felek çûn

Ji hîcretê dewran gelek çûn

Sal hizar û çil û yek çûn

Ev xezel anî dîyare (Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, b. 80, r. 236)

¹Di vê tezê de hemû îqtibasên helbestên Feqîyê Teyran ji berhema M. X. Sadinî, Feqîyê Teyran Jiyan Berhem û Helbestên Wî, Nûbihar, Stenbol, 2014, hatine kirin. Ji bo îqtibasên din ên helbestên Feqîyê Teyran em ê bi tenê navê helbestê, nimareya bendê û nimareya rûpelê bidin.

Di helbestê de dewran wekî “sedsal” felek jî wekî “yeksal” tîne mene kirin û li ser rûdana hîcretê ku hesab bê kirin Feqîyê Teyran di 1561ê mîladî de hatiye dinê (Sadîni, 2014: 44).

Ji daneyên ku ji helbestên wî hatine girtin ve tê texmîn kirin ku Feqî emrekî dirêj kirîye. Piştê ku gelek berhemên bi bereket nivîsîne di sala 1632yan de wefat kirîye. Di derbarê cihê gora Feqî de jî hin munaqêşe berdewam in. Li ser gorên şairên navdar yê ku gel ji wan hez kirine çîrok pir in. Mesela cihê gora şairê navdar yê edebîyata tirkî Yûnis Emre teqez nayê zanîn û çîrokên derbarê gora wî de zêde ne. Bi heman awayî ji bo ku gel ji Feqî pir hez kirîye di derbarê gora Feqî de jî çîrokên cuda hatine gotin û gora wî hem li Werezûza Miksê hem jî li Şandisa Bedlîsê heye. Lê belê di vekolînên dawî de hatîye kifşe kirin ku gora Feqîyê Teyran îhtimaleke mezin li Şandisa Hîzanê (Bedlîsê) ye. Di derbarê vê agahîyê de hem ji destnivîsan hin delîl hene û hem jî li ser kêla gora Feqî ya ku li Şandisê ye wiha hatîye nivîsîn: “Ev gora dilşad, rehmetî, bexşandî û mihtacê rehmeta Xwedê Mihemedê navdarê bi Feqehê Teyran e ku di sala 1041ê de koçî dawîyê kiriye.” (Adak, 2014: 116)

1. 2.NAV Ê MEXLESÊN WÎ

Di edebîyata kurdî de gelek şair hene ku ji xeynî navê xwe navên mustear bikaranîne yan jî bi navên cuda hatine nas kirin. Di nav van de hin şair bi navê gundê xwe, hin jî bi navê bajarê xwe tîne nas kirin. Feqîyê Teyran jî yek ji şairên kurd yê pîrnav e. Wî di helbestên xwe yê cuda de, ji bo xwe mexlesên cuda bikaranîne. Navê esil ê Feqîyê Teyran, “Muhemmed” e û di hin helbestên xwe de navê xwe yê esil bikaranîye.

Gul im di destê xaran

Bi ismê Muhemmed nav im

Bilbil im di gulzaran

Ji îşqê lew zerbav im (Feqîyê Teyran, Feqe û Melê, b. 47, r. 200)

Feqî di helbestên xwe de ji xeynî navê xwe bi giştî sê mexles bikaranîye Mîm-Hê, Miksî, Feqî û Feqîyê Teyran.

Mîm û Hê heftê felek çûn

Ji hîcretê dewran gelek çûn

Sal hizar û çil û yek çûn

Ev xezel anî dîyare (Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, b. 80, r. 236)

Gava Fehe xwe têk dida

Pêla pêş xwe l'stû dida

Feqe girt û l'erdê dida

Go: Her bimre l'xisaretê (Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, b. 51, r. 126)

Miksî dibê avê we bû

Pêxemberan aqil hebû

Qet hewceyî pirsan nebû

Wan dest gihabû sohbetê (Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, b. 29, r. 120)

Mexlesa “Miksî” carinan wekî “Muksî” jî hatîye nivîsîn ku ev ji ber cudaxwendina herfên erebî pêk tê û di navbera wan de di warê meneyê de tu ferqek tune ne.

Avek mehîn im kemter im

Min cerg û dil bûne birîn

Sewda û dîn û ebter im

Pabendê vê nefsa le'in

Muksî ye jar û bedtir im

Ferhemnî xeyre rahimîn (Feqîyê Teyran, Ellah Çi Zatek Ehsen e, b. 20, r. 110)

Nesaxê eşan ez im

Bikul û derdan ez im

Mecrûh ji qehran ez im

Tazî û ‘uryan ez im

Ê dûr ji şehran ez im

Feqîyê Teyran ez im (Feqîyê Teyran, Bizan Ku Min Yar Tu Yî, b. 18, r. 447)

Feqî di benda dawîyê ya helbesta “Bi Çar Kerîman” de gotina “Şairê Nesîhetê” bikartîne ku li gorî îfadeya Ebdureqîb Yûsif ev bend kêr e lewra hinek ji destnivîsê wînda bûye. Ji ber kêmasîyê ne dîyar e ku ev gotin di nava rêza helbestê de bi tenê darazek dide yan jî mexleseke nîşan dide.

Ew “Mîm û He” qelb û mitalan

Her bi wan fikr û xiyalan

Rast dikit pend û misalan

Şairê nesîhetê ... (Feqîyê Teyran, Bi Çar Kerîman, b. 7, r. 138)

Di beyta dawîya xezela “Ah Ji Destê Cama Wîsalê” de jî mexlesa “Hemzo” bikartîne ku di derbarê vê mexlesê de me tu agahîyek peyda nekir.

‘İlmê zakir nik me nîne

Kes bi aqil arif nebûne

Hûn nebên hemzo ku dîn e

Dîne ‘işqê mexfî ye (Feqîyê Teyran, b. 10, r. 489)

Mexlesa “Feqî” ji yên din muhîmtir e lewra ew zêdetir bi vê mexlesê tê nas kirin. Têkilîya peyva “Feqî” bi her sê peyvên erebî yên “fe-qe-he”, “fe-qî-he” û “fe-qû-he”yê re heye. Di ferhengan de peyva “fe-qe-he”yê lêker e û vê meneyê dide; di ilm û îrfanê de ji yên din borîn, têk birina yên din. “Fe-qî-he”, tê meneya baş fêr kirin yan jî baş têgihîştina meseleyan û “fe-qû-he” jî tê meneya faqihbûyîne (Sarı, 1982: 1173; Karaman, 2013: 1). Lê belê li medreseyan Kurdistanê peyva “feqî” di meneya xwendekarî yan jî şagirtîyê de tê bikaranîn. Feqîyê Teyran ji bo ku di medreseyan de xwendîye ew şairekî xwedî ilm bûye. Ji helbestên wî bi hêsaniyê tê fêr kirin ku ji mijarên ilmî û tesewufî xebardar e. Yanê ew ne bi tenê şair e, ew feqîyê ilm û rêzanê ehlê dil e. Ji bo ku wî li medreseyan feqîfî kirîye hem di nav gel de bi feqîfîyê hatiye

nas kirin hem jî navê “Feqî” wekî mexles ji bo xwe bikaranîye. Li gor hin vekolîneran wî, ji bo nefsbîçûkîyê mexlesa “Feqî” bikaranîye (Sadînî, 2014: 22). Dema ku em li peyva “Teyran” dinêrin em dibînin ku ev peyv, qet bi tenê nehatîye bikaranîn û her tim bi mexlesa “Feqî” ve hatîye bikaranîn. Her wiha em dikarin bibêjin ku ev peyv perçeyeke mexlesa “Feqî” ye, mexleseke serbixwe nîne. Di derbarê mexlesa “Feqîyê Teyran” de li gor Ebdurehman Adak (2013: 212), ji bo ku Feqî, ji teyran pir hez kiriye jê re gotine Feqîyê Teyran. Belê mijareke dîyar e ku Feqîyê Teyran yekem car çîrokên kurdî bi awayekî menzûm nivîsîye û di van çîrokan de bi teyran re axivîye. Lê dema ku meriv berhema nivîskar û mutesewifê hêja Ferîdudîn Etar, Mentiqût Teyrê bixwîne li wê derê eşkere ye ku Etar ruhê mirovan dişibîne teyran û bi teyrên cur bi cur ve ruh û nefsa me ji bo me îzah dike. Ji xeynî Etar gelek mutesewifên din jî ruhê dişibînin teyran. Di vî warî de zimanê Teyran jî divê ku di qonaxeke cuda de bê nirxandin. Di derbarê zimanê teyran de ji sûreta Neml, ayeta 16. meseleyê hinek zelal dike. “Suleyman got: Gelî mirovan! Zimanê teyran bi me hatîye fêr kirin û ji her tiştî (nesîbê) me hatîye dayîn. Bêguman ev, her ew kerema eşkera ye (ku Xwedê em pê di ser xelkê re girtine).” Ji ayeta Qur’anê tê fêm kirin ku zimanê teyran zimanekî taybet e, bi nesîbkirina Xweda ve ancax meriv dikare wî zimanî fêr be û ev ziman wekî lutf û kerema Xweda tê nirxandin, ku xelq jî pê nizane. Di vê mijarê de beşek ji helbesta Yûnis Emre nîşanê me dide ku navê Feqîyê Teyran ne ji ber hezkirina Teyr û çûkan e. Ev nav ji ber zimanê wî hatîye gotin ku her çi qas zimanê Feqî kurdî be jî ji bo fêmkirina wî bi tenê zanîna zimanê kurdî bes nîne. Zimanê wî zimanê ehlê hal ye û bi tenê ehlê hal ji zimanê hev (zimanê teyran) fêm dikin (Taşpınar, 2002: 78; Schimmel, 2012: 319).

Ben bir acep ile vardım

Benim dilim kuş dilidir

Kimse halim bilmez benim

Benim ilim dost ilidir

Ben söylerim ben dinlerim

Ben bülbülüm dost gülümdür

Kimse dilim bilmez benim

Biter gülüm solmaz benim (Kılıç, 2012: 119)

(Ez gihîştîm warek ecêb. Zimanê min, ê teyran e. Kes bi halê min nizane. Warê min warê dostan e. Ez dibêjim ez dibihîzim. Ez bilbil im dost ji bo min gul e. Kes bi zimanê min nizane. Geş dibe gula min naçilmise.)²

Di derbarê mexlesên Feqî de li gorî me xaleke pir muhim heye ku heta niha hatîye piştguh kirin. Di vekolînên ku heta niha li ser berhemên Feqî hatine kirin de carinan ji bo Feqî mexlesa “Teyran” hatîye bikaranîn. Li gorî me ev bikaranîn ji ber du sedeman xelet e û divê ku were sererastkirin. Sedema ewil ev e ku Feqî bi xwe mexlesa “Feqî”, bi şiklê “Feqe”, di helbesta “Ey Av û Av” di benda 51an de bikaranîye. Lê belê peyva “Teyran” wekî mexles bi tenê bikarneanîye. Wî, yan gotîye “Feqîyê Teyran” yan jî gotîye “Feqîyê Têra” her wiha ji ber ku Feqî, mexlesa “Teyran” bi tenê bikarneanîye, yanê wî, xwe bi vî awayî bi nav nekirîye, divê ku vekolîner jî peyva “Teyran” wekî mexleseke serbixwe bikarneynin. Lê belê eger ku îtirazeke bi vî rengî derkeve holê ku hin kes bibêjin, em mexlesa “Teyran” wekî kurtkirina mexlesa “Feqîyê Teyran” bikartînin. Li gorî me ev dîsa bikaranîneke rast nîne, lewra “Feqîyê Teyran” revaka navî ye û “Feqî” raveber e, “Teyran” jî raveker e. Ji bo ku di ravekan de ‘esl, raveber e yanê “Feqî” ye, dema ku ravek bêne kurt kirin, avêtina raveberê (Feqî) ne rast e, reveker (Teyran) ji bo ku di ravekan de hêmana eslî nîne avêtina wê çêtir û rasttir e. Ev di gelek zimanan de bi vî awayî ye ku xusûsen di zimanê erebî de jî raveber yanê mûdaf, ji eslê ravekê ye û di hevokê de dikare bibe hêmaneke bingehîn lê belê raveker yanê mudafûn îleyh ji eslê ravekê nayê hesibandin û teqez nikare bibe hêmaneke hevokê.

Ji xeynî vê delîleke din heye ku bi rastî jî di warê bikaranînê de mexlesa “Feqî” ji mexlesên wî yên din zêdetir derdixe pêş. Dema ku meriv bala xwe dide berhemên Feqî, meriv pê dihesê ku ew li gelek cihan mîsyona “Feqîyê” werdigire ser milê xwe û ji ser vê mîsyonê ve ders û şîretan dide xwendevanan. Mesela Feqî di helbesta “Ey Av û Av”ê de ji “avê” pirsan dipirse û bi vî awayî hikmetê fêr dibe û dide fêr kirin.

Ji işqa kê her tîy û tîy

Heta kengê her bîy û bîy

² Wergera helbestan bi serê xwe karekî taybet û dijwar e. Heta ji destê me hat, me meneya helbestê parast û bi vî awayî helbestê wergerê kurmançî kir.

Bo min bêj heyranê kêy

Da ez bizanim qissetê (Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, b. 3, r. 112)

Di benda jorê de mîsyona feqîtiyê ya Feqîyê Teyran bi awayekî eşkere xuya dibe. Ew ji bo fêrbûna ilmî amûra herî bingeîn bikartîne û ji avê dipirse, dibêje “ji bo min bibêje” da ku bizanim meseleyê. Dîsa di helbesta “Feqe û Melê” de jî Feqîyê Teyran wezîfeya feqîtiyê werdigire û ji seydayê xwe (Melayê Cizîrî) dipirse. Her wiha mijarên tesewufî bi Mela dide terîf kirin.

Feqe:

Selama min heqîrê

Sedefek di vê têkin

Îroke li Cizîrê

Heq e ku li Melê kin

Hilak in j’derba tîrê

Derman divê ku lê kin

Mela:

Selamên milyaketan

Bê hed û bê hisêb in

Şubhetê avên şetan

Ji Mela l’”Mîm û Hê” bin

Hilak in ji zehmetan

Derman ji “Lam û Bê” bin (Feqîyê Teyran, Feqe û Melê, b. 1, 2, r. 163)

Dîsa Feqî di helbesta “Feqe û Bilbil” de ji bilbilî dipirse û bi zimanê teyran ve hikmetê bi xwendevanan dide nasîn.

Feqî j’bilbil ra gohtî

Tu j’vê sirê çî zanî

Ewa tu j'pêş ve sohtî

Fida bike tu canî

Ew xezala te pohtî

Tewhîd e bê me'anî (Feqîyê Teyran, Feqe û Bilbil, b. 7, r. 150)

Ji bo van sedeman mexlesa "Feqî" ji mexlesên din zêdetir li wî tê.

1. 3. XWENDINA FEQÎYÊ TEYRAN

Feqî, pêşî li Miksê dest bi xwendina ilmî kirîye, paşî jî çûye Cizîr, Hîzan, Finik û Hêşetê. Tê gotin ku zêdetir li medreseya Cizîra Botan û Finîkê xwendîye (Sağniç, 2002: 371). Miks cih û warê Feqîyê Teyran e ku jîyana xwe bi giştî li vê derê derbaz kirîye. Îro bi navê Bahçesarayê ve girêdayê bajarê Wanê ye. Hêşet gundekî navçeya Perwarîyê ye ku girêdayê bajarê Sêrtê ye. Feqîyê Teyran xwendina xwe demek li Hêşeta ku bi medreseyên xwe navdar e domandîye. Finik jî gundekî Şirnexê ye ku li bakurê Cizîrê, li rojhilatê Çemê Dîcleyê dimîne. Ev gund bi şkeftên xwe navdar e û tê gotin ku Feqî li vî gundî medrese û tekyayek daye ava kirin (Yıldırım, 2014: 17) û demek jî li vê derê xwendina xwe domandîye.

Li gorî qenaeta giştî Feqî, xwendekarê Cizîrî ye û demeke dirêj jî li Cizîrê xwendîye. Dema ku meriv li naveroka helbesta "Feqe û Melê" dinêre eşkere dibe ku bi rastî jî di navbera Feqîyê Teyran û Melayê Cizîrî de têkilîya feqîtî û seydatîyê hebûye. Feqî bi pirsên xwe ve kifşe dike ku ew feqîyê Mela ye û Mela jî bi bersivên xwe ve seydatîya xwe nîşan dide.

Feqe:

Selama min heqîrê

Sedefek di vê têkin

Îroke li Cizîrê

Heq e ku li Melê kin

Hilak in j' derba tîrê

Derman divê ku lê kin

Mela:

Selamên milyaketan

Bê hed û bê hisêb in

Şubhetê avên şetan

Ji Mela l'”Mîm û Hê” bin

Hilak in ji zehmetan

Derman ji “Lam û Bê” bin (Feqîyê Teyran, Feqe û Melê, b. 1, 2, r. 163)

Tê dîtîn ku Feqî, ji ber derba tîrê gazindên xwe tîne ziman û pîrsa dermanê derba tîrê dike. Mela jî behsa heman derdî dike û wekî derman “Lam û Bê” ku wekî lêvê tê şîrove kirin (Doskî, 2012: 57) nîşan dide.

Digel van cihên ku hatin diyar kirin dibe ku Feqî li gelek deverên din jî xwendibe. Lewra Feqî di nav gel de bi navê “Feqîyê Gerok” jî tê nas kirin. Ji vê navlêkirinê tê fêhm kirin ku Feqî jî bo feqîtî û silûka rêya menewî çûye gelek cihan. Navê Feqîyê Gerok îhtimaleke mezin bi meşreba Feqî re jî tîkildar e. Lewra tê zanîn ku şairên mutesewif yan jî kesên ehlê tesewufê ji bo dîtina hikmetên Xweda pir digerin û li gelek war û cihan seyahetê dikin. Ji gotin û helbestên Feqî ev rêwîtiya menewî bi hêsanî tê fêhm kirin.

Feqî, di van medreseyan Kurdistanê de ilmên melatîyê hîn bûye. Li gor hin gotinan Feqî jî ber ku ilmê xwe neqedandîye û her di feqîtiyê de maye jê re gotine “Feqî”. Bi rastî di destê me de agahîyeke teqez tune ku gelo Feqî jî medreseyeke Kurdistanê îcazet girtîye yan na lê dema ku meriv li berhemên wî dinêre şarezayîya wî ya li ser ilmên dînî bi awayekî eşkere xuya dibe. Ji bo ku ew şairekî mutesewif e ji ser berhemên wî ve bi hêsanî tê fêhm kirin ku ew ne bi tenê ilmên zahirî, ilmên menewî jî hîn bûye.

1. 4. KESAYETÎYA WÎ YA EDEBÎ Û BERHEMÊN WÎ

Siheta çavkanî û jêderên metnên klasîk yan metnên edebîyata kevn (berê) di hemû edebîyatên cihanê de pîrsgirêkeke mezin e. Rêjeya vê pîrsgirêkê ji zimanî heta zimanî diguhere ku ji ber şertên taybet ev pîrsgirêk di zimanê kurdî de hê zêdetir e. Dema ku em ji bo vê mijarê mînakekê bidin Pendnameya Ferîdudîn Etar mînakeke hêja

ye. Ji alîyê xwendevanên rojhilafî ve meseleyeke dîyar e ku Pendnameya di medreseyan de bi sedan sal in tê xwendin berhema Etar e. Lê belê ji ber ku destxeta şexsê Etar di destê vekolîneran de nîne, bi nusxeyên herî kevin yên ku hatine îstinsax kirin ve ev berhem li Etar tê nisbet kirin. Di encamê de her çî qas xwendevan vê berhemê ji sedî sed wekî berhema Etar bizanin jî vekolîner bi vî awayî li mijarê nanêrin û vê berhemê bi awayekî îhtimalî nisbetê Etar dikin. (Karacoşkun, 2012: 8) Ev mesele di edebîyata kevn de ji bo gelek berhemana bi heman awayî pêk tê. Her wiha berhemên Feqîyê Teyran jî ji ber ku destxeta şexsê wî bi xwe li holê tune ye û Feqî bi xwe dîwaneke temam li pêy xwe nehêştîye, eger ku hêştibe jî ji ber ku negihêştîye îro em dibêjin ku ev berhemên mewzubehs, îhtimaleke mezin ên Feqîyê Teyran in. Ji ber ku zimanê kurdî di binê gelek zorî zehmetî û zilmîyê de maye û dûçarê gelek înkâr û êrîşên tune kirinê bûye, dîsa bi heman awayî ji ber ku sazîyên xurt yên ku bikarin van berhemana biparêzin tune bûne di mijara çavkanî û destxetên berhemana de kêmasî û tengasî gelek in. Lê belê di vî warî de berhemên Feqî dema ku bi berhemên Cizîrî, Xanî û gelek şairên din ên kurd re bê muqayese kirin tê dîtin ku berhemên Feqî di warê çavkanî û jêderan de ji yên din lawaztir e. Ji xeynî çend berhemên wî yên ku di nav gel de navdar in û di tarîxên berê de hatine îstinsax kirin gelek helbestên wî hene ku di tarîxên nêzîk de bi awayekî devkî gihêştine destê vekolîneran û di tarîxên nêzîk de hatine qeyd kirin. Di nav jêderên helbestên Feqî de ya herî kevn ji alîyê rojhilasnase Almanî Le Coq ve di tarîxa 1911an de hatîye peyda kirin û li gorî Coq ew destnivîsa berhema Şexê Sen'an di tarîxa 1700î de hatîye nivîsîn (Dêreşî, 2011: 31). Dema ku em li destxetên helbestên Feqîyê Teyran dinêrin li gorî agahîyên ku vekolîner didin ji pirtûkxaneyên şerqê û xerbê, ji pirtûkxaneyên mela û şex û hezkerên helbestan ji 80yî zêdetir destxet³ heta niha hatine peyda kirin. Em ê navê nivîskar û tarîxa hin destxetên berhemên Feqî di binê sernavên berhemên wî de bidin.

1. 4. 1. Kesayetîya Wî Ya Edebî

Meriv dikare bibêje ku Feqîyê Teyran şairekî dualî ye. Ew bi zimanê berhemên xwe alîyekî temsîl dike û bi kûrahiya mesele û meneyên berhemên xwe ve jî alîyekî din temsîl dike. Mijar û meneyên helbestên wî her çî qas tesewuffî bin, ji bo ehlê hal

³Ji bo zêdetir agahî bnr. Seîd Dêreşî, Dîwana Feqîyê Teyran, Lîs, Diyarbakır, 2011, r. 31-58.

bin û xîtabê xewasê bikin jî, uslûba wî û di hin çîrokan de peyamên wî yên giştî bê guman xîtabê gel dikin. Ev xusûsiyet bi rastî xusûsiyeta edebîyata tesewufê ye. Lewra edebîyata tesewufê bi naveroka xwe û bi peyamên xwe ve hem xîtabê xwendevan, alim û zanayan dike hem jî xîtabê karker û gundîyan dike. Yanê edebîyata tesewufê xîtabê her çîna civakê dike. Ji bo vê jî edebîyata tesewufê di zimanê tirkî û farisî de jî di zimanê kurdî de jî wekî xala hevpar a edebîyata klasîk û edebîyata gelêrî tê hesabandin. (Güzel, 2009 :92) Dema ku meriv helbestên Feqî bi helbestên şairên hevdemên wî re muqayese dike bi awayekî eşkere derdikeve holê ku di helbestên wî de peyvên erebî û farisî kêmtir in. Feqî di helbestên xwe de bi giştî bikaranîna peyvên kurdî çêtir dîtîye û bi vî awayî bi zimanekî ku gel jê fêhm dike helbestên xwe honandiye.

Di berhemên Feqî de mijarên cur bi cur portreyeke rengîn di hişê meriv de zelal dike. Ji qiseyên tesewufî heta meseleyên evîne ji gelek mijarên civakî heta perwerdeya îrfanê gelek xal di berhemên Feqî de hene. Digel van qasî ku tê zanîn Feqî, yekem car e ku di derbarê hin macerayên tesewufî de bi kurdî çîrok nivîsiye (Adak, 2013: 214). Berhemên Feqî ji aliyên hunerî ve jî xwedî bingeheên xurt in. Di helbestên wî de teşbîh, telmîh, mecaz, îstiare û gelek hunerên din ên edebî, bi şarezayî hatine bikaranîn. Wî bi ziman û hunera xwe, gelek şair û nivîskarên kurd di binê tesîra xwe de hiştine.

Ji bo ku hostatîya wî ya edebî çêtir bê fêhm kirin em ê di derbarê hunerên edebî de ji helbestên wî çend mînakên bidin. Di helbestên Feqîyê Teyran de hunera telmîhê li gelek cihan bala meriv dikêşe. Telmîh, ew huner e ku dema şair bixwaze balê bikêşe ser fikr û meseleyek bi peyvekî yan jî bi çend peyvên wê meseleyê îşaret dike. Her wiha ew mesele ji ser wê îşaretê ve di hişê xwendevanan de zelal dibe ku ev huner di warê meneyê de dewlemendiyeke mezin dide helbestan.

Gelek sotim kirim kibab

Kirye bi min sed reng xirab

“Ya leytenî kuntu turab”

Wêran ez im malim xirab (Feqîyê Teyran, Dilber, b. 12, r. 160)

Her kesê işq tê eser kit

Sed hizar perdan di ber kit

Hemûwan dê ker bi ker kit

Tazîyê ‘uryan im ez (Feqîyê Teyran, Îro Ji Dest Husna Hebîb, b. 28, r. 135)

Avek mehîn im kemter im

Min cerg û dil bûne birîn

Sewda û dîn û ebter im

Pabendê vê nefsa le’în

Muksî ye jar û bedtir im

Ferhemnî xeyre rahimîn (Feqîyê Teyran, Ellah Çi Zatek Ehsen e, b. 20, r. 110)

Di benda ewil de bi rêza sêyemîn “Ya leytenî kuntu turab” ve Feqî hunera telmîhê bikaranîye û îşareta ayeta 40an ya sûreta Nebeyê kirîye ku meala wê jî ev e: “Bêguman me hûn ji ezabekî nêzîk hişyar kirin. Ew roja ku her kes kar û kiryarê xwe dibîne û yê kafir dibêje: Xwezî ez ax û xwelî bûma!” Di helbesta xwe de Feqî dibêje, xwezî ez xwelî bûma. Di benda din de jî, Feqî bi rêza “Tazîyê ‘uryan im ez” ve telmîhê bi bal Baba Tahirê Uryan ve dike. Di benda dawî de jî Feqî bi rêza “Ferhemnî xeyre rahimîn” ve Sûreta Mu’minûn ayeta 109. îşaret dike ku meala wê ev e: “Bêguman rewş ev e, ji bendeyên min civatekê digot: Xwedayê me! Me îman anîye li gunehên me bibihure û li me were rehmê. Bêguman her tu yî çêtirîne dilovanan.”

Teşbîh ku yek ji muhîmtirîn hunerên edebî ye û behsa şibandina du tiştan dike ji çar hêmanan pêk tê. Hêmana ewil “muşebeh” e ku tê meneya “ê dişibe” ya duyem “muşebehûn bîh” e ku tê meneya wê tiştê ku muşebeh dişibe wê. Hêmana sêyemîn “wechê şebah” e ku tê meneya alî yan jî taybetîya şibandinê yanê bersiva pirsê “muşebeh, bi çi alîyê xwe ve dişibe mûşebehûn bîhê?” dide me. Hêmana dawîyê jî daçeka teşbîhê ye ku di zimanê kurdî de daçekên; wek, fena, wekî, mîna û mislê daçekên teşbîhê ne. Di helbestên Feqî de mînakên teşbîhê gelek in. Mijara îsti’areyê jî perçeyê teşbîhê ye ku dema ji du hêmanên binhegîn yê teşbîhê yanê “muşebeh” û “muşebehûn bîh”ê yekî bê rakirin û bi tenê ji ser hêmanekî ve karê teşbîhê bê kirin wê

çaxê hunera îsti'areyê pêk tê. Yanê di îsti'areyê de ji her du hêmanên bingehîn ên teşbîhê bi tenê yek heye û ew hêmana ku di helbestê de hatîye dayîn hêmana veşartî jî tîne hişê meriv.

Çendî bêjim sir û halan

Ah ji destê çavxezalan

Her dinalim mah û salan

Kes bi halê min nezan (Feqîyê Teyran, Ez çi bêjim, b. 2, r. 415)

Geryan wekî dolaba aş

Seknî li dor şêx pêş û paş

Da xaçperest bêne temaş

Ji 'eskera temaşe tê (Feqîyê Teyran, Şêx Sen'an, b. 137, r. 274)

Tu j'emrê kê her têy bi bez

Sewdaserî şubhetê ez

J'kê ra dikî çûna bi lez

Vê serqutan û xulmetê (Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, b. 8, r. 113)

Di benda ewil de Feqî meşûqê xwe dişibîne çavxezalan, lê belê ji bo ku navê meşûqê xwe nedaye bi tenê “muşebehûn bîh”ê daye em dikarin bibêjin ku li vê derê Feqî, îsti'are pêk anîye. Dîsa di benda duyem de jî Feqî, di rêza ewil de dibêje “Geryan wekî dolaba aş”. Bi vî awayî Feqî, mirîdên Şêx Se'an bi alîkarîya daçeka “wekî” ve dişibîne dolaba aşê û hunera teşbîhê bikartîne. Di benda dawî de jî Feqî, avê bi xusûsiyeta sewdaserîyê ve dişibîne xwe.

Xwezî min sed ser hebana

Sed hizar dev pê ve bana

Ew hemû l'medhê te bana

Hêj bi wan noqsan im ez

Ez kiz û zer bûm ji qehrê
Dê devek çi b'kit ji behrê
Yan du çav çi b'kin li sehrê
Li dîtina 'eynan im ez

Sed hizar çav min divîna
Bayekî perde hilîna
Xet û xal min têr bidîna

Îşq û qûtê can im ez (Feqîyê Teyran, Îro Ji Dest Husna Hebîb, b. 25, 26, 27, r. 134)

Di bendên jorê de jî Feqî bi gotinên, “sed ser, sed hizar dev, sed hizar çav” ve hunera mubalexeyê bikaranîye. Dîsa Feqî bi rêza “Dê devek çi b'kit ji behrê” ve jî meşûqê xwe şibandîye “behrê” û dîyar kirîye ku “devek” ji bo behrê ne mumkun e bes be. Her wiha bi peyva “behrê” ve hem teşbîh kirîye hem jî mubalexe.

Di nav helbestvanên klasîk de mijara “îltifata qesrê” gelek muhim e ku ev, wekî “pergala patronajê” jî tê binavkirin. Di dewra siltanîyan de dema ku berhemek îltifata padîşah werdigirt, ew berhem dibû “şaheser” û xwedîyê wê berhemê jî hem di warê madî de xelatên giranbiha distand, hem jî di warê nav û şohretê de digihîşt meqameke bilind. Ehmedê Xanî, di edebîyata kurdî de ji ber tunebûna vê pergale gazind kirîye û ev gazind jî di sebeba telîfa “Mem û Zîn”a xwe de dîyar kirîye (Geverî, 2010: 51). Di sebebê telîfa mesnewîyan de şair dengê xwe, daxwazî û gazindên xwe digihînin xwendevanan û neslên din. Ehmedê Xanî jî bi berhemên xwe ve fikr û nêrîna xwe gihandîye heta îro. Feqîyê Teyran bi rastî mesnewîyeke musteqil nenivîsiye. Lê belê berhema wî ya “Şerê Dimdim” di terza mesnewîyê de hatîye nivîsîn. Digel vê berhema wî ya “Şêx Sen'an” jî di warê naverokê de mîna mesnewîyê ye. Lê belê xaleke balkêş e ku Feqî di nav tu berhemek xwe de ne pesna padîşahan ne pesna mîran û dewlemendan ne jî pesna xwe daye. Ev jî xusûsiyeteke wî ye ku bala meriv dikêşe. Hetta gelek şairên klasîk hene ku ne bi tenê di mesnewîyan de, di helbestên cuda de

carinan pesna xwe dane, lê belê Feqî çawa ku pesna xwe nedaye gelek car nefsa xwe rexne kirîye û ji nefsa xwe lome kirîye.

1. 4. 2. Berhemên Wî

Dema ku di çarçoveya giştî de berhemên Feqî bîn dabêş kirin em dikarin bibêjin ku berhemên wî dibine du beş: Beşa ewil ji çîrok û destanên wî pêk tê û beşa dûyem jî ji helbest û xezel û qesîdeyên wî pêk tê (Sadinî, 2014: 56). Ji xeynî çîroka wî ya “Hespê Reş” em ê hemû berhemên wî di warê naverok û şiklî de pêşkêş bikin. Her çî qas çîroka “Hespê Reş” wekî berhema Feqî bê qebûl kirin jî, lê belê di derbarê wê de tu agahî û destxet neketîye destê vekolîneran. Her wiha em bi tenê navê wê berhemê dizanin û heta ku di derbarê wê de agahî dernekevin holê em nikarin tiştêkî bibêjin. Berhemên Feqîyê Teyran bi naveroka xwe ya tesewufî û bi hunera sehlê mumtenî ve di edebîyata kurdî de mînakên heja ne. Di warê xwendinê de hesan û di warê meneyê de jî eşkere dixuyên, lê belê teqlîdkirina wan û di gelek cihan de şerha wan hema hema ne mumkun e. Feqîyê ku emrê xwe yê bi bereket di rêya xwendin û zanînê de borand berhemên cur bi cur û bi qîmet li pey xwe hiştin. Berhemên wî yên ku gihîştine destê me rêya vekolîner û xwendevanên zimanê kurdî ronî dike. Lê hezar heyf ku gelek helbest û berhemên wî yên wekî xezîneya edebîyata kurdî ne, di destê me de nînin.

1. 4. 2. 1. Di Warê Ruxsariyê De Berhemên Wî

1. 4. 2. 1. 1. Cureyên Nezmê

Di warê cureyên nezmê de helbestên Feqîyê Teyran bi vî awayî ne:

Cureyên Nezmê	Hijmar
Xezel	17
Qesîde	3
Muselles	4
Murebbe	9
Mesnewî	1
Bi tevahî	34

1. 4. 2. 1. 1. 1. Qesîde

Peyva “qesîde”yê ji qest kirinê tê û di edebîyatê de jî tê meneya wê cureya nezmê ku beyta wê ya ewil di nav xwe de beytên din jî bi beyta ewil re bi qafiyê ne (Saraç, 2012: 21). Rêza qafiyeya qesîdeyê wiha diçe: aa xa xa xa. Ev cure helbest bi giştî ji bo dîyarkirina meseleyek yan ji bo behsa kesekî tê gotin. Lê belê di warê mijarê de ji bo qesîdeyê sînoren tund tune ne. Di edebîyata klasîk de şairan bi gelek meqsedên cuda ve qesîde nivîsîne. Di edebîyata tirkî û farisî de ji bo hijmara beytên qesîdeyê hin sînora hatine kifşe kirin ku li gorî van sînora hijmara beytên qesîdeyê bi giştî di navbera 31 û 99 beytan de ye. Lê belê ev sînora di edebîyatê de bê îstisna nînin û rêzikeke teqez jî danaynin holê. Di edebîyata kurdî de xusûsen jî di berhemên Feqîyê Teyran de hijmara beytan gelek car jî vê sînore derbaz dibe. Tê zanîn ku mijara dirêjî yan jî kurtbûna qesîdeyê ji ber dijarîya peydakirina qafiyeyê pêk tê. Lê belê ji bo Feqîyê Teyran pîrsgirêkeke wiha mewzubehs nebûye lewra Feqî, peydakirina qafiyeyê li alîyek, di gelek helbestên xwe de qafiyeya hundirîn jî bikaranîye ku ji vê re musemmet tê gotin û ji bo şairan karekî ne hêsan e. Her wiha Feqî bi qafiyeya

hundirînê ve yanê bi terza musemetê ve qesîdeyên dirêj nivîsîne ku di warê ruxsarîyê de her şair nikare karekî wiha pêk bîne.

Dilo rabe dilo rabe veke çavan ku êvar e

Nezan û bes di xew da be bi newmê ra mebe yare (Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, b. 1, r. 203)

1. 4. 2. 1. 1. 2. Xezel

Meneya peyva xezelê, behsa eşqê, sohbeta bi jinan re û axaftina aşiqane ye. Di edebîyatê de jî cureyek nezmê ye ku beyta wê ya ewil di nav xwe de beytên wê yên din jî bi beyta ewil re bi qafîye ne (Saraç, 2012: 47). Rêza qafîyeya xezelê jî mîna rêza qesîdeyê ye û wekî aa, xa, xa didome. Di xezelê de jî di warê mijarê de sînorên tund tune ne. Xezelên ku di derbarê eşqê de, hezkirina dinyayê de, yan di mijarên tesewufê de hatine nivîsîn hene. Ji bo ku bi mijara me re tîkildar e divê ku em dîyar bikin, ji bo xezelên li ser mijarên tesewufî hatine nivîsîn, xezelên “sûfiyane” yan jî “arifane” tê gotin.

Di xezelan de şair bi giştî di dawîya xezelê de mexlesa xwe didin. Lê belê şair carinan mexlesa xwe ji xeynê dawîyê di beyteke din de jî dikarin bidin. Feqîyê Teyran di xezela “Îlahî Lew Dikim Zarî” de, di beyta duyemîn de, mexlesa xwe ya “Mîm û Hê” bikaranîye. Ji xeynê wê di hin xezelên xwe de mexles bikarmanîye di hin xezelên xwe de jî di dawîyê de mexleseke xwe daye. Xezelên wî yên ku di dawîyê de mexlesa wî hene ev in: “Ah Ji Destê Cama Wîsalê”, “Ey Av û Av”, “Îro Ji Dest Husna Hebîb”, “Qewî Îro Ze’îfhal im”. Xezelên wî yên ku tê de mexlesa wî tune jî ev in : “Çiya Anî Li Deştê Kir / Ji Rengê Dilbera Horî”, “Îro Ji ‘Eşqa Sorgulê”, “Dilo Carek Xwo Hişyar ke”, “Min Dî Di Xewnê Da Gulek”, “Ji Eşqê Te Ezî Dîn im”, “Hatim Ber Dergahê Rehmet”.

Hijmara beytên xezelan jî bi giştî di navbera pênc beyt û neh beytan de tê qebûl kirin. Ji bo xezelên ku ji 15 beytan zêdetir in jî “xezelên mutawel” tê gotin ku di edebîyata kurdî de mînakên wê cureyê gelek in.

Xezelên ku bi wezna “Çar Mefâ’îlûn” yan jî “ Çar Mûstef’îlûn”ê ve tene nivîsîn ji bo ku di nîvê rêzên beytê de jî xwedî qafîye ne meriv dikare beytê bike du par û beytê wekî çarîne jî bixwîne. Ji wê cureyê re xezelên musemmet tê gotin. Feqîyê

Teyran, ji bo ku di warê qafiye dîtîne de bi rastî jî pispor bûye berhemên xwe bi giştî bi vê tarzê nivîsîne ku ji ber vê sedemê gelek vekolîneran, beytên helbestên wî, wekî çarîne terîf kirine.

1

Ji eşqa te ezî dîn im şev û rojê d'xîyalê da
Hero carek te nabînim wekû gerham di malê da

2

Wekî gerham şîrîn kanê j' dev û lêva şekir barî
L'min ruhnî kir şeva tarî weku bayê şemal lê da

3

Şeva tarî şemal hilkir dil û mêlak li min kul kir
Tijî nar û tijî pel kir ji eşqa wê delalê da

4

Delalê j'min hebû kerbek bi destê xo hejand herbek
Li min da dilberê derbek wekî bizmar di ne'le da

5

Bi çakûç û bi bizmar e li min dabû bi herçar e
Dil min kul bû birîndar e yeqîn yar d'qitalê da

6

Qitala eşq û canan im ji vê eşqê ez heyran im
Bi vê xemrê ez sekran im fincana min şerab tê da

7

Şerab da min bi fincanê kirim saqî li meyxanê
Wekî gok im li meydanê li destê wê şepalê da

8

Li meydanê wekî go me bi derba kaşoyî çome

Gelî xelqa mekin lome ji derheq wê delalê da

9

Delalê ez kirim erd e biskên sîyah û mawerd e

Ji qewsan cezmîya berde te dêm boşîn di hîlalî da

10

Ji wa qewsa xedeng hatin ji wa burca tiveng hatin

Li min Rom û Fireng hatin mirin min dî di falê da

11

Elîf nayê di fala min qebûl nabê duaya min

Ne mecmu' e xiyala min belav bûm ji sewdayê da

12

Ji sewdayê ezî dîn im li ser eqlê xo namînim

Ebûsîna ji ku bînim li mecnûnê bibê peyda

13

Ezim mecnûn li dinyayê min sond xwarî bi Tahayê

Tu horîkî li dinyayê te dêm geş bûn d'hîlalî da

14

Tu yî bedra şîrîn eyne ji Tora qabe qewseynê

Ji wa herfa tu mabeynê çî bê xiş bû di fesalê da (Feqîyê Teyran, Ji Eşqê Te Ezî

Dîn îm, r. 479)

1. 4. 2. 1. 1. 3. Muselles

Peyva musellesê tê meneya sê goşeyê û di edebîyatê de jî, ji bo bendên ku ji sê rêzan pêk hatiye tê gotin (Saraç, 2012: 107). Di nav helbestên Feqîyê Teyran de çar muselles hene.

Ellah çî zatek ehzen e zêde letîf û qadir î

Mexlûq hemî neqşê te ne vêk ra li hemyan fikirî

Hemd û sena laîq we ne ya ‘erşê ‘ezîm çêkirî (Feqîyê Teyran, Ellah Çî Zatek Ehzen e, b. 1, r. 103)

1. 4. 2. 1. 1. 4. Murebbe

Peyva murebbeyê tê meneya çar goşeyê û di edebîyatê de jî, ji bo bendên ku ji çar rêzan pêk hatiye, tê gotin. Eger ku rêza dawî ya bendan bê dubare kirin ji wê cureyê re murebbeya mutekerir tê gotin. Eger ku rêza dawî ya bendan neyê dubare kirin ji wê cureyê re jî murebbeya muzdewîc tê gotin (Saraç 2012: 111). Di nav berhemên Feqîyê Teyran de ji bo her du cureyên murabayan jî mînak pir in.

Ey dil were disa bi coş

Carek ji cama mey binoş

Bikim qîsseta zembîlfiroş

Da seh bikin hikayetê (Feqîyê Teyran, Zembîlfiroş, b. 1, r. 399)

1. 4. 2. 1. 1. 5. Mesnewî

Peyva mesnewîyê tê meneya ducarîyê, di edebîyatê de jî, ji bo wê cureya helbestê ku her beyteke wê serbixwe ye û di nav xwe de xwedî qafîye ye tê gotin (Saraç, 2012: 79).

1

Helal kir'ye tahayê mezhebê qe kêr nayê

Em dim'rin nay'ne rayê Axret xoştir e j'dunyayê

2

Qeda l'dunyayê b'kevî dê rûreş bin li nik nebî

Qebûl nekin vî mezhebî hem'yan go: Belave bî

3

Hemiyan rayek vekir go aferîn ehda te kir

Avêtin tac qebûl nekir l'ser xat'ra Ebûbekir

4

L'ser xatira 'Umer e di rêya pêxember e

Xwe bikin ker bi kere rûspî bin da d'mehşere (Feqîyê Teyran, Şerê Dimdim, r. 383)

1. 4. 2. 1. 2. Hêmanên Ahengî

1. 4. 2. 1. 2. 1. Wezn

Feqîyê Teyran helbestvanekî erûzê ye ku helbestên xwe bi wezna erûzê honandine. Ji xeynî helbesta wî ya "Sînem û Çerxa Felekê" ku ev helbest, helbesteke kêr dixuyê, hemû helbestên wî bi kêşa erûzê hatine nivîsîn. Di helbestên wî de carinan qisûrên weznê diyar dibin lê belê gelek beyt û bendên wî hene ku di warê erûzê de bê qisûr in. Di hebestên wî de qalibên erûzê yên ku hatine bikaranîn ev in:

Mefa'ilun Mefa'ilun Mefa'ilun Mefa'ilun	11
Mustef'ilun Mustef'ilun Mustef'ilun Mustef'ilun	9
Mustef'ilun Mustef'ilun	5
Fa'ilatun Fa'ilatun	3
Mef'ûlu Fa'ilatun Mef'ûlu Fa'ilatun	1
Mustef'ilun Fe'ûlun Mustef'ilun Fe'ûlun	1
Mufte'ilun Fa'ilun Mufte'ilun Fa'ilun	1
Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun	1

Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun	1
Mefa'ilun Fe'ûlûn Mefa'ilun Fe'ûlun	1

1. 4. 2. 1. 2. 2. Qafiye

Feqîyê Teyran helbestên xwe bi rêya qafiyeyê ve di warê ahengê de xemilandine. Feqî di edebîyata kurdî de di mijara qafiyeyê de yek ji şairên herî jêhatî ye. Lewra wî digel dawîya beytên xwe, di nivê beytan de jî qafiyeya hundirîn bikaranîye û gelek helbestên xwe bi qafiyeya hundirîn yanê di terzê musemetê de nivîsîne. Ev jî nîşan dide ku Feqîyê Teyran di mijara peydakirina qafiyeyê de rehet e û ji qafiyeya hundirîn gelekî hez dike.

1. 4. 2. 1. 2. 2. 1. Qafiyeya Lawaz

Keyfa surrî bê şubhe ye

Ew ne wekî benka me ye

Sofi dibên seddeq we ye

Dijwar e bêhna hikmetê (Feqîyê Teyran, Şêx Sen'an, b. 160, r. 281)

1. 4. 2. 1. 2. 2. 2. Qafiyeya Asayî

Te ew xwarin hemî yekser

Neda kes ta nuqtek mefer

Ji Adem heta Pêxember

Veşartî cumle yekcar e (Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, b. 47, r. 224)

1. 4. 2. 1. 2. 2. 3. Qafiyeya Zêdebar

Şerm û edeb çûn wê demê

Dîn bû ji 'işqa sertemê

Bû pêkenîne alemê

Havêt kirasê rûmetê (Feqîyê Teyran, Şêx Sen'an, b. 98, r. 265)

1. 4. 2. 1. 2. 3. Redîf

Di helbestên Feqîyê Teyran de hem ji bo redîfên qertafî hem jî ji bo redîfên peyvî nimûne hene.

Ji heftarê di lêvşûr e

‘Ecûz e kevn e devkûr e

Hevûreng e hiştin pûr e

Heçî vêket ewê xwar e (Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, b. 59, r. 227)

Me ne reng ma ne qamet **ma**

Me ne xew ma ne rahet **ma**

Me ne bêhn ma ne sîret **ma**

Hemî borîn dinê sar e (Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, b. 36, r. 219)

1. 4. 2. 2. Di Warê Naverokê De Berhemên Wî

Di warê naverokê de berhemên Feqîyê Teyran rengîn in. Xusûsen mijarên tesewuffî û exlaqî zêdetir balê dikêşin lê belê carinan jî mijara hebûnê heta felsefeyê û eşqê gelek mijarên cuda jî di berhemên Feqî de cih digirin.

1. 4. 2. 2. 1. Şêx Sen‘an

Çîroka Şêx Se‘an di edebîyata rojhilatê de, yek ji çîrokên eşqê yên herî navdar e. Cara ewil jî alîyê Ferîdudîn Etar ve di Mentiqût Teyrê de hatîye nivîsîn û jî ser berhema Etar ve pêşî di nav milletên misilman de belav bûye. Di edebîyata tirkî, erebî û kurdî de jî berhemên ku di tesîra çîroka Etar de hatine nivîsîn hene. Di edebîyata kurdî de Feqîyê Teyran çîroka Şêx Sen‘an wekî menzûme nivîsîye û ev çîrok di nav berhemên Feqî de yek ji yên herî navdar e. Şêxê Sen‘anê ku em ê bi awayekî kurt dê behsa çîroka wî bikin bi eslê xwe jî Sen‘ana Yemenê ye û navê wî ye rastî jî Şêx Ebdurezaq e (Kemikli, 2011: 41).

Şêxê Sen‘an şêxekî xwedî teqwa û hikmet e ku 400 mirîdên wî hene. Li derdorê Mekeyê dijî û bi qencî û kerametên xwe ve tê naskirin. Li ser xewneke razdar 400 mirîdên xwe digire cem xwe û jî Mekeyê ber bi welatê Rûmê ve rêwîtiyê dike. Dema

ku digihîje welatê Rûmê aşiqê keçek fileh (ermenî) dibe ku li ser eşqa xwe dev ji dîn û îmana xwe berdide, dînê meşûqa xwe qebûl dike û ji bo wusletê bi şivantîya berazan jî razî dibe. Piştê vê rewşa xerab Xweda cardin hidayetê nesîbê Şêxî dike û Şêx bi tobeyê dev ji filetîyê berdide û piştê xwe dide keça fileh berê xwe dide Ke'beyê. Lê ji aliyê din ve keça fileh jî bi xewneke tijî hikmet ve tê hîdayetê û dema ku şîyar dibe bi şewqeke mezin dide pêy Şêxî. Şêxê ku di alema menewî de xebera hîdayeta keçikê werdigire cardin vedigere cem keçikê ku li rê keçikê di rewşeke perîşan de dibîne. Keça ku ji ber xeletîya xwe poşman bûye û tobe kirîye li ber Şêxê Sen'an dibe misilman û paşî jî canê xwe dide (Kemikli, 2011: 45). Di serê çîrokê de Şêxê Sen'an aşiq e keçik meşûq e lê belê di dawîyê de keçik dibe aşiq Şêx jî dibe meşûq. Di encamê de ji çîrokê tê fêm kirin ku eşq, hîseke wisa bi tesîr e ku meriv wekî hesina di destê hesinkar de ye sor dike û çî şiklî bixwaze wî şiklî dide meriv.

Ev çîrok ji bo ku di nav xwe de gelek mefhûmên tesewufî dihewîne yek ji muhîmtirîn berhemên Feqî ye. Berhema ku me di xebata xwe de gelek car jê îstifade kirîye ji 362 beytan pêk tê û qesîdeya musemmet e. Helbest bi qaliba erûzê ya "Mustef'ilun Mustef'ilun Mustef'ilun Mustef'ilun"ê ve hatîye honandin. Ev berhema Feqîyê Teyran di warê naverokê de dişibe mesnewîyan lê belê di warê ruxsarîyê de şertên mesnewîyê pêk nayne.

Di qisekirina çîrokê de zimanê wê hêsan e lê belê di cihên ku Feqî behsa meseleyên tesewufî dike de rewş hinekî diguhere. Jixwe ev xusûsiyet di hemû berhemên wî de heye. Di heman berhemê de gelek cih bi hêsanî tene fêm kirin lê belê hin peyamên taybet hene ku Feqî, ew peyam bi zimanekî muxlaq dîyar kirine û ji aliyê her kesî ve ji sedî sed nayê fêm kirin ku qesta wî çî ye.

Ev berhema Feqî, di 12 destnivîsên ku di tarîxên cuda de hatine îstinsax kirin de heye. Di nav van destnivîsan de ya herî kevin û heja ya Pirtûkxaneya Berlînê ye ku di sala 1911an de ji aliyê vekolînerê Almanî Le Coq ve hatîye peyda kirin û parastin (Dêreşî, 2011: 31). Li ser destnivîsa ku ji 346 beytan pêk tê, tu tarîx nehatîye nivîsîn. Lê li gorî texmîna Le Coq, ev destnivîs di derdora 1700î de hatîye nivîsîn. Nivîskar û vekolîner Seîd Dêreşî jî (2011: 32) di "Dîwana Feqîyê Teyran" de dîyar dike ku di amadekirina dîwanê de herî zêde ji vê destnivîsê îstifade kirîye. Digel vê destnivîsê, destnivîsa Seîd Rêzanî Elhuseynî ku li Sûrîyeyê li bajarê Amûdê destnivîsek amade

kirîye û tê texmîn kirin ku di salên 80yî de nivîsîye, dîsa destnivîseke din a berhema Şêx Sen'an li cem Prof. Dr. Celîlê Celîl heye ku tarîxa wê teqez nayê zanîn. Destnivîseke din a Şêx Sen'an 1348ê Hicrî de ji aliyê Şêx Beşîr Mihemed Tahirê Rikavayî ve hatîye amade kirin ku ev destnivîs jî 325 beytan pêk tê.⁴

Şêx Sen'an cara ewil ji aliyê Dr. Margarite Borisavna Rudenko ve di sala 1965an de li paytextê Rûsyayê yanê li Moskovayê digel wergera rûsî hatîye çap kirin (Sadînî 2014: 56). Pişt re ev berhem ji aliyê Memo Yetkîn ve bi herfên latînî di weşanxaneyê Roja Nû de li Stockholmê hatîye çap kirin. Ji xeynî van M. Reşîr Irgat di sala 1999an de ev berhem di nav weşanên Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê de daye çap kirin (Adak, 2013: 214).

1. 4. 2. 2. Bersîsê 'Abid

Çîroka Bersîsê Abid, behsa abidekî ji benî îsraîlê dike ku çawa mêla şeytên kirîye û xwe ji rêya Heq dûr xistîye. Ev çîrok di nav gel de çîrokekî navdar e ku bi armancên diyarkirina fitneya jinan, xetereya 'emelê bê ilm û xerabîya silûka bê murşîd tê qise kirin. Çîrok ji îsraîlîyatê tê hesabandin û navê Bersîs wekî Bersîsa jî derbaz dibe. Di Tefsîra Qurtûbî de (2006: 380) û di gelek kitêbên ku behsa çîrokên dîni dikin de "Qiseya Bersîsa" heye.

Feqiyê Teyran di berhema xwe ya bi navê Bersîsê 'Abid de maceraya balkêş û tijîders a Bersîsî, bi zimanê kurdî diyarê xwendevanan dike. Bersîs 'abidekî bi nav û deng bûye. Şeytan xwastine ku Bersîsî, ji rê derxin û şeytanekî biçûk ji bo wî wezîfedar kirine. Vî şeytanî xwe kiriye şiklê mirovekî zahid û piştê wextan ketiye dilê Bersîs û bûye şêxê wî. Ji bo ku Bersîs ji rê derxe dek û hîleyan fikiriye û keça mîr nexweş xistiye. Paşî çûye xewna Mîr û jê re gotiye ancax Bersîsê 'Abid dikare keça te baş bike. Wextê ku Mîr xapandiye û keça delal anîne cem Bersîsî, ketiye dilê her duyan û karên xerab bi Bersîsî daye kirin. Bersîs piştê ku poşman bûye şeytanî dîsa ew xapandiye û jê re gotiye: "Keça mîr bikuje ji vê şermê xelas be." Pişt re şeytên xeber daye Mîr û gunehê Bersîs eşkere kiriye, her wiha hukmê dardakirina Bersîs dane. Di dawiyê de şeytan çûye cem Bersîs û jê re gotiye: "Eger tu, ji bo min secdeyê bikî ez dikarim te ji vê derê xelas bikim." Bersîsê 'Abid jî bawerî bi şeytanî aniye û li ser kufre canê xwe daye (Kurdo, 1983: 73). Her wiha tê dîtin ku eşqa mecazî li vir ji

⁴ Ji bo destnivîsên din bnr. Seîd Dêreşî, Dîwana Feqiyê Teyran, Lîs., Diyarbakır, 2011, r. 31-40.

bo eşqa heqîqî dibe perde û Bersîs ji ber vê jî diçe helakê. Dema ku meriv bala xwe dide çîrokên tesewufî hêvîdarî û vekirîbûna deriyê tobeyê her tim balê dikişîne ser xwe lê belê di vê çîrokê de Bersîs, ji ber ku li ser kufirê dimire ev çîrok bi vê xusûsiyete ve ji çîrokên tesewufî vediqete ku ev xusûsiyete jî bi rastî delîl e ku ev çîrok ji îsraîliyatê ye.

Çîroka Bersîsê Abid jî bi tevahî ji 211 beytan pêk tê û qesîdeya musemmet e. Ev qesîde bi qaliba erûzê ya “Mustefîlun Mustefîlun Mustefîlun Mustefîlun”ê ve hatîye honandin. Destxeta Bersîsê Abid ku Ebdureqîb Yûsîf di kitêba xwe de behsa wê dike ji aliyê Mihemed Eliyê Kurê Hecî Reşîdê Kefşînî ve di dema feqîtiya wî de hatîye amade kirin. Li ser destxetê tarîxa wê, wekî sala 1969 tê dîyar kirin (Dêreşî, 2011: 40). Bersîsê Abid cara ewil ji aliyê Ebdureqîb Yûsîf ve li Hewlêrê di sala 2001an de hatîye çap kirin.

1. 4. 2. 2. 3. Zembîlfiroş

Peyva “zembîl”ê tê meneya “selik”ê û peyva zembîlfiroş jî di meneya selikfiroşê de tê bikaranîn. Li gorî qeneeta vekolîneran Zembîlfiroş derweşekî kurd û melamî ye ku di dewra Merwanîyan de jîyaye. Çîrok bi gelek aliyên xwe ve dişibe Çîroka “Yûsîf û Zuleyxayê” heta li gor hin vekolîneran ihtimal heye ku “Zembîlfiroş” jî ber çîroka “Yûsîf û Zuleyxayê” ve jî hatibe nivîsîn (Geverî, 2013: 35). Çîroka wî li gelek zimanan hatine tercume kirin û di nav gelên rojhilata navîn de çîrokeke navdar e. Bi taybetî ji aliyê dengbêjên kurd ve ev berhem wekî stran tê gotin û gelek navdar e. Ji bo ku zembîlfiroş çêtir bê fêr kirin divê ku pêşî em hinek behsa Terîqeta Melamîyan bikin. Rêya Melametîyê ji rêya sûfîtiyê hinek cuda ye. Melamî li dijî sûfîtiyê derketine û ev terîqet li Xorasanê ji aliyê Hemdûn Qesar ve hatîye belav kirin. Çend ferqên navbera melamî û sûfîyan ev in ku sûfî cilên ji hiriyê werdigirin lê belê melamî cilekî xusûsî wernagirin. Yanê melamî xwe bi şiklî ve ji xelqê cuda nakin. Sûfî zikr û îbadetên xwe bi awayekî eşkere dikin lê belê melamî van îbadetan bi awayekî veşartî pêk tînin. Di adetên sûfîyan de merasîmên terîqetê hene lê belê melamî li dijî van tevan derdikevin û ew bi tenê diçin sohbetan ji xeynê vê tu merasîmê qebûl nakin. Ew bi giştî xwedî kar û pîşe ne wekî gelek sûfîyan bi sedeqe û zekatê debara xwe pêk naynin heta ew gelek car di pîşeyê xwe de serkeffî ne (Uludağ, 2012: 242). Melamî ji navê xwe zêdetir bi kar û pîşeyê xwe tene nas kirin ku

zembîlfiroşî jî karek e û ev derwêşê kurd jî bi karê xwe hatiye nas kirin (Özsoy, 2014: 96).

Ev berhema Feqîyê Teyran di edebîyata kurdî de berhemeke navdar e ku piştê wî, Melayê Bateyî û Miradxanê Bazîdî jî heman berhem nivîsîne. Berhem ji 60 bendan pêk tê û bi zimanekî gelek hêsan hatiye nivîsîn. Ev berhem jî murebbeya muzdewîc e û bi qaliba “Mustefîlun Mustefîlun”ê ve hatiye honandin.

Di vê berhema Feqî de bi giştî behsa evîne û exlaqê pak ê Zembîlfiroş tê kirin. Bûyer di navbera zembîlfiroş û Gul Xatûnê de derbaz dibe. Zembîlfiroş ku bi qeşengîya xwe mîna Yûsifê kurdan tê hesibandin (Alan, 1997: 155) lawê mîr e û piştê dîtina xewneke bi hikmet dest bi rêya derwêşiyê dike. Dev ji seltenetê berdide û bi selikfiroşiyê debara malbata xwe pêk tîne. Bûyereke ku dişibe qîseyaya Hz. Yûsif tê rastê wî. Jina Mîrê Farqînê Gul Xatûn çav berdide Zembîlfiroşî û dibe museletê serê wî. Zembîlfiroş bi sebr û teslîmîyet xwe ji karên ku Xweda jê razî nîne dûr dide û di dawîyê de bi alîkarîya Xweda ve ji îmtihana xwe derbaz dibe (Zivingî, 2012: 9).

Destnivîsa herî kevin a Berhema Zembîlfiroş ji aliyê Aleksandir Jaba ve di sala 1869an de hatiye peyda kirin û li pirtûkxaneya Lenîngradê hatiye parastin (Zivingî, 2012: 24). Destnivîseke din jî, ji aliyê Mela Mihemed Emîn Berçayî ve hatiye amade kirin û li gorî tarîxên di destnivîsê de hene tê texmîn kirin ku di 1329ê Hicrî de hatiye nivîsîn (Dêreşî, 2011: 41). Digel van gelek vekolînerên rojhilatnas di sedsala 19. de hatine Kurdîstanê û destnivîsên Zembîlfiroş kom kirine. Vê çîrokê di gelek kitêbên klasîk û folklorî yên vekolînerên kurdan de cih girtîye û wekî kitêbek xweser jî hatiye nivîsîn. Berhem wekî kitêbeke serbixwe li bakûrê Kurdîstanê ji aliyê Azîz Samur ve di sala 2015an de bi wesîleya weşanxaneya Nûbîharê ve, ji aliyê Necatê Zivingî ve jî di sala 2012an de bi wesîleya weşanxaneya Banqa Heq ve hatiye çap kirin. Ji xeynî van çîroka Zembîlfiroş wekî pîyes, ji aliyê A. Gernas ve li Stockholmê di sala 1995an de hatiye çap kirin.

1. 4. 2. 2. 4. Şerê Dimdim

Ev bûyer di dema Feqîyê Teyran de pêk hatiye û Feqî vê bûyerê wekî destan dema ku li Medreseya Finikê bûye nivîsîye (Yıldırım, 2014: 17). Di nav tarîxa kurdan de yek ji destanên qehremanîyê yên herî muhim e. Di vê destana menzûm de behsa şerê kurdên rojhilatê (Îranê) û şahê Îranê tê kirin. Dimdim navê wê keleha ku di

navbera kurdan û şahê Îranê de ye. Ji alîyê dengbêjan ve gelek versiyonên vê destanê hatine gotin û tê texmîn kirin ku ev bûyer di derdora salên 1610an de qewimîye (Şemo, 2015: 11). Ev berhema Feqî ji 67 beytan pêk tê û di warê şiklî de mesnewî ye. Qaliba erûzê ya vê mesnewîyê jî “Mustefîlun Fe’ûlun Mustefîlun Fe’ûlun” e.

Piştî Feqîyê Teyran ev destan wekî mensûr ji alîyê hin nivîskar û vekolîneran ve hat çap kirin. Çend destxetên vê berhemê ji alîyê Ordîxanê Celîl ve hatine amadekirin û berhem bi zimanê rûsî hatîye çap kirin. Pişt re Îbrahîm Kale berhema Ordîxanê Celîl ku tê de destxetên berhema Dimdimê hene wergerê zimanê tirkî kirîye û di sala 2001an de bi wesfleya weşanxaneyê Avestayê ve daye çap kirin. Ji xeynê Ordîxanê Celîl, Jan Dost, Ereş Şemo û Hecîyê Cindî jî ev berhem wekî mensûr nivîsîne û dane çap kirin.

1. 4. 2. 2. 5. Ellah Çi Zatek Ehsen e

Ev helbest jî, yek ji helbestên Feqî, yê ku tê de herî zêde mefhûmên tesewufî hene ye. Di îzah û terîfa gelek mefhûmên tesewufî de me ji vê helbestê pir îstifade kir. Di vê berhemê de Feqîyê Teyran behsa mezinahî û hikmetên Xweda dike. Di hin cihan de yekbûna Xweda yanê tewhîd jî tê destnîşan kirin (Sadinî, 2014: 103).

Helbest ji 20 bendan pêk tê û her bendeke wê jî, ji sê rêzan pêk tê. Ji vê cureyê re muselles tê gotin û di edebîyata şerqê de ev cure zêde nayê bikaranîn (Yıldırım, 2014: 19). Ev musellesa Feqîyê Teyran bi qaliba “Mustefîlun Mustefîlun Mustefîlun Mustefîlun”a erûzê hatîye honandin.

Du destnivîsên vê helbestê hene ku yek ya Ebdulayê Tetwanî ye destnivîsa din jî di nav kitêba “Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî” ya Zeynel Abidin Zinar de li Stockholmê hatîye çap kirin.

1. 4. 2. 2. 6. Ey Av û Av

Di vê helbestê de Feqîyê Teyran ji ser şewq û heybeta avê ve behsa eşqa xwe û halê xwe dike. Di nav gel de tê gotin ku Feqî ev helbest li ser Çemê Miksê gotîye ku bi rastî jî çemekî pak e û gelek jî gur e. Di naveroka helbestê de Feqî behsa sohbetê û merîfetê dike. Ji ser merîfetê ve yanê ji ser naskirina Xweda ve muqayeseya arifan û ehlê aqilî dike. Digel vê ji ser çar madeyan ve behsa hebûna kaînatê, irfan û fanîbûna dinê dike. Ev helbest di derbarê ilmî Feqî de agahîyên muhim dide, lewra di vê

helbestê de hêmanên folklorî, tesewufî û şer'î bi pisporî hatine honandin (Sadînî, 2014: 111).

Zahir kirîn çar “bakir” e

Ba w av û ax û agir e

Heywan hemû jê çêkir e

Dar û nebata kiswetê (Feqîyê Teyran, b. 39, r. 123)

Di vê helbestê de Feqî zimanekî bi coş bikaranîye. Di warê zimanî de ev helbest di navbera helbesta gelêrî û klasîkê de ye, lewra ev zimanê bi coş carinan hêsan dibe carinan jî asê dibe (Doskî, 2012: 87). Helbest li gorî Tehsîn Îbrahîm Doskî (2012) wekî murebbe hatiye nixandin, li gorî Kadri Yıldırım (2014) jî wekî qesîdeya musemmet hatiye nixandin. Ev helbest bi qaliba erûzê ya “Mustefîlun Mustefîlun Mustefîlun Mustefîlun”ê ve hatiye honandin û di warê şiklî de jî xezela musemmet e.

Ev helbest di 5 destnivîsan de qeydkirî ye. Destnivîsek ji aliyê Ebdureqîb Yûsif ve di kovarek de hatiye weşandin ku li gorî gotina wî destnivîs, di sala 1960î de ji aliyê Mihemed Elî Botan ve hatiye nivîsîn. Destnivîsa Feqî Ehmedê Tixûbî ku di sala 1899an de hatiye nivîsîn jî di nav destnivîsên berhemên Feqîyê Teyran de yek ji yên herî pak e. Helbesta “Ey Av û Av” di nav vê destnivîsê de jî heye. Destnivîseke din ku destpêka wê wînda ye û tarîxa wê jî nediyar e ji aliyê kesekî ku navê Seîdî bikaranîye ve hatiye qeyd kirin û di destê vekolîneran de ye. Ji xeynî van, destnivîsa helbestê di arşîvên Z. A. Zinar û Prof. Celîlê Celîl de jî heye.

1. 4. 2. 2. 7. Îro Ji Dest Husna Hebîb

Feqîyê Teyran di vê helbestê ve behsa eşq, muhebet û sewdayê dîke. Ji ber agirê eşqê behsa perîşanbûna xwe dîke û di navbera halê xwe û halê Hz. Mûsa de têkilîyek datîne. Digel van behsa halên bi sir yê sûfîyan dîke û dîyar dîke ku van halan bi tenê kesên ku dijîn dikarin fêmkirin van halan dût in. Di naveroka helbestê de pesna Xweda û daxwazîya tecelîya cemalê jî di hin cihan de tê dîyar kirin (Sadînî, 2014: 127).

Ev helbest ji 33 beytan pêk tê û xezela musemmet e. Feqîyê Teyran vê xezelê bi qaliba “Mustefîlun Mustefîlun Mustefîlun Mustefîlun” a erûzê honandîye.

Destnivîsên vê helbestê 7 heb in. Destnivîsa Mihemed Emîn Berçî ku me berê behsa wê kiribû. Destnivîsa Feqî Ehmedê Tixûbî. Destnivîsa “Dîwana Kurmancî” ya Ebdureqîb Yûsif ku ji Antîkxaneyaya Mûsilê ji keşkolekî girtîye. Nivîskarê vê keşkolê ne dîyar e lê belê tê texmîn kirin ku di tarîxa 1767an de hatîye nivîsîn (Dêreşî, 2011: 49).

1. 4. 2. 2. 8. Bi Çar Kerîman

Di vê helbestê de Feqî behsa roja axiretê û tevdîrên wê rojê dike. Li xelqê şîret dike ku hişyar bibin û ji mela dinê xwe biparêzin. Di helbestê de bi zimanekî asê behsa çar kerîman (çar qîmetdaran) tê kirin. Lê belê ji ber ku zimanekî asê tê bikaranîn di helbestê de ev çar kerîm çî ne, bi awayekî eşkere nayê fêhm kirin (Sadîni, 2014: 137). Helbest murebbeya muzdewîc e, ji heft bendan pêk hatîye û li gorî qaliba “Mustefîilun Mustefîilun”ê hatîye honandin. Du destxetên vê helbestê hene ku yek destxeta Feqî Ehmedê Tixûbî ye, ya din jî destxeta “Dîwana Kurmancî” ye.

1. 4. 2. 2. 9. Îro Girya Me Tê

Feqî di vê helbestê de bang li xelqê Hêşetê dike û halê xwe ji wan re dibêje. Di giştîya naveroka helbestê de firqet yanê ji meşûqê dûrketinê tê dîyar kirin û di hin cihan de Feqî mefhûma firqetê jî terîf dike. Digel firqetê di dawîyê de Feqî behsa mefhûmên ruh û fenabûnê jî dike. Di derbarê Feqîyê Teyran de hin çîrok hene ku di nav xelqê de belav bûne. Li gorî çîrokek Feqî ji bo keça Mîrê Hêşetê dibe xwazgînî û Mîr jî ji bo dayîna keça xwe hin şertan datîne pêşîya Feqî. Feqî wan şertan pêk tîne û vedigere Hêşetê lê dema ku digihîje cem mîr dibîne ku keça mîr wefat kirîye. Tê gotin ku Feqî ev helbest ji bo keça mîr û ji ber xemgînîya xwe nivîsîye (Sadîni, 2014: 100). Helbesta ku ji 25 beytan pêk tê di terza qesîdeya musemetê de hatîye nivîsîn. Qaliba erûzê ya vê qesîdeyê jî “Mustefîilun Mustefîilun Mustefîilun Mustefîilun” e.

1. 4. 2. 2. 10. Feqe û Bilbil

Di vê helbesta Feqîyê Teyran de nîşaneyên Mentiqût Teyra Ferîdudîn Etar bi awayekî eşkere dixuyên. Helbest wekî diyalogek e ku di navbera Feqî û Bilbilê de derbaz dibe. Feqî di vê berhemê de cudatîya navbera eşqa mecazî û eşqa heqîqî dîyar dike. Digel van di helbestê de behsa ilmê hal, ilmê ledûn, naskirina Xweda tê kirin û têkilîya tewhîdê bi ilmê hal re tê danîn (Sadîni, 2014: 149).

Çar destnivîsên vê helbestê hene. Destnivîsek ku ji aliyê Ebdullahê Kurê Îsayê Bu'xaiyê Karçkanîyê Tetwanî ve hatîye nivîsîn, tarîxa vê destnivîsê ne dîyar e. Destnivîseke din jî ji aliyê Ebdureqîb Yûsif ve di saa 1980yî de di kovara Beyan hijmara 61an de hatîye weşandin. Du destnivîsên din jî yek ji kitêba “Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî” ya Zeynel Abidîn Zinar e ya din jî ji arşîva Celîlê Celîl e. Helbest ji 20 bendan pêk hatîye û di terza musellesê de hatîye nivîsîn. Qaliba wê ya erûzê jî “Mef'ûlu Fa'ilatun Mef'ûlu Fa'ilatun” e.

1. 4. 2. 2. 11. Dilber

Di vê helbestê de Feqî behsa dilberê û eşqa ji bo dilberê dike. Li gorî wî dilber Xweda ye û ji ber eşqa Xweda halê xwe yê wêran di vê helbestê de destnîşan dike. Feqî di helbestê de behsa eşqa mecazî dike û ji Xweda hêvîya eşqa heqîqî dike (Sadînî, 2014: 157).

Helbest ji 16 bendan pêk tê û di terza murebbeya mutekerîr de hatîye nivîsîn. Qaliba wê ya erûzê “Mustef'ilun Mustef'ilun” e. Du destnivîsên vê helbestê hene.⁵

1. 4. 2. 2. 12. Feqe û Melê

Ev helbesta ku delîla hevdembûna Melayê Cizîrî û Feqîyê Teyran e di nav xwe de gelek remz û îşaretên kûr yê tesewufî dihewîne. Di vê helbestê de Feqî û Melê bi zimanê tesewufî xîtabê hev kirine. Ji ser remza pûtan ve delalbûna Xweda û halê wîsalê tê kirin. Di vê helbestê de Feqî behsa wîsala xwe dike û tîne ziman ku ew di seyra xwe de gihîştîye cem Xweda. Digel van Feqî behsa berqa evîne dike ku ji ser vê ve şideta evîna Xweda tîne ziman. Her wiha di vê helbestê de tê dîtin ku Feqîyê Teyran bi rastî jî “rola feqîtiyê” wergirtîye û ji Melê pirsan dipirse, Melayê Cizîrî jî di qonaxa “Seydatîyê” de ye û bersivan dide pirsên Feqî. Li ser naveroka helbestê, Tehsîn Îbrahîm Doskî li Festîvala Feqîyê Teyran ya ku li Miksê pêk hatî de (2012: 53) danezaneke berfireh pêşkêş kirîye ku ev danezan ji gelek alîyan ve mîna şerha vê helbestê ye.

⁵ Ji ber ku di her destxetêkî berhemên Feqîyê Teyran de carinan çend helbestên wî hatine qeyd kirin û me bi giştî behsa destxetên mewzu behs kir em ê van destxetan di binê serevanên helbestan de êdî dubare nekin. Ji bo zêdetir agahî bnr. Seîd Dêreşî, *Dîwana Feqîyê Teyran*, Lîs, Diyarbakır, 2011, r. 31-58.

Ev helbesta ku ji alîyê herdu şairên navdar ên kurd ve hatîye nivîsîn muselles e û di helbestê de her sê malik jî bi heman qafiyeyê ve hatine honandin. Helbest ji 50 bendan pêk tê û qaliba wê ya erûzê jî “Mefa’îlun Fe’ûlûn Mefa’îlun Fe’ûlun” e. Di destê vekolîneran de heft destnivîsên vê helbestê hene.

1. 4. 2. 2. 13. Dilo Rabe

Di vê helbestê de Feqî, behsa dilê însanan dike. Taybetîya xefletê ji ser xewê ve tê terîf kirin û Feqî di vê helbestê de li nefsa sûfîyan şîretê dike. Helbest bi giştî li ser fanîbûna dinê û xefleta insan disekine. Digel van behsa dijwarîya qebrê (mirinê) û behsa ecela însanan jî dike (Sadînî, 2014: 203). Benda ku di derbarê emrê Feqîyê Teyran de agahîyê dide jî di dawîya vê helbestê de ye.

Mîm û Hê heftê felek çûn

Ji hîcretê dewran gelek çûn

Sal hizar û çil û yek çûn

Ev xezel anî diyare (Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, b. 80, r. 236)

Ev helbest ji 80 beytan pêk tê û li gorî tesnîfa Yıldırım qesîde ye (2014: 19), bi rastî jî ev helbest di warê şiklî de wekî qesîdeyê dixuyê lê belê Feqîyê Teyran bi xwe di dawîya helbesta xwe de ji bo vê helbestê dibêje ku xezel e. Her wiha divê ku gotina Feqîyê Teyran bê qebûl kirin û ev helbest wekî xezel bê tesnîf kirin. Qaliba erûzê ya vê helbestê jî “Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun” e.

1. 4. 2. 2. 14. Îlahî Lew Dikim Zarî

Di vê helbestê de Feqî bi fizar û zarî gunehkarîya xwe îtiraf dike û ji bo gunehên xwe efuya Xweda dixwaze. Di vê helbestê de mefhûma saqî tê terîf kirin û Feqî ferqa navbera kesên ehlê hal û ehlê zahir tîne ziman (Sadînî, 2014: 237). Helbest ji şeş beytan pêk tê û xezela musemmet e. Qaliba wê ya erûzê “Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun” e.

1. 4. 2. 2. 15. Ez Çi Bêjim

Feqîyê Teyran di vê helbestê de sir û hikmetên hal û meqamên tesewuffî bi remzan ve terîf dike. Di vê helbestê de bi awayekî eşkere eşqa xwe terîf dike ku ew aşîqê Xweda ye û kesên ku aşîqê Xweda nebin nikarin halê wî û eşqa wî fêm bikin

(Sadinî, 2014: 417). Helbest ji 8 bendan pêk tê û murebbeya mutekerir e. Qaliba wê ya erûzê “Fa’ilatun Fa’ilatun” e.

1. 4. 2. 2. 16. Ay Dilê Min Ay Dilo

Feqîyê Teyran di vê helbestê de behsa halê dilê xwe yê bi muhebet kirîye. Jana xwe ya ji ber eşqê anîye ziman (Sadinî, 2014: 417). Helbest ji 19 bendan pêk tê û murebbeya mutekerir e. Qaliba wê ya erûzê “Fa’ilatun Fa’ilatun” e.

1. 4. 2. 2. 17. Qewî Îro Ze’îfhal im

Feqîyê Teyran di vê berhemê de behsa halê xwe yê bendewariya wusletê dike. Di helbestê de dîyar dike ku ji ber bendewariya wusletê zeîf ketîye. Birînên wî yên ji ber sewdayê kûr in û kesek nîne ku dermanî lê bike (Sadinî, 2014: 421). Helbest ji 17 beytan pêk tê û xezela musemmet e. Qaliba wê ya erûzê “Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun” e.

1. 4. 2. 2. 18. Çiya Anî Li Deştê Kir

Feqîyê Teyran di vê helbestê de behsa dilberê dike û muqayeseya dilberê bi Zuleyxaya Hz. Yûsif re dike. Di hin berheman de navê vê helbestê wekî “Ji Rengê Dilbera Horî” derbaz dibe. Feqî di helbestê de pesna dilberê dide û wî ji hemû delalên cîhanê bedewtir dibîne. Digel vê di helbestê de Feqî xwe jî dişibîne Hz. Yûsif (Sadinî, 2014: 425). Helbest ji 10 beytan pêk tê û xezela musemmet e. Qaliba wê ya erûzê “Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun” e.

1. 4. 2. 2. 19. Îlahî ‘Ebdukel Atak

Di vê helbestê de Feqî behsa rehma Xweda dike. Li ser hikmetên Xweda disekine û bi rêzên helbestê ve xwe dispêre Xweda. Di hin cihên helbestê de bi Xweda ve tobe dike û jê efuya xwe dixwaze (Sadinî, 2014: 429). Helbest ji 26 bendan pêk tê û murebbeya muzdewîc e. Qaliba wê ya erûzê “Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun” e.

1. 4. 2. 2. 20. Ji ‘Işqê Sotime Welleh

Di vê helbestê de Feqî behsa herareta eşqa xwe dike. Digel vê di dawîya helbestê de Feqî behsa cemalê yanê dîtina tecelîyên Xweda dike (Sadinî, 2014: 435).

Helbest ji 20 beytan pêk tê û xezela musemmet e. Qaliba wê ya erûzê “Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun” e.

1. 4. 2. 2. 21. Bizan Ku Min Yar Tu Yî

Di vê helbestê de Feqî mefhûma yarê terîf dike, behsa xwe û yarê xwe dike. Ew yarê xwe bi wesfên xweşik diwesîfîne û xwe jî li hemberê wî wekî mubtelayan terîf dike (Sadînî, 2014: 443). Helbest ji 18 bendan pêk tê û muselles e. Qaliba wê ya erûzê jî “Mufte’ ilun Fa’îlun Mufte’ ilun Fa’îlun” e. Ji bo vê helbestê Kadri Yıldırım (2014: 235), gotiye ku muselles e. Lê belê li gorî qeneeta me rêzên beytên musellesê divê ku ev qasî kurt nebe. Ji keynê vê dema ku me li destnivîsê jî nêrî ev qeneet di hişê me de xurttir bû, lewra di destnivîsê de jî, her bendek li ser sê qisman hatîye teqşîm kirin. Lê belê ji bo ku Feqîyê Teyran di helbestên xwe de bi giştî qafiyeya hundirîn bikaranîne gelek vekolîner di tespîtkirina cureyên nezmê de her rêzek ji beytên helbestên Feqî, wekî du rêzên cuda xwendine û ketine nav şaşîyê. Ev helbest li gorî qeneeta me muselles e û rêza bendên wê jî di her sê kitêban de jî rast nîne. Di her sê kitêban de jî benda heftan a helbestê wiha hatîye dayîn.

Horîya Rehman tu yî

Mohra sultan tu yî

‘Îsayê zeman tu yî

Min dike derman tu yî

Ê ez di ferman tu yî

Hekîmê Loqman tu yî (Sadînî, 2014: 444)

Huriya Re’hman tu yî

Mihra Silêman tu yî

Zemanê Îsa tu yî

Min dikî derman tu yî

Xoş dikî derdan tu yî

Bi ah û kivan tu yî (Dêreşî, 2011: 226)

Horiya Rehman tu yî

Muhra Suleyman tu yî

‘Îsayê zeman tu yî

Min dike derman tu yî

Ê ez di ferman tu yî

Hekîmê Loqman tu yî (Yıldırım, 2014: 236)

Li gorî qeneeta me ev bend û hemû bendên vê helbestê wekî muselles û bi vê rêzê divê ku bê dayîn, lewra ev rêzê li gorî destnivîsê rasttir e.

Horiya Rehman tu yî min dike derman tu yî

Mohra Suleyman tu yî ê ez di ferman tu yî

Îsayê zeman tu yî Hekîmê Loqman tu yî

Ev rêzê jî li gorî me hem di warê meneyê de encamên rasttir dide û hem jî li gorî destnivîsa berhemê xwendineke rasttir e. Lewra piştê gotina “Mohra Suleyman” gotina “ê ku ez di fermana wî de me tu yî”, ji gotina “Îsayê zeman tu yî” rasttir e. Ev rêzê li gorî divê ku di hemû bendên vê helbestê de pêk were. Lewra ne bi tenê di benda heftan de di çend bendên din de jî ev rêzê zêdetir li meneya helbestê tê.

1. 4. 2. 2. 22. Ey Dil Hilo Terk Ke Sefa

Feqîyê Teyran di vê helbestê de gazî dilê xwe dike û dilê xwe hişyar dike. Behsa bê wefabûna hemû mal û milkên dinê dike û halê xwe yê bi ahê evîne tîne ziman (Sadînî, 2014: 449). Helbest ji 16 beytan pêk tê û xezela musemmet e. Qaliba wê ya erûzê “Mustef’ilun Mustef’ilun Mustef’ilun Mustef’ilun” e.

1. 4. 2. 2. 23. Ordeka Ava Cizîrê

Feqîyê Teyran di vê berhemê de behsa tecelîyên Xweda dike û wan tecelîyan bi xweşî û delalîyên dinê teşbîh dike (Sadînî, 2014: 453). Helbest ji 10 bendan pêk tê û murebbeya muzdewîc e. Qaliba wê ya erûzê “Fa’ilatun Fa’ilatun” e.

1. 4. 2. 2. 24. Fesla Bihara Cennetê

Feqîyê Teyran di vê helbestê de pesna biharê dide û behsa xweşîyên biharê dike. Di helbestê de tê dîtin ku bi coşa biharê ve eşqa Feqî jî diwartir dibe. Di dawîyê de jî Feqî ji bo rehma Xweda û Cinetê dia dike (Sadîni, 2014: 457). Helbest ji 12 bendan pêk tê û murebbeya mutekerîr e. Qaliba wê ya erûzê “Mustef’îlun Mustef’îlun” e.

1. 4. 2. 2. 25. Xwedawenda Gunehkar im

Di vê berhemê de Feqîyê Teyran gunehkarîya xwe û poşmanbûna xwe tîne ziman. Ji Xweda hevî dike ku bi rehma xwe bike û wî ‘efû bike (Sadîni, 2014: 461). Helbest ji 12 beytan pêk hatiye û xezela musemmet e. Qaliba wê ya erûzê “Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun” e.

1. 4. 2. 2. 26. Xwedawenda Tu Sebbûh î

Feqîyê Teyran di vê helbestê de behsa dijarîya qebrê û mirinê dike. Ji Xweda hevî dike ku ruhê wî bi awayekî hêsan jê bistîne û di roja çûyîna qebra tarî de alîkarîya wî bike. Di helbestê de Feqî bi navên Xweda yên mîna Sebbûh, Sebûr, Rehîm, Settar, Xeffar, Melîkul Mulk û Cebbar ve dia dike û ji Xweda alîkarîyê dixwaze (Sadîni, 2014: 465). Helbest ji 11 beytan pêk tê û xezela musemmet e. Qaliba wê ya erûzê “Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun” e.

1. 4. 2. 2. 27. Îro Ji Eşqa Sorgulê

Di vê helbestê de Feqî behsa eşq û muhebeta Xweda dike. Di destpêka helbestê de muhebetê dişibîne tîrê û her wiha muhebeta xwe terîf dike. Di vê helbestê de ji mefhûmên tesewufî mefhûma “heybetê” jî, ji aliyê Feqîyê Teyran ve tê terîf kirin (Sadîni, 2014: 469). Helbest ji 13 beytan pêk tê û xezela musemmet e. Qaliba wê ya erûzê “Mustef’îlun Mustef’îlun Mustef’îlun Mustef’îlun” e.

1. 4. 2. 2. 28. Dilo Carek Xwo Hişyar Ke

Feqîyê Teyran di vê helbestê de terîfa dilberê dike û şewqa xwe ya ji bo dilberê tîne ziman. Di helbestê de çîroka Şexê Sen’an jî wekî mînak dide û di hin beytan de ji ber şewqa eşqê rêzên ku wekî şethê tene hesibandin tîne ziman (Sadîni, 2014: 473). Helbest ji 15 beytan pêk tê û xezela musemmet e. Qaliba wê ya erûzê “Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun” e.

1. 4. 2. 2. 29. Min Dî Di Xewnê Da Gulek

Feqîyê Teyran di vê helbestê de dîyar dike ku di xewneke xwe de tecelîya Xweda dîtiye û ji bo ku heyranê wî bûye bi helbestê pesna wî daye. Piştê xewnê ji ber ku ketîye nav eşa cûdamayînê (firqetê) jî eş û elema xwe anîye ziman (Sadinî, 2014: 477). Helbest ji pênc beytan pêk tê û xezela musemmet e. Qaliba wê ya erûzê “Mustef’ilun Mustef’ilun Mustef’ilun Mustef’ilun” e.

1. 4. 2. 2. 30. Ji Eşqa Te Ezî Dîn im

Di vê helbestê de Feqî eşqa Xweda, halê xwe yê ji ber eşqê û ru’yetê yanê dîtina Xweda tîne ziman (Sadinî, 2014: 479). Helbest ji 14 beytan pêk tê û xezela musemmet e. Qaliba wê ya erûzê “Mefa’ilun Mefa’ilun Mefa’ilun Mefa’ilun” e.

1. 4. 2. 2. 31. Hatim Ber Dergahê Rehmet

Di vê helbestê de Feqî behsa pêxember Hz. Muhemed (sew) dike û di gelek beytan de pesna wî dide (Sadinî, 2014: 483). Helbest ji 18 beytan pêk tê û xezela musemmet e. Qaliba wê ya erûzê “Fa’ilatun Fa’ilatun Fa’ilatun Fa’ilun” e.

1. 4. 2. 2. 32. Ah Ji Dest Cama Wîsalê

Feqîyê teyran di vê helbestê de behsa wîsalê yanê gihîştina cem Xweda û zewqa halê wîsalê kirîye (Sadinî, 2014: 487). Helbest ji 10 beytan pêk tê û xezel e. Qaliba wê ya erûzê “Fa’ilatun Fa’ilatun Fa’ilatun Fa’ilun” e.

1. 4. 2. 2. 33. Ellah Sehergaha Ezel

Feqîyê Teyran di vê helbestê de behsa ezêlibûn û ebedîbûna Xweda dike, digel vê xuliqandina însanê ewil Hz. Adem û qedera însanan jî di vê helbestê de tîne ziman (Sadinî, 2014: 491). Helbest ji pênc bendan pêk tê û murebbeya muzdewîc e. Qaliba wê ya erûzê “Mustef’ilun Mustef’ilun” e.

1. 4. 2. 2. 34. Îlahî Ger Gunehkarem

Helbesteke Feqîyê Teyran e ku bi zimanê farisî nivîsîye. Di helbestê de Feqî, poşmanîya xwe tîne ziman û tobe dike. Behsa ezaba cehenemê dike û xwe jê dispêre rehmeta Xweda (Sadinî, 2014: 493). Helbest ji 10 beytan pêk tê û xezel e. Qaliba wê ya erûzê “Mefa’ilun Mefa’ilun Mefa’ilun Mefa’ilun” e.

1. 4. 2. 2. 35. Sînem û Çerxa Felekê

Feqîyê Teyran di vê helbestê de behsa sewdayê dike. Di sê beşên helbestê de jî pesna Hîzana Bedlîsê dide (Sadinî, 2014: 495). Du destxetên vê helbestê hene li cem M. Xalid Sadinî ne. Di helbestê de bend û rêzên kêr hene. Ji ber kêmasîyan me nekarî wezn û cureya wê kifşe bikin.

BEŞA DUYEM

LI GORÎ FEQÎYÊ TEYRAN TESEWUF Û DI BERHEMÊN WÎ DE HÊMANÊN TESEWUFÎ

Di vê beşê de em ê pêşî li ser ilmê tesewufê bisekinin. Di çarçoveya çavkanîyên bingehîn de tesewuf çi ye û çi nîne em ê yek bi yek vekolin. Paşê jî em ê nêrîn û şîroveyên Feqîyê Teyran yên di derbarê tesewufê de pêşkêş bikin. Gelo Feqî bi awayekî giştî ji tesewufê çi qest kirîye û tesewuf çawa terîf kirîye? Di dawîyê de jî em ê helbestên Feqîyê Teyran di warê hal û meqam û mefhûmên tesewufî de binirxînin ku Feqî van hal û mefhûman bi kîjan xusûsiyetên wan ve girtine dest û dîyar kirine. Her wiha, em ê têbigihîjin ku wî, li gorî hal û meqama xwe di vî warî de çi gotîye û nirxandineke çawa pêk anîye.

2. 1. MAHÎYETA TESEWUFÊ Û LI GORÎ FEQÎYÊ TEYRAN TESEWUF

Pirsa tesewuf çi ye, ji aliyê gelek sûfî, vekolîner û aliman ve hatîye bersivandin. Em ê bersiva vê pirsê ji sê aliyên cuda ve binirxînin. Pêşî em ê di vê mijarê de behsa xebatên nûjen û nêrîna vekolînerên nûjen bikin. Her wiha em ê dîyar bikin ku tesewuf di dewra îro de ji aliyê ehlê ilmî ve çawa hatîye fêhm kirin. Piştî re em ê behsa mutesewifên berê û çavkanîyên bingehîn yên tesewufê bikin û em ê li bersiva pirsê gelo li gorî “ehlê hal” tesewuf çi ye, rawestin. Bi vî awayî em dixwazin ku meseleyê ji çavkanîyên esil binirxînin. Di dawîyê de jî em ê di derbarê mijara tesewufê de li ser fikrên Feqîyê Teyran bisekinin. Ji bo ku xebata me li ser berhemên Feqîyê Teyran e bi awayekî tebîî jî terîf û îzahên Feqî, ji bo me muhimtir e.

Dema ku em li vekolînên li ser meseleya tesewufê dinêrin qene’eteke giştî bi vekolîneran re hasil bûye ku peyva “tesewuf”ê di kokê xwe de ji peyva “sewf”a erebî hatîye ku ev peyv di zimanê erebî de tê meneya hirîyê û dema ku wekî “tesewuf” tê bikaranîn jî meneya wergirtina cilên hirîyê dide (Misbah, 2015: 31; Öngören, 2013:119; Ebû Nasr Serrâc Tûsî, 2012: 21; Kuşeyrî, 2014: 367; Hücvirî, 2014: 95). Di vekolînan de di navbera “ehlê sufayê” ku meclîsa Resûlallah e (es) bûye û sûfîyan de hin xalên hevpar hatine tespît kirin û ji ser van xalên hevpar ve tê dîyar kirin ku îhtimal heye peyva “sûfî” û “tesewuf”ê jî, çanda tesewufê jî ji sufaya pêxamber (es) hatibe (Yılmaz, 2001: 17). Terîfên ku li ser tesewufê hatine kirin yanê yên nûjen û kevin, vekolînên akademîsyenan û gotinên sûfîyan, bi tevahî di heman çarçoveyê de

kêm zêde nêzikê hev in. Tesewuf li gorî hinekan ilmek e ku xwedîyê alîyekî teorîk û alîyekî pratîk e. Yanê çawa ku ji bo fêmkirina hukmên îslamê yan jî, ji bo derxistina hukman, ilmê fiqhê derkete holê, dîsa çawa ku ji bo zimanê peyamên îlahî çêtir bê fêm kirin ilmê tefsîrê derkete holê, yan jî çawa ku ji bo suneta pêxember (es) çêtir were fêm kirin ilmê hedîsê derkete holê bi heman awayî ji bo ku menewîyata dîn, ji bo ku exlaqê îslamê çêtir were fêm kirin jî, ilmê tesewufê wekî dîsîplîneke kamil derketîye holê (Yüce, 2000: 18). Ev ilmê menewî li gorî hinekan wisa ilmeke muhim e ku ilmê fiqhê, di çarçoveya ilmên îslamî de ilmeke bingehîn tê hesabandin, lê belê bê ilmê tesewufê ew jî kêm dimîne (Havva, 1997: 80). Lewra di nimêj û rojîyê de her çi qas şertên zahirî yên ku nimêj û rojîyê xerab dîkin muhim bin, şertên ku xûşû û bereketa menewî ya îbadetan tune dike jî wekî şertên zahirî muhim in. Lewra xûşû û aramîya dilî wekî naveroka îbadetan e dema ku di îbadetên îslamî de ev hêmanên menewî tune bin ew îbadet noqsan tên hesabandin. Îlmê tesewufê yan jî li gorî navlêkirineke cuda dibistana eşqê, dilê însanan pak dike, xerabiyên wan tune dike û di dawîyê de jî di navbera wan û Xwedayê wan de tu tiştek nahêle (Mutahhari, 2012: 142). Tesewuf, gelek car wekî rêwîtiyek hatîye terîf kirin ku ew rêwîti di rêyeke tijî hal û meqam û îmtihanên cur bi cur de tê kirin û di encama wê rêwîtiyê de rêwî digihîje Xwedayê xwe (Uludağ, 2014: 67). Hin kesan vê rêwîtiyê ji aliyê encama wê ve bi nêrîneke cuda nirxandine ku li gorî wan ev rê jî kesretê yanê ji zêdehiyê dest pê dike û di encamê de zêdehî fanî dibe, bi tenê yek li holê dimîne. Bi gotîneke zelaltir, tê dîyar kirin ku ev rê rêya yekîtiyê ye (Schimmel, 2012: 147). Eger ku em bi gelemperî agahiyên vekolîneran di çarçoveyek de bicivînin, em dikarin bibêjin ku tesewuf, ilmek e ku ev ilm, wekî ilmê hal tê zanîn. Ev ilm bi hal û tecrubeyan ve pêş dikeve. Di vî ilmî de agahî, naskirina Xweda ye û ji ser merîfetullahê ve fêrbûn pêk tê. Di vî ilmî de tu kes nikare bi serê xwe pêş bikeve, ji bo vî ilmî muheqqeq ustadek divê, ku ji wî ustadî re jî murşîd tê gotin. Murşîd bi xwe jî ne ku bi serê xwe û bi rêya kitêban ve vî ilmî hîn dibe, ji bo her murşîdekî jî perwerdeya tecrubeyî divê ku ancax bi vî awayî dikare murşîdiyê bike. Û di vî ilmî de ji mantiqê zêdetir qelb dikeve dewreyê ku jixwe mijara vî ilmî ji madeyê zêdetir li ser qelb û ruhî ye. Di vî ilmî de perwerde merhale merhale diçe. Ji pakbûnê ve dest pê dike heta wusletê didome. Piştê meqama wusletê armanc pêk tê û du halên dawî bi sûfiyan re xwe nîşan dide. Pêşî sûfî bi tevahî ji daxwaziyên xerab fanî dibe, piştê fenabûnê jî êdî bi daxwazîya mubeta

Xweda ve di heqîqetê de baqî dibe mîna meşûqê xwe. Di encama vê rewîtiyê de êdî însanekî wisa derdikeve holê ku ji wî însanî re sûfî, dibêjin “însanê kamil” ku ev cure însan, nêzîktirîn kesên “heqîqeta Muhmedî” têne hesabandin. Bi terîfa herî kurt, tesewuf, wekî esl û taca îslamê hatîye terîf kirin (Nasr, 1984: 90).

Me li jorê terîfên vekolîneran dan, ku ew terîf ne ji ber hal û meqamên vekolîneran ve derketine holê. Ew terîf ji ser gotinên ehlê hal ve hatine tespît kirin ku niha jî em ê rast e rast hinek gotinên sûfîyan yên di derbarê “tesewuf”ê de dîyar bikin. Di pêşîya terîfên derwêş û arifan de divê ku em agahîyeke muhim destnîşan bikin. Di tesewufê de mijara hijmara hal û meqaman bi awayekî zelal nehatiye kifşe kirin. Di kitêban de dema ku behsa hal û meqaman têne kirin ji bo wan hijmareke ku li ser yekîti çêbûye dernakeve holê. Her wiha em dikarin bibêjin ku her çi qas ji bo hal û meqaman hijmarên cuda bêne dayîn jî bi rastî halên sûfîyan zêde ne û ihtimaleke mezin dema ku halên wan bi giştî bê tespît kirin dê hijmareke zêde derkeve holê. Sûfîyên ku gotinên wan hatine qeyd kirin jî bê guman her yek di hal û meqamên cuda de bûne û di halên cuda de hin gotin gotine. Her wiha çawa ku hijmara halên sûfîyan zêde ne, terîfa tesewufê jî ji bo ku girêdayê halê sûfîyan bûye bi hijmareke zêde hatîye îro. Ji bo ku terîfa sûfîyan ji ser halê wan ve pêk hatîye yanê her sûfî li gorî halê xwe yê menewî mijar nixandîye û terîf kiriye hinek terîfên sûfîyan bi rastî di çarçoveyeke teng de mane. Lê ev gotinên ehlê hal, her çi qas gelek car çarçoveya giştî nedin jî, di çarçoveya giştî de perçeyên muhim bi awayekî pir ecêb derxistine holê û nîşanê xwendevanan dane.

Ibrahîm Bîn Edhem ji bo salikan, yanê ji bo namzedên rêya tesewufê wiha gotîye:

“Ji ser dilê salikî divê ku ev her sê perde bêne rakirin da ku ji bo wî derîyê dewletê vebe. Ya ewil ev e ku dema ji her îhsana ebedî ve milkê her du aleman jê re bê dayîn jî divê ku ew dilşad nebe, eger ku dilşad be, ev nîşane ye ku ew hê bi destxistina tiştên ku hatine xuliqandin dilşad dibe û hê xwedî xirs e. Lê kesên bi xirs mehrûm in. Perdeya duyem ev e: Milkê her du aleman ê wî be û dema ku jê bê standin jî, divê ew ji ber iflasê xemgîn nebe. Lewra xemgîniya wî halî nîşaneya hêrsbûnê ye ku kesên hêrsbûyî di nav ezabê de ne. Ya sêyem jî ev e: Divê ku berhayê pesindayîn û medhan nekeve, bi pesnê neyê xapandin. Lewra kesên ku bi pesnan kêfxweş dibin himeta wan

bê qîmet e û kesên ku himmeta wan bê qîmet e jî, ji Heq bi perdeyan ve hatine dûrxistin.”(Attâr, 2012: 134)

Zûnnûnê Misrî jî rêya gihîştina cem Xweda wiha terîf kirîye:

“Şehzadeyek bi cemeetê re ji mizgeftê derdiket. Min jî digot: ‘Ji lawazekî ku serî bi hêzdarî re digire ehmeqtir kesekî tune.’ Şehzade got: ‘Ev tê çi meneyê?’ Min jî jê re wiha îzah kir: ‘Însan lawaz e, lê belê bi Xwedayê hêzdar re serî digire.’ Li ser vê gotinê rengê wî ciwanî çû. Rabû û çû. Rojek pişt re hat û got: ‘Rêya ku diçe cem Xweda çi ye?’ Min got: ‘Rêyek heye ku gelek biçûk e, rêyek jî heye ku gelek mezin e. Eger ku tu rêya biçûk dipirsî, ew terikandina gunehan, terikandina dinyayê û terikandina daxwazîyan e. Eger ku tu rêya mezin dipirsî ew jî ji xeyrê Xweda terikandina her tiştî ye û ji qelbî derxistina her tiştî ye.” (Attâr, 2012: 157)

Bayezîdê Bîstamî (Attâr, 2012: 194) di derbarê rêya zuhd û teqwayê de wiha gotîye: “Abidê rast û xwedî emelên durust ew e ku bi şûra xîretê serê hemû daxwazîyên xwe dibire. Hemû daxwazî û hewesên wî di evîna Heq de tune dibê. Bi tenê ji tiştên ku Heqî îrade kirine hez dike û tiştên ku Heq jê re şahid bûye dixwaze.”

Mutesewifê navdar Haris El Muhasibî jî (Attâr, 2012: 263) merîfet wekî rêya gihîştina cem Xweda nîşan daye û wiha gotîye: “Encama ilmî tîrsa Xweda ye, encama zuhdê rihetî ye, encama merîfetê jî gihîştina cem Xweda ye.” Cuneydê Bexdadî jî (Attâr, 2012: 414) di vê mijarê de wiha gotîye: “Rêya ku diçe cem Xweda çawa ye? Dinyayê biterikîne tu seadetê dê bibînî, li pê hewesa xwe neçe tu dê bigihîjî Heq.” Ebû Ebdullah Muhemed Bîn Xefif jî (Attâr, 2012: 521) li ser tesewufê wiha gotîye: “Tesewuf ew tişt e ku dema qedê hukma xwe anî cih divê ku meriv sebir bike, her wiha meriv bi destê Melîkê xwedî celal bigire, ji çîya û deştan bibore.” Şêx Ebû Bekir Şiblî jî (Attâr, 2012: 566) li ser tesewufê wiha gotîye: “Tesewuf zeptkirina ‘uzvan, û kontrolkirina nefesan e. Tesewuf mesûmîyeta ji dîtina hebûnê ye. Tesewuf çik e ku dişewitîne. Tesewuf li hizûra Xweda rûniştina bê xem e.” Merûfê Kerhî (Kuşeyrî, 2014: 368) li ser tesewufê wiha gotîye: “Tesewuf wergirtina sir û heqîqetan e û ehlê tesewufê ji tiştên di destê xelqê de hevîya xwe dibirin.” Ebû Elî Rûzbarî (Kuşeyrî, 2014: 369), “Tesewuf ew tişt e ku dema meşûq meriv biqestîne jî, divê ku meriv li ber dergahê wî çok dayne û dev ji dergahê wî bernede.” Ebû Yeqûb Muzabîlî (Kuşeyrî, 2014: 371), “Tesewuf halek e ku di nava wî halî de elamet û emareyên beşerî winda dibin.” Muhemed Bîn Elî Qessab (Ebû Nasr Serrâc Tûsî, 2012: 23), “Tesewuf, exlaqê

baş e ku ji merivekî hêja û bi cemeeteke hêja re di demek qenc de zûhûr dike.” Rûweym Bîn Ehmed (Ebû Nasr Serrâc Tûsî, 2012: 24), “Tesewuf ew tişt e ku meriv nefsa xwe teslîmê îradeya Xweda bike.”

Ebu Hesên Muhemed Bîn Ehmedê Farisî wiha gotîye:

“Deh esasên tesewufê hene. Tewhîdeke mucered, fêmkirina sema’ê, bi mirovan re muameleya xweş, çêtirdîtina îsarê (bêxemi), terikandina îxtiyarê (îradeya hilbijartinê), wecdeke lezgîn, kifşekirina hîsên di dilî de, seferkirina zêde, dev ji karê qezençkirinê berdan, heramdîtina komkirina malê.” (Kelabazi, 2013: 136)

Ebû ‘Emrê Dimişqî (Hücvirî, 2014: 101), “Tesewuf ew e ku meriv alemê bi çavekî kêr bibîne. Heta ew e ku meriv ji bo alemê çavê xwe bigire.” Husrî (Hücvirî, 2014: 101), “Tesewuf ew e ku dil, ji keder û qirêjahîya muxalefetê xelas dibe û digihîje aramî û paqijîyê.”

Mijara tēkilîya navbera tesewuf û bawerîyên dinê mijareke pir berfireh e û bi rastî jî di derbarê vê meseleyê de hê jî munaqêşe berdewam in. Em dixwazin ku bi awayekî kurt behsa vê mijarê jî bikin û derbazê nêrînên Feqîyê Teyran yê derbarê tesewufê de bibin. Di vekolînan nûjen de muqayeseyên cidî di navbera tesewuf û ruhbantîya xristîyanîyê de hatine kirin. Alîyên zuhdê yê xristîyanîyê û zuhda tesewufê ji bo gelek vekolîneran bûye mijar. Ji xeynî vê tēkilîya navbera felsefeya Rojavayê, xusûsen jî tēkilîya felsefeya Yûnanî û felsefeya Tesewufê mijareke felsefî û tarîxî ye ku bala vekolîneran kişandîye. Lê ji ber ku ev muqayese zêdetir di çarçoveya felsefîk de pêk hatîye ev li derveyê vekolîna me tê hesibandin. Dîsa li gorî hin vekolîneran çavkanîya tesewufê ji alîyekî ve jî digihîje çanda Budîzmê. Her wiha tê îdia kirin ku li navenda Xorasana berê yanê li Belxê, perestgehên Budîzmê pir belav bûne û piştê ku sûffî li wê derê belav bûye, bawerîya Budîzmê di warê adet û prensîpan de gelek tesîr li ehlê tesewufê kirîye. Şibandina tesewufê zêdetir bi Budîzmê re hatîye kirin û vekolînerên ku di navbera tesewuf û Budîzmê de hin heman şibandine hev di encamê de bi xwe li xwe mikur hatine ku di navbera tesewuf û Budîzmê de dijberîyeke cidî jî heye ku ew dijberî ev e: Di Budîzmê de meriv, bi xwe nefsa xwe tezkîye (terbîye) dike û xwe digihîjîne meqamên menewî lê belê di tesewufê de meriv, ancax bi zanîna (merîfet) Xweda û bi hezkirina (eşq) Xweda tezkîye dibe û dikare bigihîje meqaman (Nicholson, 2004: 17). Bi sedan sal di pêşîya

vekolînerên nûjen de serwerê arifan Ceferê Sadiq, di derbarê vê mijarê de bingeha meseleyê bi gotineke pir kurt danîye hole. Ceferê Sadiq di derbarê mijarê de dibêje ku: “Kî bi nefsê re, ji bo nefsê mucahede bike ew digihîje kerametê. Lê belê kî bi nefsê re, ji bo Xweda mucahede bike ew jî digihîje Xweda.” (Attâr, 2012: 55) her wiha ew, bi rastî ferqa navbera tesewufê û hemû cure perwerdeyên menewî yên din bi awayekî zelal eşkere dike. Di tesewufê de armanc ne tezkîyekirina nefsê ye, tezkîyekirina nefsê ji bo gihîştina Xweda bi tenê merhaleyek e, di tesewufê de armanc gihîştina Xweda ye û sûfî, her çi dike û her çi tiştên ku nake bi tenê ji bo Xweda ye.

Piştê îzaha mijara tesewufê êdî divê ku em li ser nêrîna Feqî bisekinin ku gelo Feqî meseleya tesewufê çawa dibîne û îzah dike? Feqîyê Teyran di edebîyata kurdî de helbestvanekî navdar e. Wî di helbestên xwe de behsa çîrok û qîseyan kirîye lê ne bi tenê ew çîrok bi usûl û uslûba xwe neqil kirine, bi heman awayî di nav wan çîrokan de behsa halê xwe, rê û rêzika xwe jî kirine. Feqîyê Teyran digel çîrokan di gelek helbestên xwe de li ser rêya tesewufê îşaretên muhim pêşkêş kirine. Her wiha em dikarin bibêjin ku ew bi rêya helbest û çîrokan ve behsa mijar û meseleyên tesewufî dike.

Muksî ji işqê sohtîye

Ev qewl li Şêx nû gotîye

Halê xwo tê da gotîye

Li “Xeyn û Lam”a hicretê (Feqîyê Teyran, Şêx Sen‘an, b. 363 r. 336)

Pêşî em li gorî hesaba ebcêdê dizanin ku rêza “Li “Xeyn û Lam”a hicretê” sala 1030ê Hicrî nîşan dide. Ji xeynê vê li gor Feqî, tesewuf ne bi tenê meşxûlîyeteke di warê teorî û felsefeyê de ye, ew rê û rêbazeke pratîk e ku jîyana meriv ji çar alîyan ve bi usûl û esasên xwe dipêçe. Feqîyê teyran Tesewufê bi taybetî ji ser “hal” û “eşq”ê ve terîf dike û li gor wî tesewuf ilmê hal e. Di hişê Feqîyê Teyran de tesewuf digel bawerî û eşqê bi emel û îbadetan ve jî xwedî têkilîyeke xurt e. Feqî di terîf û şîroveyên xwe yên di derbarê tesewuf û hemû mefhûmên tesewufî de kurmancîyeke hêsan lê belê zimanê teyran bikaranîye. Helbestên wî bi kurmancîyeke zelal û hêsan hatine honandin lê belê digel vê hêsanîyê ev helbest di warê meneyê de gelek kûr û dijwar in. Çawa ku me berê jî dîyar kiribû dibe ku ji bo vê rewşê navê wî bûye Feqîyê Teyran. Lewra di warê kurmancîyê de zimanê wî her çi qas hêsan bixuyê jî di warê remz û sir

û şifreyan de ew mîna zimanê teyran e û tespîtkirina meneyên helbestên wî gelek dijwar in.

Subhan ji şahê zulcelal

Fikrê me neqşê bê zewal

Hal bê mecaz naête bal

Kamil dibî b'ulfiyyetê (Feqîyê Teyran, Şêx Sen'an, b. 2, r. 239)

Li gorî Feqî halê tesewuffî bê mecaz û bê remz nayê dîyar kirin. Lewra ew hal taybet e û hişê her kesî ji bo fêmkirina wê ne amade ye. Ji bo vê zimanê teyran tê bikaranîn da ku kesên ne ehlê hal bin ji wan siran dûr bimînin. Lewra ev sir divê ku ji destê kesên ne ehl in jî bêne parastin. Her wiha li gorî wî tesewuf rêya kamilbûna însan e. Bi wesîleya tesewufê nêzîkbûn û xwespêrtina Xweda û bi ulfeta Şahê Zulcelal ve însan dikare xwe ji xavbûnê bigihîjîne kamilîyetê. Ji xeynî vê Feqîyê Teyran di derbarê ilmê tesewufê de dîyar dike ku bi tenê kesên di pratîkê de li ser usûlên vî ilmî biçin dikarin ji vî ilmî fêm û îstifade bikin. Kesên ku rêwîyê vê rêyê nebin meqam û lezetên wê jî nizanin.

Ya reb ûmîda min ji te ye

Cama bi dest bade ye

Çi b'kim meya sersale ye

Herçî vexwar wî zanîye (Feqîyê Teyran, Ah Ji Destê Cama Wîsalê, b. 8, r. 488)

Ji helbestê tê fêm kirin ku her kes nikare remz û îşaretên helbestên sûfîyan fêm bike. Bi tenê kesên ku ji meya evîne vexwarine bi wî halî dizanin. Feqî jî di helbestên xwe de behsa halên xwe û meqamên xwe kirine. Carinan şîret kirine carinan terîf kirine. Lê ji bo ku wî di hal û meqamên cuda de helbestên xwe nivîsîne di warê şewq û heyecanê de helbestên wî gelek rengîn in. Carinan bi dilekî aram û ji riza rebbê xwe emîn, carinan bi eş û birîna firqetê, carinan bi eşq û şewqa wusletê û carinan bi heyreta tecellayê helbestên xwe honandine.

Eşqa mecaz peyda bûye

Îro li min dijwar bûye

Hîvî dikim heqîqî ye

Wêran ez im malim xirab (Feqîyê Teyran, Dilber, b. 16, r. 161)

Di ilmê tesewufê de mijara eşq û mehebetê ji mijarên herî muhim in. Nêrînên şairên sûfî yên di derbarê eşqê de, bi heman awayî di derbarê terîfa tesewufê de jî agahîyên mezin didin. Her çî qas ji alîyê hin vekolîneran ve bê îdia kirin ku bi Feqîyê Teyran re yan jî bi Melayê Cizîrî re eşqa jineke hebûye yan ev hemû helbest li ser jineke hatine nivîsîn jî li gorî me ev tespîteke xelet e. Em ji sedî sed nikarin bibêjin ku Mela yan jî Feqî qet aşiqê jinan nebûne. Lewra dibe ku her du jî yan yek ji wan ji ser eşqa mecazî yanê eşqa xanimek ve eşqa heqîqî peyda kiribin. Lê em vî tiştî baş dizanin ku her du şairên mutesewif jî wekî hemû şairên mutesewif ên cîhanê bi heman usûlê helbestên xwe nivîsîne û mefhûmên helbestên wan di edebîyata erebî, farisî û tirkî de bêne çî meneyê di kurdî de jî kêr zêde tene heman meneyê. Her wiha em dizanin ku qesta wan ji eşqa heqîqî, eşqa Xweda ye. Ji xwe Feqî di gelek cihan de bi awayekî eşkere dîyar dike ku eşqa wî her eşqa Xweda ye lê dîsa jî ji ber teşbîhên şairên mutesewif, xwendevan carinan dikevin nav xeletîyê û zen dikin ku ev êş û elem û şewqa van şairan ji bo eşqa jinan e. Divê ku teqez bê zanîn qesta Feqî ji dilberê ne xanimek e û ji wîsalê jî gihîştina cem xanimek qest nake. Her wiha di vir de jî meriv nikare bibêje ku ev helbest eşqa xanimek îşaret dike, lewra li vir ji eşqa mecazî jî qesta Feqî bi me, ne eşqa mirovan e. Lewra ew dibêje “Hivî dikim heqîqî ye” ji vê gotinê jî tê fêhm kirin ku eşqa wî dîsa eşqa Xweda ye, lê belê ji bo tewazûyê xwe di astên eşqê de di asta herî jêr de yanê di asta eşqa mecazî de dibîne û daxwazîya eşqa heqîqî dike. Di beşa mefhûmên tesewufî de di binê serenavê mefhûma eşqê de jî dê were dîyar kirin ku Feqî ji eşqa mecazî hewesê qest dike. Yanê li gor wî eşqa mecazî hewes e û bihorbar e. Eşqa heqîqî ne mîna hewesê ye ew jî mîna meşûqê xwe baqî ye.

Her wiha tê fêhm kirin ku wî, mîna Yûnis Emre di merhaleyên cuda yên silûkê de helbest nivîsîne. Di nav sûfîyên helbestvan de hinek hene ku heta merhaleyên silûka xwe neqedandine dest bi nivîsîna helbestan nekirine. Ev şairên ku piştê qedandina silûka xwe dest bi nivîsîna helbestan kirine ji meqameke sabit ve helbestên xwe dihonin û her tim bi rengê bi usûlek bang dikin. Lê belê şairên mîna Feqî ku di hal û meqamên cuda de helbest nivîsîne bi reng û hestên cuda ve bang dikin. Ew di her helbestê de bi rengê cuda bi halekî cuda fîzar dikin û bi vî awayî carinan hişê xwendevanan jî tevlîhev dikin. Ji ber vê kesên ku hal û meqamên cuda yên tesewufê nezanin di fêmkirina helbestên Feqî de gelek tengasîyê dê bikişînin.

Digel fikrên Feqîyê Teyran yên di derbarê terîfa tesewufê de li ser du mijaran jî di berhemên wî de nîşaneyên girîng hene ku em ê wan jî li vir îzah bikin. Ya ewil gotinên şethê ne ku ev gotin di zahirê de li dijî şerîeta îslamê ne. Sûfî di dema halê cezbeyê de yanê dema ku bi teceliya Xweda hatine zewqê hin gotinan dibêjin ku ew gotin li gorî şerîetê xelet têne hesabandin. Mînakê şethê di bendeke Feqî de bala me kişand.

Serxweşê ava heyatê

Meclîsa reqs û sema tê

Dê çikim b'sewm û selatê

Bi kûze û fîncan im ez

Li vê derê Feqî bi rêza “Dê çikim b'sewm û selatê” ve gotineke li dijî şerîetê bilêv dike ku di edebîyata tesewufê de mînakên ji vê zêdetir gelek in. Lê belê xaleke muhim heye ku divê em wê jî dîyar bikin. Feqî piştê vê şethê di berdewama helbestê de her wekî ku me'zereta xwe tîne ziman û wiha dibêje.

Ew meyê gerden dirêjan

Şîşe û wan baderêjan

Min nema hiş li nivêjan

Li deftera dînan im ez

“Mîm û Hê” aqil ve der da

Sicleya işqê û derda

Lew qelem anî bi ser da

Me'fûyê xufran im ez (Feqîyê Teyran, Îro Ji Dest Husna Hebîb, b. 31, 32, 33, r. 136)

Feqî dîyar dike ku ji ber şewqa eşqê aqil avêtîye û ketîye deftera dînan. Her wiha dixwaze bide fêhm kirin ku ev gotina wî wekî gotina dînan e û divê ku ji ser vê gotinê ve berpirsyarîyek neyê dayîn. Lewra dînekî ku ji ber eşqê nezane çî hatîye ser zimanê wî divê ku ji ber gotinên xwe neyê mehkûm kirin. Di dawîyê de jî bi rêza

“Me’fûyê xufiran im ez” ve ji ber şetha xwe ji Xweda efûyê daxwazî dike û di heman helbestê de tobe dike.

Mijara duyemîn a ku di meseleya tesewufê de serê gelek kesan êşandîye û li ser gelek munaqêşe jî hatine kirin mijara wehdetê wicûdêye. Li gorî mutesewifan bingeha wehdetê wicûdê ji xeyrê Xweda înkarkirina hemû hebûnan e. Sûfiyên ku wehdetê wicûdê diparêzin dîyar dikin ku hebûna heqîqî her Xweda ye û ji xeyrê hebûna wî îdiakirina hebûneke din xelet e. Yanê ji xeyrê hebûna wî tunebûn tune ne. Her wiha dibêjin ku hemû mexlûqên Xweda wekî sîyê ne. Bi xwe xwedîyê hebûnê nînin bi tenê sîya hebûna heqîqî ne (Türer, 2013: 234; Kılıç, 2014: 29). Di fikra wehdetê wicûdê de hebûnên ji xeyrê Xweda wekî tecelîyên nav û sifetên wî tene hesabandin (Demirci, 2009: 118). Di nava berhemên Feqî de, di sê cihan de îşaretên wehdetê wicûdê hene. Her çî qas mijara wehdetê wicûdê mijareke niqaşbar be û di vê mijarê de gotin û tespîten teqez diwar be jî li gorî tespîta me ev nîşaneyên berhemên Feqîyê Teyran ji bo kifşekirina fikrên wî bes in.

‘Aşiq tu yî dilber tu yî

Nazir tu yî menzer tu yî

Ruh û beden gewher tu yî

Misbah û nûra qîmetê (Feqîyê Teyran, Şêx Sen‘an, b. 10,r. 241)

Işq û mehebbet ismek in

Aşiq û me’şûq cismek in

Herdu di hev da qismek in

Şêxek di vê me’nê de tê (b.n. b. 244,r.305)

Heyat li bal min wesl e

Du lat ger bibin latek

Murad bi xwe her esl e

Têk da bibin sifatek

Ji hev êk nîn e fesl e

Wahit bimînit zatek (Feqîyê Teyran, Feqe û Melê, b. 35, r. 193)

Di rêza “‘Aşiq tu yî dilber tu yî” û dîsa di rêza “‘Aşiq û me’şûq cismek in”de Feqî aşiq û meşûqê yek dihesibîne. Heta vê yekbûnê jî, ji ser her du mefhûmên eşq û muhebetê ve teşbîh dike ku gelek mutesewifên berê di cihê mefhûma eşqê de mefhûma muhebetê bikaranîne ku di warê meneyê de di gelek çavkanîyan de ev her du mefhûm yek tene hesabandin. Di her rêzên van her du bendên ewil de Feqî, fikra xwe ya wehdetê wicûdê dîyar kirîye û ji van bendan em fêm dikin ku Feqîyê Teyran jî, yek ji wan mutesewifan e ku wehdetê wicûd parastine. Feqî di benda dawî de jî dîyar dike ku ji bo aşiqan meqsed wîsal e û bi wîsalê ve dudutî ji holê radibe, her wiha eşq, meriv dibê merhaleya yekîtiyê ku mutesewif ji wê merhaleyê re dibêjin wehdetê wicûd.

Wekî hemû qadên zanistên civakî di qada edebîyatê de jî têkilîya tesîrê di navbera şair û berhemana de heye. Çawa ku di helbestên Melayê Cizîrî de behsa Hafîzê Şîrazî tê kirin û ji berhemên wî tê fêm kirin ku di binê tesîra Hafîz de maye (Doru, 2012:25) bi heman awayî em dizanin ku Feqîyê Teyran jî di gelek meseleyên tesewufî de di binê tesîra Şêx Ferîdudîn Etar de maye û di berhemên xwe de behsa Etar kirîye.

Şêxê me ku Şêx Etar e

Ew nazika wî îxtiyar e

Me’bûd ji dêrê bû hinar e

Rê girtiye li pey me tê (Feqîyê Teyran, Şêx Sen’an, b. 350, r. 333)

Mutesewifê navdar Ferîdudîn Etar, di berhema xwe ya Mentîqût Teyrê de behsa teyran (ruh û nefsan), zimanê teyran û di encamê de jî behsa wehdetê wicûdê dike. Feqîyê ku di meseleyên tesewufî de ev qas di binê tesîra Etar de maye ne mumkun e ku di warê wehdetê wicûdê de ji fikrên Etar re bê eleqe bimîne. Ji ber ku me di helbestên Feqî de tu îşareteke li dijî fikra wehdetê wicûdê peyda nekir em di vê mijarê de dikarin bibêjin ku Feqî, teqez fikra wehdetê wicûdê qebûl kirîye.

2. 2. DI BERHEMÊN FEQÎYÊ TEYRAN DE HÊMANÊN TESEWUFÎ

Feqîyê Teyran ji bo ku şairekî mutesewif e berhemên wî jî bi giştî rengê tesewufê didin û ji alîyê mefhûmên tesewufî ve jî gelek dewlemend in. Di vê beşa xebata me de 33 mefhûmên tesewufî yên ku di berhemên Feqîyê Teyran de hatine bikaranîn dê di binê serenavan de bi mînakên ji helbestên Feqî ve bêne îzah kirin. Mefhûmên tesewufî ji serî heta dawîyê bi hev re têkildar in. Têkilîya van mefhûman di tesewufê de mîna zincîrê ye yanê li gorî rêzekî ev mefhûm bi hev ve ne. Lê belê helbestvanên sûfî dema ku van mefhûman terîf dikin gelek car jî ser têkilîya zincîrî ve naçin. Ew carinan du mefhûmên ku di rêza zincîrî de jî hev dûr in tînin heman cihê û jî ser wan her du mefhûman ve mefhûmeke din terîf dikin. Ji ber vê dema ku em jî ser helbestên Feqîyê Teyran ve mefhûmeke îzah bikin, di binê serenavê wê mefhûmê de dibe ku behsa gelek mefhûmên din jî bê kirin û qismen ew mefhûm jî di wê derê de bêne terîf kirin.

2. 2. 1. Eşq

Wekî gelek şairên sûfî di helbestên Feqîyê Teyran de jî mefhûma eşqê xwedî cihekî taybet e. Di nav mefhûmên tesewufî de “eşq” bê guman a herî girîng e. Lewra li gor sûfîyan bingeha xuliqandinê û hebûnê jî ser eşqê ve pêk hatîye. Sûfî vê bawerîya xwe jî gotina: “Ez xezîneyek veşartî bûm; min xwast ku werim naskirin û min mexlûq xuliqandin.” (Eclûnî, 1997: 121) digirin. Di gelek kitêbên sûfîyan de ev gotin wekî hedîsê derbaz dibe û wekî çavkanî jî kitêba “Keşfûl Xefa” ya Eclûnî nîşan didin. Lê belê li vir du xalên girîng hene ku divê werin gotin. Xala ewil, Eclûnî di kitêba xwe de vê gotinê dide û di beşa tehlîlê de dîyar dike ku ev gotin di warê senedê de ne sehîh e ne jî zeîf e lewra seneda vê gotinê tune ye û ev gotin ne hedîs e. Lê mixabin di gelek kitêbên ku di vê dewrê de tene çap kirin de jî ev gotin wekî hedîs tê dayîn û ev jî nîşan dide ku kesên vê gotinê wekî hedîs didin qet hay ji çavkanîya wê nînin. Xala din jî ev e ku di kitêba Eclûnî de tê dîyar kirin ku ev gotin her çî qas hedîs nebe jî di warê meneyê de durust e û bi ayeta 56an a sûreta Zariyatê re jî muwafiq e. Di vê ayetê de Xweda dibêje ku: “Min, cin û însan bes ji bo ku îbadetê min bikin afirandine.” Her wiha jî bo ku îbadet bê naskirin nabe û divê ku Xweda pêşî bê zanîn û naskirin, gotina ku di Eclûnî de derbaz dibe jî wekî gotineke mûteber tê qebûl kirin.

Piştê ku sûfîyan, Xweda wekî xezîneyeke veşartî şîrove kirin vêca wekî mexlûq jî di rêza pêşî de behsa “heqîqeta Muhemedî” kirin. Ku li gorî şîroveya sûfîyan Xweda, ji bo vê xwastina xwe pêşî “heqîqeta Muhemedî” xuliqandîye da ku vê wezîfeya keşfê pêk bîne (Kılıç, 2014: 55). Sûfî ji vê daxwaziya Xweda yanê fiila xwastinê ku wekî “ehbebtû” derbaz dibe û tê meneya hezkirinê jî, wekî eşq û muhebetê şîrove dikin û kokê eşqê, heta bingeha xuliqandinê dibin. Feqîyê Teyran jî rêça mutesewifan domandîye û ji bo ku ehemîyeteke mezin daye mijara eşqê herî zêde jî li ser vê mefhûmê sekinîye.

Dema ku meriv li ser peyva eşqê bisekine xaleke girîng bala meriv dikişîne ku ev peyv ji peyva “işq”a erebî tê ku meneya wê jî dargerîng (tûre) e. Dargerîng çawa ku li çî cihê şîn be wê derê dipêçe, eşq jî di qelbê çî kesî de şîn bibe wî qelbî bi tevahî dipêçe (Kılıç, 2014: 39). Eşq li gorî terîfa herî giştî di evîne de qada herî jor û bilind e. Evîna ku li ser ruhê însan hakimîyeta xwe pêk anîye (Uludag, 2012: 48). Hîsê ku mîna avê di her zereya qalibê tijî kirîye. Coşa ku mîna bayê biharê har e û aşîqan har û dîn dike. Gotineke meşhûr a Cuneydê Bexdadî heye ku pê, sirê eşqê dîyar dike. Ew dibêje, “Eger ku siltanan halê em tê de ne bizanîna, ji bo ku wî halî ji destê me bistînin muheqeq dê bi me re şer bikirana.” Dema ku ji Cuneydê Bexdadî eşqê dipirsin ew dîsa vê bersivê dide “Eşq ew tişt e ku aşîq sifetên xwe diterikîne û sifetên meşûqê xwe werdigire.” Gelek sûfîyan, eşq li gorî hal û hîs û coşa xwe terîf kirine û hin sûfî jî “terîfê” ji bo eşqê wekî sînardarkirinek qebûl kirine û eşqê wekî mefhûmeke bê sînor û bê terîf qebûl kirine (Kuşeyrî, 2014: 407). Lê di encama hemû terîf û nasandinan de tê fêm kirin ku her kes wekî halê xwe dikare eşqê bijî û jê fêm bike. Di dawîya vê mijarê de meriv dikare bibêje ku eşq, bi hal tê fêm kirin, bi xwendin û ilmî ne mumkun e ku mahîyeta wê bi tevahî were fêm kirin.

“Hê”yên di heft hamîman

Nuqtayan lê peyda kin

Bavêne cem du cîman

Işqê jê huweyda kin

Ismên di du “Tasîman”

Du mîman jê cuda kin (Feqîyê Teyran, Feqe û Melê, b. 7, r. 169)

Bi vê dîyaloga ku bi rêya beytan ve di navbera Feqî û Mela de derbaz bûye ve em dibînin ku Feqî bi remzan ve behsa eşqê dike. Feqî dibêje ku, noqte li ser “h” û “m” yê zêde bikin ku bibin “x” û “m”. Paşî dibêje ji “ta”, “s”, “m”yê ji mîman cuda bikin ku wê çaxê ew ê bibin “tas” û di dawîyê de du peyv derdikevine holê. Peyva ewil “xumxum”a farisî ye ku di meneya kûpa şerabê de tê bikaranîn, peyva duyem jî “tas” e ku di zimanê erebî de amûra vexwarinê ye. Feqî paşî jî wan datîne cem du “cîm”an ku ew jî wekî biskên meşûqê têne bikaranîn û tê zanîn ku bisk dev û lêvê nîşan didin. Her wiha Feqî tîne ziman ku bi vî awayî yanê bi civandina van her sê hêmanan ve “eşq” derdikeve holê (Doskî, 2012, 59).

Lew bûm herîf lew bûm nedîm

Min îşqeka dijwar heye

Kovî kirim serfa ‘ezîm

Min hêj meya pêrar heye

Minet ji Rehmanê Rehîm

Min mîrekî setar heye (Feqîyê Teyran, Ellah Çi Zatek Ehsen e, b. 5, r. 104)

Feqî li vir pêşî taybetîya eşqa xwe terîf dike. Li gorî terîfa wî ew xwedîyê eşqeke pir dijwar e ku ji ber dijwarîya wê eşqê ew kovî bûye. Ji ber jana eşqa xwe her ji Xwedayê Rehman û Rehîm minetê dike û xwe disipêre Xwedayê Settar.

Îro ji eşqa sorgulê

Halê min wekê perwenetê

Derket ji birca sunbulê

Kuştim bi tîra muhebetê (Feqîyê Teyran, Îro Ji Eşqa Sorgulê, b. 1, r. 469)

Eşqa Xweda halek e ku di dilê evdên Xweda de şîn dibe. Ev halekî wisa ye ku aşiq bê meşûq, bê sebr û sebat dibe. Ji bo daxwazîya nêzîkbûna wî bê sekn û bê qerar dibe. Bê eşqa xwe bê kes û wêran dibe. Feqî jî di nav heman hîsên aşiqan de dîyar dike ku bûye wekî perwaneyê û bi muhebet li derdora eşqa Xweda digere.

Îro ji dest husna hebîb

Sergeşte û heyran im ez

Min eşq û muhbet bûn nesîb

Sewdayê sergerdan im ez

Eşqê gelek sewda kirim

Bê mal û bê mewda kirim

Nûra çira winda kirim

Mûsayê ‘Umran im ez

Mûsa ji dest husna bi nûr

Şîrîniya xalên di hûr

Secde bire ber kohê Tûr

Nêzîkî remzê wan im ez (Feqîyê Teyran, Îro ji Dest Husna Hebîb, b. 1, 2, 3, r. 127)

Feqîyê Teyran terîfa halê xwe bi peyvên “heyranî”, “şergeşte” û “sergerdanê” dike ku her du peyvên dawî di zimanê farisî de meneya “gêjbûnê” didin. Yanê Feqî dîyar dike ku di rêwîtiyê de ev merhale wekî şerabê meriv sergêj û serxweş dike. Paşî Feqî dîyar dike ku di silûka wî de ev merhale ji aliyê Xweda ve jê re hatîye nesîb kirin û bi gihîştina vê merhaleyê ve qîmeta dinê û milkên dinê li ber çavê wî xelas bûne. Di van rêzên Feqî de xaleke din ku pir muhim e jî hunera teşbîhê ye ku Feqî vê hunerê bikartîne û eşqa xwe dişibîne eşq û rewşa Hz. Mûsa. Bê guman ji bo rewşa Feqî û merhaleya eşqa wî baş bê fêhm kirin divê ku qîseyê Hz. Mûsa ya li çîyayê Tûr jî bê zanîn. Pêxemberê Xweda Hz. Mûsa dema ku diçe ber çîyayê Tûrî li wê derê di navbera Hz. Mûsa û Xweda de têkilîyeke mucîzewî pêk tê. Xweda bi Hz. Mûsa re diaxive û hin mucîzeyan nîşanê wî dide. Di Qur’ana pîroz de ayeta 30. a sûreta Qesêsê behsa destpêka qîseyê dike, “Dema hat cem êgir, ji aliyê rastê yê newalê, li wî cihê pîroz ji darê hate gazî kirin: Ey Mûsa! Bê guman ez Xweda me ; perwerdigarê tevekî alemê me.” Dîsa di ayetên sûreta Taha 11-14an de qîse, zêdetir tê eşkere kirin: “Gava Mûsa gihîşt cem êgir, lê hate gazî kirin: Ey Mûsa! Ez im, ez Xwedayê te me! Vêca sola xwe ji lingê xwe bike. Lewra tu li newala pîroz li Tuwayê yî! Min tu (bi

pêxemberî) bijart, nexwe li peyama ku ji te re tê guhdarî bike. Bê guman ez Xwedê me. Ji min pê ve tu îlah tun in. Nexwe tenê îbadetê min bike û ji bo bîranîna min nimêj bike.” Feqî bi rêza “Nêzîkî remzê wan im ez” ve dîyar dike ku ew jî mîna Hz. Mûsa tecelîya rebbê xwe di qelbê xwe de ditîye û alîkarîya wî wergirtiye. Di vê qiseyê de tê fêm kirin ku Hz. Mûsa bi bihîstina axaftina Xweda û bi tecelîya wî ve dikeve halekî pir dijwar. Feqîyê Teyran jî bi coşa rindahîya Xweda, halê xwe yê eşqê û dijwarîya wî halî bi halê Hz. Mûsa re teşbîh dike. Di berdewamîya helbestê de Feqî dîsa behsa remzan û halê xwe dike.

Remzê ku dê dilber bikin

Carek bi çeşman seyr bikin

Dê kohê Qaf kerker bikin

Mecrûhê pir kovan im ez

Ah ji dest kovan û qehran

Min sebir nayêt li sehran

Şubhetê mewcên di behran

Qulzemê ‘Umman im ez

Qulzem û behrên di heftê

Agirê eşqê ku keftê

Dê sojit şubhetê neftê

Min dîye û pê zanim ez (b.n. b. 4, 5, 6, r. 128)

Feqî di helbestên xwe de gelek car xwe bi wesfê “mecrûh” yanê bi birîndariyê diwesifîne. Ew ji ber remzê dilber yanê ji ber perdeyên li ber tecelîya îlahî birîndar e. Feqî agirên eşqê û şewata wê dişibîne şewata neftê û îşareta zanîna ehlê hal dike. Lewra ev rewş û hal, halê ehlê qal nîne. Bi tenê kesên ehlê hal bi vî halî dizanin ku Feqî jî xala dawî wiha datîne: “Min dîye û pê zanim ez”. Kesên ku ehlê hal nebin

şewata eşqê û van remzan bi kûrahîya meneya wan ne mumkun e ku fêm bikin. Paşî Feqî tesîr û encamên eşqê ji me re terîf dike.

Her kesê işq tê eser kit
Sed hizar perdan di ber kit
Hemûwan dê ker bi ker kit
Tazîyê ‘uryan im ez

Perde çû ez mame tazî
Dil sera mehbûb dixwazî
Min îbadet işq û bazî
Bê mey û meyxan im ez (b.n. b. 28, 29, r. 135)

Feqîyê Teyran bi rêza “Her kesê işq tê eser kit” ve terîfa tesîra eşqê û aşiqan dike. Ew eşqa îlahî ku bi çî kesî re xuya bibe ew kes di nav perdeyan de asê dimîne. Bi rastî li gor tesewufê her kes di nav perdeyan de asê maye lê bi tenê kesên ku xîret kirine û eşqa Xweda daxwazî kirine bi lutfê Xweda dikarin ji wan perdeyan xebardar bin. Piştê ku aşiq ji perdeyên navbera xwe û Xweda xebardar bû bi cehda xwe û alîkarîya Xweda dikare perdeyan yek bi yek hilîne. Di dawîya bendê de Feqî bi xwe îfade dike ku ew ji perdeyan borîye, perdeyên ku di navbera wî û Xweda de hebûn yek bi yek çirandîye. Ev rewş, yanê tunekirina perdeyên (astengî) di navbera ‘evd û Xweda de di zimanê tesewufê de bi tazîbûnê tê îfade kirin. Li gorî sûfîyan însan bi awayekî tazî hatîye vê dinê û bi awayekî tazî dê ji vê dinê here (Uludag, 2012: 364). Feqî jî dîyar dike ku di dinê de ancax eşq dikare meriv ji astengî û girêyên dinyewî bifilitîne û wekî zarokek nûzayî yan jî wekî mirîyekî ji mal û hewesên dinyayê bi tevahî azad bike. Digel van di rêza “Tazîyê ‘uryan im ez” de ihtimaleke mezin telmîh heye û Baba Tahîrê Uryan tê îşaret kirin ku Baba Tahir di edebîyata kurdî (lorî) de yek ji pêşengên herî muhim e.

2. 2. 1. 1. Eşqa Mecazî û Eşqa Heqîqî

Di gelek helbestên Feqîyê Teyran de cudatîya eşqa mecazî û heqîqî tê destnîşan kirin.

Feqî go bilbil taze

Tu bilbilek sewda yî

‘Işqa gulê mecaz e

Tu yarek bê wefa yî

Dostê ebed bixwaze

Da lê nebit fenayî (Feqîyê Teyran, Feqe û Bilbil, b. 12, r. 152)

Di vir de Feqî behsa eşqa rastî û eşqa mecaz dike û cudahîya her duyan diyar dike. Li gor wî dema ku meşûq gul be yanê fanî be eşq mecaz e lê belê dema ku meşûq Xweda be wê çaxê eşq ji baqî û heqîqî dibe. Di vir de ji ser gulê ve meriv dikare bi hemû hebûnên fanî re qîyasê bike ku li gorî Feqî eşqa hemû fanîyan hewes e û bihorbar e. Dîsa li jêrê di dewama vê helbestê de Feqî, şîretan li rêwîyên rêya eşqê dike û ji wan re dibêje, eşqa mecaz biterikînin lewra di wê eşqê de sir tune ye. Li gor wî, ew eşqa mecaz ku tê de esrar tune ye bê tam û lezet e û meriv bi wê eşqê nagihîje tu meqamê.

‘Işqa mecaz tu terk ke

Ew sir û dîn betal bûn

‘Işqa mecaz hilîne

Ev reng dibê betal bit

Tu bes wiha bixwîne

Te her bi zî celat bit

Dostek ebed bibîne

Daîmê bê zewal bit (b.n. b. 13, 14, r. 153)

Dêm şûşe ye nûr qefes e

Mecaz ne işq e hewes e

Dil ji surrê naket bes e

Can ji meya meweddetê

Di vê derê de Feqî xêzeke tund di navbera eşqa mecazî û eşqa heqîqî de datîne. Li gor terîfa wî eşqa mecazî ne eşq e ew bi tenê hewes e. Tê zanîn ku hewes baqî nîne zû dibore û bi vî awayî Feqî diyar dike ku eşqa heqîqî baqî ye lê eşqa mecazî wekî eşq nayê terîf kirin lewra ew hewesek e û bihorbar e.

Işq bê îbadet nabitin

Hetta mehebbet nebitin

Hal û helawet nabitin

Îzhar bikim behsîyyetê (Feqîyê Teyran, Şêx Sen'an, b. 22, r. 244)

Di terîfa eşqê de Feqî, heta niha behsa çend xalan kir. Ew, dîsa di çarçoveya terîfa eşqê de pîvaneke girîng destnîşan dike ku ew jî îbadet e. Li gorî Feqî tesewuf û eşq ne bi tenê hîs û teorî ne. Ew girêdayê Qur'an û sinetê hewcehîyeke heyatî ji bo rêya eşqê terîf dike ku ew hewcehî jî îbadet e. Li gorî Feqî eşq û muhebet bê îbadet nabin. Lewra daxwazîya meşûq îbadet e û heta ku daxwazîya meşûq neyê cih eşq û muhebet çênabe. Aşiq ancax dema ku daxwazîyên meşûq bi cih bîne kêfxweş û xwedî muhebet dibe.

Aşiqê Allah ji mêj im

Her dema wesfê dibêjim

Herdu çehvan xûn dirêjim

Ya Resûlelah meded (Feqîyê Teyran, Hatim Ber Dergahê Rehmet, b. 6, r. 484)

Mubtela qametfena me

Ji yar û dostan cuda me

Aşiqê nûra Xweda me

Kes bi halê min nezan (Feqîyê Teyran, Ez Çi Bêjim, b. 5, r. 416)

Di edebîyata tesewufê de bê guman tê zanîn ku qesta sûfîyan ji eşqa heqîqî eşqa Xweda ye û dema ku ew dibêjin meşûq, bi çî awayî teşbîhê bikin jî di dawîyê de qesta wan dîsa Xweda ye. Feqîyê ku gelek car bi zimanê teyran û bi kûrahîya meneyan ve

hiş û mejî asê dike, li vê derê bi awayekî bê remz û eşkere dîyar dike ku eşqa wî eşqa Xweda ye û ew aşiqê nûra Xweda ye. Lê çawa ku berê jî hatibû gotin eşq, halekî ye û bi tevahî zanîn û fêmkirina wî ancax bi jîyîne pêk tê. Ji ber vê jî Feqî dibêje “Kes bi halê min nezan” bi tenê ye ku jîyaye bi halî dizane. Gotineke Melayê Cizîrî jî di derbarê eşqê de heye ku ev gotin di derbarê tebîeta eşqê de agahîyeke girîng dide û mijarê bi me çêtir dide fêm kirin.

‘Îşq-i teb’etnar e hingî dê biçit dijwar-i bit (Alkiş, 2014: 225)

Ji ber ku eşq di tebîeta xwe de mîna agir e, ew di aşiqî de her çi tiştekî ku meşûq jê razî nîne dişewitîne û dike mîna xwelî. Digel vê çawa ku agir, çi qas amûreke ku dişewite bibîne ew qas gur dibe, bi heman awayî eşq jî di qelbê aşiq de çi tiştekî ji xeyrê meşûqî bibîne ew qas gur û dijwar dibe heta ku dilê aşiqê ji hemû eşqên xeyrê Xweda paqij bike.

2. 2. 2. Aşiq

Aşiq avek e ku carinan aram e carinan har e û rêya wî ji aliyê meşûqê ve tê kifşe kirin. Di helbestên tesewufî de tîpekî girîng e û gelek car tê bikaranîn. Aşiq ew kes e ku ji Xweda Teala bê hed û bê sînor hez dike (Uludag, 2012: 48). Gotineke meşûqî, îşareteke wî, yan jî tecellîya wî, ji bo aşiqan dîyarîya herî mezin û giranbaha ye. Ew ji bo meşûqê bê teredut dikare dev ji hemû hebûna xwe berde, dikare canê xwe bide. Ji bo eşqa xwe sadîq û dirust e ji bo hemû êş û elemên ku di rêya eşqa xwe de dikişîne re xwedî sebr û tehemul e (Pala, 2011:37). Ji bo ku mewzubehs tesewuf e eşqa aşiqan jî bê guman eşqa Xweda ye. Aşiqê ku bi agirê eşqê dişewite, hemû hewesên dinyewî jî bi wî agirî dişewitîne û dinya li ber çavê wî mîna xwelîyê bê qîmet dibe.

Dê aşiqan meylek hebî

Guhdarê me’şûqa xwe bî

Qet hay ji paşrojê nebî

Ji intîzara wesletê (Feqîyê Teyran, Şêx Sen’an, b. 243, r. 305)

Feqî di vir de ji bo mefhûma aşiqê, du karan pêk tîne. Pêşî terîfa mefhûmê dike û di nav terîfê de jî li aşiqan şîret dike. Li gor terîfa wî aşiq ew kes e ku mêldarê meşûqê xwe ye. Di çi hal û zemanê de be mêla wî bi wesîleya eşqê ve her bi meşûqê ve ye. Ew divê ku guhdarê meşûqê be, lewra di tebîeta xwe de ew mêldarê meşûqê ye

û bi tenê guhdarî û îtaeta meşûqê wî tetmîn dike. Aşiq divê ku dev ji paşeroj û pêşeroja xwe berde. Divê zemîn û zeman girê û astengên dinyewî ku dikevîne ber lingên wî pêşîya wî negirin. Van hemû astengîyan piştguh bike û ji bo razîkirina meşûqê xîret bike. Ji meşûqê xwe re îtaetê bike da ku bigihîje meqsedê. Lewra eşq agirekî wisa ye ku bi razîkirina meşûqê pêtên wî ji bo aşiqan dibin lezet. Hêvîya gihîştina Wî, her tiştî bi aşiqê dide jibîr kirin.

2. 2. 3. Yar

Di zimanê farisî de tê meneya meşûq û dostê. Ev nav, Ji bo salikên rêya tesewufê wekî navê herî qenc tê qebûl kirin (Uludağ, 2012: 386). Di berhemên Feqîyê Teyran de peyva “yarê” bi giştî di meneya kesê ku jê tê hez kirin de hatîye bikaranîn. Qesta Feqî bi peyva yarê meşûq e ku ew meşûq jî her Xweda ye. Di helbestên wî de peyva yarê gelek car hatîye bikaranîn û digel meneya xwe ya bingehîn carek jî di meneya aşiqê bê wefa de hatîye bikaranîn.

Bizan ku min yar tu yî

Dil jê birîndar tu yî

Ez kuştim yekcar tu yî

Ê bikom û biçar tu yî

Bişeml û destar tu yî

Pir li min kubar tu yî (Feqîyê Teyran, Bizan Ku Min Yar Tu Yî, b. 1, r. 443)

Feqîyê Teyran di vir de yarê xwe bi çend alîyan ve terîf dike. Li gorî terîfa wî yar, ew kesê ku aşiq bi dil ve jê birîndar e, bi eşqa xwe aşiqan tîne ber halê mirinê, careya her derdî li cem wî ye û xwedîyê her cure xweşî û delalîyan e.

Tûleyê dergehê yar im

Şev û rojan nobedar im

Westayê der întîzar im

Çavriyê siltan im ez (Feqîyê Teyran, Îro Ji Dest Husna Hebîb, b. 19, r. 132)

Feqî, li vê derê, ji bo mezinahîya yarê xwe bide fêm kirin nefsa xwe nizm dike û xwe dişibîne tûleyî. Feqî ku xwe li ber yarê xwe nizm dike bi vî awayî şana yarê xwe

bilind dike. Lewra li gorî terîfa wî yar wisa xwedî şan û şeref e ku aşiq li ber derê dergehê wî xwe dikin mîna tûleyan. Her wiha îfade dike ku ew bi şev û roj bi eşq û şewq li ber dergehê yarê li benda wî ye.

Kesê ku girtî yar e

Bi dil yekê d'hebînî

Êdî nayê qerar e

Dê daîm bixwînî

Xiyal û xem di dar e

Divê kengê bibînî (Feqîyê Teyran, Feqe û Bilbil, b. 4, r. 148)

Feqî dîyar dike ku dema aşiq bi xwe û yara xwe hesîya û bû girtîyê yarek (Xweda) ji dil ve dê wî yarî bihebîne. Evîna yarê heqîqî, ne mecazî ye ew jî mîna yarê heqîqî ye, ji dil e. Piştê ku eşqa îlahî di dilê wî de tecelî kir êdî ew kes dibe wekî bilbilê ku bi evîna gulê ketîye. Çawa ku bilbil ji bo evîna gulê bi şev û roj dixwîne, ew aşiq jî ji bo dîtina tecelîyên Xweda dê bi şev û roj bê sekn û tebat zikra Xweda bike. Eşqa yarê wisa eşqeke dijwar e ku aşiqan bê qerar dike. Ew ne dizanin ku hene ne jî dizanin ku tune ne. Ew di nav sergêjîya eşqa yarê de, ne dizanin aşiqin ne jî dikarin eşqa xwe bi peyvan terîf bikin. Di nav şerxweşîya bedewîya yarê de ne.

Feqî go bilbil taze

Tu bilbilek sewda yî

'Işqa gulê mecaz e

Tu yarek bê wefa yî

Dostê ebed bixwaze

Da lê nebit fenayî (b.n. b. 12, r. 152)

Li vê derê Feqî digel eşqa mecaz û heqîqî behsa yarê bê wefa û heqîqî jî dike. Li gor bikaranîna wî yar, hem di meneya aşiqê de hem jî di meneya meşûqê de tê bikaranîn. Di vir de ji yarê qesta Feqî ne Xweda ye aşiqên ku li pê eşqên mecazî ne. Li gor wî yarên ku ketine pê eşqa mecaz jî mîna meşûqên xwe fanî û bê wefa ne. Bi tenê aşiq û yarên ku dostê ebed, meşûqê ebed dixwazin yarên heqîqî û bi wefa ne. Ji bo ku

eşq, aşiq û meşûqê digihîne hev ancax eşqa yarê heqîqî dikare meriv ji bê wefatî û fanîbûnê xelas bike. Her wiha li vir tê dîtîn ku Feqî, cudatîya eşqa heqîqî û eşqa mecaz û cudatîya aşiqê rastî û aşiqê bê wefa jî ji ser meşûqê ve kifşe dike. Eger ku meşûq Xweda be, wê çaxê eşq heqîqî ye yar heqîqî ye û aşiq dikare bi vê eşqê bigihîje meqseda xwe. Lê dema ku meşûq fanî be, eşq dibe mecazî, yar jixwe fanî ye û aşiq jî di vê eşqê de nikare wefayê bi dest bixe û bigihîje meqseda xwe.

Feqî:

Yarê heqîqî Xaliq e

Çûn canfidayî vêkevin

Rast û dirist û sadîq e

Çi reng bi şûna rê kevin

Qenc û letîf û laîq e

D'bxê "îrem" da vêkevin (Feqîyê Teyran, Feqe û Mela, b. 15, r. 177)

Feqî çawa ku berê jî dîyar kiribû li vê derê jî balê dikişîne ser ku yarê heqîqî, Xwedayê Xaliq e. Li ser vê Feqî rêzikeke datîne holê û dibêje ku madem yarê heqîqî yek e û ew jî Xwedayê Xaliq e, wê çaxê hûn jî mîna kesên ku canê xwe feda dikin û dev ji can berdane xwe teslîmê wî bikin. Ew Xwedayê ku rast e, durust û sadîq e bê guman ji bo teslîmîyetê jî layîq e. Ew kesên ku ji bo Xwedayê layiqê îbadet û teslîmîyetê ye re serî bitewînin û xwe bi eşqa wî de berdîn, dê di dinê de dilê xwe bikin wekî ceneta derewîn yanê wekî Baxê Îrem û tê de bi aramî dê vêkevin.

2. 2. 4. Muhebet

Di çavkanîyên tesewufî yên berê de mefhûmên eşq û muhebetê bi giştî di cihê hev de hatine bikaranîn. Gelek nivîskar jî peyva eşqê bikarneanîne û di cihê wê de mefhûma muhebetê bikaranîne. Di ferhengên mefhûmên tesewufî de muhebet wekî qonaxeke eşqê hatîye terîf kirin (Uludağ, 2012: 49). Feqîyê Teyran jî di berhemên xwe de herdu mefhûm jî bikaranîne.

Muhebet hîseke pir bi tesîr e ku di qelbê arifan de ye û arif bi wê hîsê wê şewqa mezin a evdîyê bi dest dixin. Bi hîsê muhebetê sûfî navenda dilê xwe yanê textê dilê xwe teslîmê Xweda dike û hemû hebûna xwe bi xet û xalên wî dibîne. Bi wesîleya

muhebetê ve sûfî çî bike û çî biterikîne her ji bo xatirê wî dike û diterikîne lewra di navenda dilê sûfî de di navenda jîyana sûfî de ew heye. Mutesewifê navdar Şiblî dibêje, “Ji bo ku muhebet di dilê meriv de ji xeyrê evîndarê çî hebe tune dike jê re gotine muhebet.” (Kuşeyrî, 2014:407). Di çavkanîyên tesewufî de gelek kitêbên berê di behsa muhebetê de ev ayet delîl anîne. “Hey gelî yên ku bawerî anîne! Ji we kê ji dîne xwe vegere (bila bizane ku) Xwedê, dê civateke wisa (di şûna wan de) bîne ku Xwedê ji wan hez dike ew jî ji wî hez dikin...” (Maîde. 54). Li gor hin mutesewifan jî muhebet ji hebbeya erebî tê ku ew di kurdî de jî tê bikaranîn yanê muhebet ji hebê tê lewra heb dendik û esl e û eslê hebûnê jî ji muhebetê ye (Hücvirî, 2014: 367).

Min dîye muhbet çî reng e

Soht e dijwar e pereng e

Min mudam dil jê bi heng e

Bi nalîn û efxan im ez

Bilbilim daîm dixwînim

Ez yekî er te nebînim

Dîn dibim sewda dimînim

Serxweş û sekran im ez (Feqîyê Teyran, Îro Ji Dest Husna Hebîb, b. 7, 9, r. 129)

Feqî di vir de terîfa muhebeta xwe dike. Ew ji me re behsa rengê muhebetê dike ku li gor wî muhebet xwedî renekî dijwar e û dilê aşiq her dem bi meşûq re mijûl dike. Ev mijûlî dilê aşiq disoje û hîsên muhebetê di aşiqî de bi nalîn û fixanê eşkere dibin. Her wiha aşiq ji bo meşûqê xwe (Xwedayê xwe) mîna bilbilan daîm di zikrê de dimîne. Ev zikra daîm piştî wextan aşiqî dîn dike, bi sewdayê serxweş û mest dike.

Kesê bi işq û muhbet

Bi dil yekê peristî

Daim dê bête xizmet

Bi rastî û dirûstî

Muqîm dê çav li rê bet

Lew şev û roj nawestî (Feqîyê Teyran, Feqe û Bilbil, b. 5, r. 149)

Di vê derê de Feqî ji bo ehlê dil, ehlê hal bi gotinên xwe rêzanî dike, rêbazê nîşan dide. Qesta Feqî ji “yekê” ne yarekî ji berê ye, ew bi “yekê” ve Xwedayê ku bê şîrîk e tîne ziman. Dibêje ku kesê bi rêya muhebetê bigihîje sirê wehdetê, yanê sirê tewhîdê fêhm bike êdî ji bo wî lazim e rê û rêbazekî. Li gor vê rêbazê xebat û têkoşîneke rast û durust hewce ye, ev rê bê rastî û dirûstî nayê qedandin. Û ev rê rêyeke dirêj û dijwar e, rêwîti bi şev û roj didome lê belê divê ku hevî bi tu awayî neyê qut kirin. Her dem divê ku aşiq li benda wusletê be. Lewra meriv dikare bibêje ku li gorî Feqî muhebet, bendewariyeke bi şewq û hevî ye.

Işq bê îbadet nabitin

Hetta mehebbet nebitin

Hal û helawet nabitin

Îzhar bikim behsiyyetê (Feqîyê Teyran, Şêx Sen‘an, b. 22, r. 244)

Di vir de Feqî têkilîya muhebetê hem bi îbadetê ve hem jî bi halên menewîyatê ve datîne. Li gor terîfa wî çawa ku bê îbadet eşq nabe bi heman awayî muhebet jî çavkanîya hal û meqamên tesewufê ye û bê muhebet di rêwîtiya menewî de pêşketin ne mumkun e.

2. 2. 5. Arif, Sûfî, Derwêş û Merîfet

Merîfet li gor alim û sûfîyan ilmê naskirina Xweda ye û ev ilm ji hemû ilmên kaînate bi qîmettir e (Hücvirî, 2014: 331). Her wiha heta kesekî ku ilmê merîfetê hîn nebe, xwedî merîfet nebe, nikare Xweda baş nas bike û ji wî kesî re arif nayê gotin. Di dîne îslamê de mezhep û meşrebên cuda rêya merîfetê li gor xwe terîf kirine. Li gorî hinekan merîfet bi aqilî, li gor hinekan bi aqil û ilmî tê peyda kirin. Di ilmê tesewufê de merîfet, yanê naskirina Xwedê, ji hemû qeyd û mercan azad bi tenê bi rêya qelbî ve mumkun e. Nefsa însan ji bo naskirina Xweda miftehê e û ji ser wê miftehê ve Xweda, bi Xweda ve tê nasîn. Hemû hebûn ji Xweda ne û li dijî Xweda tu quwet û hebûn tune. Her wiha li gorî bawerîya sûfîyan Xweda, bi hebûneke li dijî xwe nayê nasîn. Arif bi merîfetê perdeya zahîrê hiltîne û di batinê de neqşên me’rûf (Xweda) nas dike. Zahit yan jî soffiyê xav ji ber ku di zahîra îbadetan de asê maye ji vê meqama

bilind bê xeber e. Arif, dema ku Xweda bi Xweda ve nas dike, di halê heyretê de xwe ji bîr dike. Ew piştê merifetê cismen heye lê belê bi wesf û sifetên xwe ji holê radibe û tune dibe (Kelabazî, 2013: 196). Arif, sûfi yan jî salik hebûna xwe di axa muemayê de defîn dikin da ku bi tevahî ji holê rabin ku bikarin bigihîjin hebûna heqîqî (Îskenderî, 2010: 22).

Di helbestên Feqîyê Teyran de, di du cihan de mefhûmên derwêş û sûfi (arif) tê terîf kirin. Feqî bi helbestên xwe digel terîfa derwêş û sûfi li wan şîret jî dike. Di navbera mefhûmên arif, sûfi û derwêş de hinek cudatî hene lê gelek car di cihê hev de jî tene bikaranîn. Feqî ji ser sofî ve behsa sofîyên xav ku hê ji hikmetê xeberdar nînin dike û paşî jî arifan yanê sûfiyên kamil jî terîf dike.

Were sofî misilman be

Bi saqî secdeyê bîne

Ku sûret mezherê zat e

Sifatê Heq Teala ye (Feqîyê Teyran, Îlahî Lew Dikim Zarî, b. 4, r. 237)

Peyva sûfi li gor hin sûfiyan ji hirîyê tê li gor hinekan jî ji meclîsa sûfa ya Resûlê Xweda (sew) tê. Li vê derê Feqî bangê sofî (zahid) dike û jê re dibêje dev ji zahirê berde. Balê dikişîne ser cudatîya navbera arif û zahidan ku li gorî hin vekolîneran di navbera peya sofî û sûfi de jî heman cudatî heye. Helbestvanên berê di meneya zahidî de peyva “sofî” di meneya arifî de jî peyva “sûfi” bikaranîne (Kılıç, 2012: 118). Di dewama bendê de Feqî dîyar dike ku ev rê bi zahidîyê naçe serî, ji bo meqsedê arifî lazim e. Arif û rêya arifîyê jî bi secdeya saqî yanê bi rêya tesewufê mumkun e. Li gorî Feqî heta ku sofî xwe ji perdeya zahirî nefilitîne heta ku meseleyan bi tenê bi çavê zahirî bixwîne û ji hikmetan bê xeber be nikare Heqî û sifetên Heqî fêm bike.

Te d'vê rêya derwêşîyê

Carek neke dirêşîyê

Kêmtir bigire xwe j'pêşîyê

Nekevî di hilaketê (Feqîyê Teyran, Bersîsê 'Abid, b. 72, r. 352)

Li gorî Feqî her çi kesê ku rêya derwêşîyê divê, lazim e ku xwe ji pêşîyê bigire, dev ji nefisperestîyê berde, hedê xwe bizane da ku neçe helaketê. Lewra derwêş bi merîfetê ve bûye xwedîyê halên menewî û ew bi tenê bi merûfê re eleqedar e. Dinya û zînetên wê divê ku bala wî nekêşe. Ferîdudîn Etar jî di Pendnameya xwe de behsa derwêşîyê dike û di vê mijarê de ew jî rêya derwêşîyê wekî rêya rastîyê dibîne û li ciwanan rêya derwêşîyê pêşnîyaz dike.

“Ji xeynê derwêşan bi kesî re hevaltî neke, heta tu dikarî xwe ji xîbeta wan dûr bide.”(Etar,b.n.ç.,r.15).

‘Eyb e ji bo ehlê ‘eqil

Teftêş bikin merîfetê (Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, b. 31, r. 121)

‘Ilmê zakir nik me nîne

Kes bi aqil arif nebûne

Hûn nebên hemzo ku dîn e

Dîne ‘îşqê mexfî ye (Feqîyê Teyran, Ah Ji Dest Cama Wîsalê, b. 10, r. 489)

Li gorî mu’tezîlîyan merîfet bi aqilî çêdibe. Lê alimên mutesewif li dijî vê derdikevin û diyar dikin ku dînekî bê aqil jî dikare Xweda nas bike û qebûl bike. Heta li gor mutesewifan merîfet ne mumkun e bi wesîleya aqilî pêk were. Di vir de Feqî jî li gor fikra giştî ya mutesewifan dîyar dike ku ehlê aqilî nikarin merîfetê bizanin.

2. 2. 6. Şêx, Pîr û Murşîd

Di navbera şêx, pîr û murşîd de di warê meneyê de cudatîyek tune ye. Şêx û murşîd erebî ne û di meneya kal û extîyar de yan di meneya rêzanê de tîk bikaranîn, pîr farisî û kurdî ye dîsa di heman meneyê de tîk bikaranîn. Şêx yan jî murşîd di terîqetê de rêzan û serok in. Di silûkê de hewcehîya salikan bi rêzanekî heye, lewra kêmasîya meqamekî dema ku neyê qedandin û bi wî awayî salik rêya xwe bidomîne ew kêmasî dê di tevahîya silûkê de bidome û ev jî dê bibe sedema astengîya wusletê (Uludağ, 2014: 68). Şêx di çarçoveya usûl û qaîdeyên tesewufî de murîdan yan jî sûffîyan terbîye dikin. Murşîd jî di pêşîya îrşadê de li ber destê şêxekî perwerdeya xwe diqedînin û ji meqam û xetereyên rêwîtiya menewî xeberdar dibin (Nar, 2008: 137;

Turan, 2012: 688). Di rêwîtiya menewî de destê murîdan digirin û wan meqam bi meqam ber bi nêzîkbûna Xweda ve pêş dixin. Şêx xwedîyê ilmên zahirî ne, lê ne mîna melayan bi tenê ilmê şerîetê dizanin, ew digel ilmê şerîetê hay ji heqîqet û merîfetê jî hene.

Mirwet ji mîr û hakimîan

Xizmet li qûl û xadîman

Bê şêx û pîr û ‘alîman

Zayî’ mekî hûn ta’etê (Feqîyê Teyran, Bersîsê ‘Abid, b. 4, r. 338)

Li gorî Feqî rêwîyên rêya eşqê bê terbiyetkar û rêzan nikarin rêwîtiyê bikin. Ew bê xizmet û îtaeta alîm, şêx û pîran ne mumkun e bigihîjin meqseda xwe, digel vê, taet û xebatên xwe jî bê rêzan zayî dikin. Di vir de Feqî digel mefhûmên “şêx” û “pîrî” mefhûma “alîman” jî bikaranîye. Ev dibe ku di rêya terîqetê de balkişandineke bi ser ilmê zahirî ve be. Lewra di tesewufê de her çi qas pêşketin û seyr li ser ilmê batinî ve bimeşe jî di netîceyê de alîmên mutesewif bi giştî vê qebûl dikin ku murşîd jî murîd jî ji bingeha şerîetê divê ku neqetin. Ji bo vê di perwerdeya murşîdan de jî di ya murîdan de jî pêşî ilmên şerîetê tene fêr kirin.

Er ewlîya er Enbîya

Er ‘abid û er esfiya

Bê şêx û pîr caiz niya

Ta’et bikin vê wechetê (b.n. b. 23, r. 341)

Bê guman di ilmê tesewufê de ji bo pakbûna ji qirêjahîyên nefsê û ji bo nêzîkbûna Xweda rêzanek şert e. Lewra kesekî ku fetl û xetere û taybetîyên vê rêyê nezane nikare di vê rêyê de rêwîtiyê bike, ji ber vê sedemê bê şêx û pîr ev kar nabe. Lê belê li gor Feqî meqama rêzanî û serwerîyê wisa muhim e ku Feqî bê rêzanan domandina vê rêyê caiz nabîne. Di vê rêyê de digel xweşî û aramîyê xetereyên mezin jî hene. Lewra qada ku tê de rêwîti tê kirin qadeke menewî ye û di vê qada menewî de rêwîtiya çavgirtî ne caiz e. Ji mufekirên îslamê Îbn Xaldûn berhema xwe ya “Şifau’s Sail” di derbarê tesewufê de nivîsîye û di wê derê de li ser mijara şêxan fikreke qismen cuda anîye ziman. Li gorî Îbn Xaldûn ji bo ehlê tesewufê di hemû rewşan de

şêx, ne hewce ye. Lê ji ber ku tesewuf ilmê hal e û bi rêya kitêban nayê fêr kirin di merhaleyên bilind de murîd mecbûr e ku ji murşîdekî perwerdeyê bigire (1998: 172). Di netîceyê de alimên ku kêr zêde ji ilmê tesewufê xebardar in bi giştî dîyar dikin ku rêya tesewufê bê şêx ne mumkun e bê qedandin.

Zikrê wacib e ‘amî bikin

Nêzîkî şeyx sofî bikin

Murşîd murîdî hî bikin

Xaric bikin ji zulmetê (Feqîyê Teyran, Şêx Sen‘an, b. 21, r. 244)

Di vê derê de Feqî di mijara zikrê de behsa tēkilîya mamostetîya navbera murşîd û murîdê dike. Feqî murşîdî mîna mamosteyekî terîf dike û behsa wezîfeyên ku li ser milê wî ne dike. Li gorî terîfa wî murşîd, fêrker e, ew bi fêrkirina zikra Xweda ve şagirtên xwe yanê murîdên xwe ji tarîtiya cehaletê xilas dikin. Şêx bi ilmê batinî ve di rêyên menewî de mîna çirayên bi nûr in. Bê rêberîya wan murîd nikare rêya xwe kifşe bike û di nav tarîtiya nezanîyê de winda dibe.

Carek here bal nasekî

Xwo b’ke mirîdê xasekî

Da ew vekit esasekî

Anca were îmaretê (Feqîyê Teyran, Bersîsê ‘Abid, b. 66, r. 351)

Li vir jî Feqî ji bo kesên ku nîyeta rêya tesewufê kirine şîretan dike. Li gorî şîreta wî û rêzikên rêya tesewufê terîqetê bê şêx nabe. Şêx ku xwediyê ilmên tecrubî ye û murîd ji wan ilman ne xebardar e dê bi tecrubeyên xwe pêşîya murîdê veke. Murîd ancax bi esasên vê rêyê ji serî ve tîn ava kirin ku gelek mutesewif di şexsîyeta sūffîyan de vê avakirina nû wekî zayîna duyemîn şîrove dikin.

2. 2. 7. Hikmet

Hikmet di ferhengan de tê meneya felsefeyê, fikra mutedil û agahîya tecrubî (Secadî, 2004: 362). Wek mefhûmeke tesewufî jî hikmet raza hemû kar û fermanên Xweda ne. Xweda tu karekî xwe bereday û bê sebeb çênake. Bê guman Xweda di her karê xwe de xwedî hikmet e û însan, van hikmetan bi tevahî nikare fêr bike. Lewra hikmet bi alîyekî xwe ve jî raz e. Ji ber vê hin mutesewifên ku Xweda, fêrkirina

hikmetên xwe nesîbê wan kirine helbest û berhem nivîsîne û behsa hikmetên Xweda kirine. Fususûl Hîkema Muhyîdînê Erebî û Hîkema Îbn Etawallah Îskenderî ji bo vê mînak in. Hikmet di rûdanên jîyanê de raza piştê perdeyê ye. Daxwazîya Xweda ye ku her kes nikare yên piştê perdeyê bibîne. Ehlê hal ku Xweda fêmkirina hikmetan nesîbê wan kirîye di hemû rûdanên rojane de dikarin qesta heqîqî ya li pişt perdeyê fêm bikin û li gor wê hereket bikin. Di berhemên Feqîyê Teyran de mefhûma hikmetê li hin cihan derbaz bûye lê li cihê Feqîyê Teyran behsa hin xusûsiyetên hikmetê kirine û bi zimanê teyran ew terîf kirîye.

Keyfa surrî bê şubhe ye

Ew ne wekî benka me ye

Sofi dibên seddeq we ye

Dijwar e bêhna hikmetê (Feqîyê Teyran, Şêx Sen'an, b. 160, r. 281)

Feqî li vir behsa “bêhna hikmetê” dike. Ev di çarçoveya rewşa “halê” wî yê menewî de muheqq xwedî meneyên pir taybet e. Ji ber ku ji zimanê teyran bi tenê em dikarin beşeke biçûk fêm bikin em di derbarê van rêzên Feqî de dikarin bibêjin ku hikmet gewhereke giranbaha ye. Peydakirina wê dijwar e. Her însan nikare hikmetê fêm bike lê ji bo kesên ku hikmet fêm kirine jî rewş hêsan nîne. Lewra ev fêm kirin berpirsariya sûfiyan girantir dike. Ji ber ku barê wan girantir dibe Feqî dibêje “Dijwar e bêhna hikmetê”.

2. 2. 8. Hal û Meqam

Mefhûmên “hal” û “meqamê” ji ber ku di warê meneyê de gelek nêzikê hev in bi giştî bi hev re têne bikaranîn. Hal di zimanê Erebî de meneya rewşê dide, ew rewşên ku di dilê meriv de zuhûr dikin (Cebecioğlu, 2009: 245). Tesewuf ji bo ku wekî ilmê hal hatîye terîf kirin ji bo ehlê tesewufê jî bi giştî gotine “ehlê hal”. Di helbestên Feqîyê Teyran de jî carinan her du mefhûm bi hev re hatine bikaranîn. Feqî bi xwe di navbera her du mefhûman de ferqek danenîye holê. Hal çawa ku ji navê wê jî tê derxistin guherbar e. Piştê wextan halê sûfiyan diguhere. Lê belê meqam mîna halî nîne. Ew li cihê xwe sabit e û naguhere. Mesela halê muhasebeyê dema ku bi sûfi re dîyar bû ew hal di nav demê de diguhere, carinan diçe carinan tê heta ku sûfi di wî halî de sabit bû paşî ew ji bo sûfi dibe meqam û li sûfi halekî din dîyar dibe

(Sühreverdî, 2014: 591). Bi vê rewşê hal her tim diçe û tê yanê diguhere, lê bi îstiqrar û têkoşîna sûfî ve ew hal jê re dibe meqam.

Qelbê ku hal tê ra bitin

Yan dê j' Resûl peyda bitin

Hal bê mecaz qet nabitin

Carî bûye li vê adetê (Feqîyê Teyran, Şêx Sen'an, b. 4, r. 240)

J'beşera zat û sîfatan

Pirr ji işqa mubtelatan

Ketme behra muşkîlatan

Çûme halê heyretê

Halê Heyretê di tesewufê de halek e. Di vî halî de bi rakirina perdeyan û bi fêmkirina sir û hikmetan ve sûfî dikeve heyretê. Halê heyretê di Mentiqût Teyra Ferîdudîn Etar de jî ji heft newalan a şeşemîn e. Di berhema Etar de ev hal bi awayekî xweş tê terîf kirin. Li gorî Etar di wî halî de her tişt tê jibîr kirin û ji ber heyretê êdî rêwî nizane gelo ew kî ye.⁶ Feqî jî li vir dîyar dike ku ew ji ber eşqa zat û sîfetên Xweda ji xwe çûye û di halê heyretê de asê bûye. Her wiha Feqî ji bo terîfkirina hal, mecazan wekî wesîleyek dibîne û dibêje “Hal bê mecaz qet nabitin”.

Işq bê îbadet nabitin

Hetta mehebbet nebitin

Hal û helawet nabitin

Îzhar bikim behsîyyetê (Feqîyê Teyran, Şêx Sen'an, b. 22, r. 244)

Feqî li jorê bidestxistina meqam û halan bi şertekî ve girê dide. Li gor wî heta ku muhebet nebe ne mumkun e sûfî bigihîje halên menewîyatê. Ji bo ku hal hîs û heyecan e, bê guman ji bo bi destxistina wê hîs û heyecanê muhebet şertekî hewce ye.

⁶Ji bo zêdetir agahî bnr. Mustafa Çiçekler (çev.) Mantıku't Tayr, Kuşların Diliyle. İstanbul. Kaknüs, r. 359

Teb'etê xelqê û 'amê

Xweş dibin l'zîkr û siyamê

Xafil in j'halê meqamê

Ji wîsal û lezzetê (b.n. b. 74, r. 258)

Feqî di vir de 'am û xasê, xelq û ehlê hal ji hev vediqetîne. Li gor terîfa wî xelq bi zîkr û nimêjê bi îbadet û zahidîyê tebi'etxweş dibe aram dibe lê belê ji ber ku xelq siran nizane rê û usûlê nizane ji hal û meqaman xafil dimîne. Bi tenê sûfîyên ehlê hal û xwedî meqam bi zîkr û îbadetan ve dikarin tehma wîsalê bigirin. Yê ku ehlê hal nebin ji tehma wîsalê dûr in.

Çeşmeya şîrîn zuhûr e

Hal ji qalib bêhed dûr e

Min mudem behrekî kûr e

Kes bi ilmê rê nabetê (b.n. b. 76, r.259)

Di vir de Feqî ferqa "hal" û "qalê" nîşanê me dide. Li gor terîfa wî "hal" û "qal" ji hev bê hed dûr in. Lewra qal bi ilmê zahirî bi ilmên şerîetê tê fêrbûn û pêşxistin. Her kesekî ku xîret bike li gor nesîbkirina Xweda di ilmên zahirî de dikare bigijîje meqamên cuda û li gor xwe pêş bike. Lê belê hal ne wisa ye. Ew bi xwendin û xebata zahirî, bi ilmên şerîetê pêş nakeve. Ilmê şerîetê ji bo ehlê hal bi tenê bîngehek e. Ew xwedîyê ilmê ledûn in. Ilmê ledûn ku raste rast ji cem Xweda ve tê dayîn ji bo sûfîyan îkrameke mezin e. Li gorî terîfa alimên mutesewif hal netîceya xwendinê nîne ew mîrata îbadetan e (Kelabazî, 2013:131), ku bi xwendin û ilmî kes nikare wê fêm bike û bijî. Hal lufteke Xweda ye di netîceya îbadetan de Xweda wê dide dilê meriv. Ji vê bendê meneyeke din jî tê derxistin. Feqî dibêje ku hal û qalib ji hev bê hed dûr in. Yanê halê tu sûfîyê ji şîkl û qalibê wî nayê fêm kirin. Kesekî ku bi şîklê xwe wekî parskeran jî be yan belkî wekî padîşahan jî be ferq nake, ji ser şîklî ve meriv nikare halî kifşe bike. Pîvana halî bi ilman ne mumkun e lewra qalib û hal yanê zahir û heqîqet ji hev gelek dûr in.

Ev halekî kûr tê heye

Dûrbînekî dûr tê heye

Pur metnekî hûr tê heye

Sofi nizanin wê xetê (Feqîyê Teyran, Şêx Sen'an, b. 195, r. 292)

Di vir de Feqî ji ser halê Şêxê Sen'an ve taybetîya halên mutesewifan terîf dike. Li gor terîfa wî halên tesewufî, xwedîyê taybetîyên pir kûr in, remz û xetên van halan pir bi sir in. Bi tenê kesên ku xwe gihîştandine wê meqamê dikarin van halan fêhm bikin. Sofî ji vê xetê nikarin tiştekî fêhm bikin lewra "Pur metnekî hûr tê heye" û ji bo dîtina wê metna hûr çavên jêhatî divê, kesên ku xwe negihîştandibin wê meqamê, bi çavên asayî nikarin wê metna hûr bixwînin. Lewra hal ji bo ku ji cem Xweda ve tê dayîn her wiha çavkanîya wî ne fanî ye û teybetîya wî ya kûrbûnê heye (Kubra, 2013: 130). Ji bo ku çavkanîya halî made nîne, ew ji cem Xwedayê Baqî ve tê, bi awayekî tebîî ye ku sofîyên xav nikarin wî fêhm bikin.

Ez çi bêjim çi beyan kim

Mexfîyata ez 'eyan kim

Sirê dilî aşkera kim

Kes bi halê min nezan

Çendî bêjim sir û halan

Ah ji destê çavxezalan

Her dinalim mah û salan

Kes bi halê min nezan

Mah û salan ez dinalim

Şev û roj talibwîsal im

Aşîqê bejna şepal im

Kes bi halê min nezan (Feqîyê Teyran, Ez Çi Bêjim, b. 1, 2, 3, r. 415)

Di vir de Feqî balê dikişîne ser ku hal, ne fikr û raman e, ew rewşek e ku tê jîyîn û heta kesekî wê ne jî ji wê fêr nake. Bi kurtasî Feqî diyar dike ku hal ne wekî qal e. Bi gotin û nivîsan nayê fêr kirin. Ji bo fêrkirina wê divê ku ew hal ji aliyê Xweda ve bê dayîn û bê jîyîn.

Ah ji dest kovan û qehran

Min sebir nayê li sehan

Şubhetê mewcên di behran

Qulzemê ‘Umman im ez (Feqîyê Teyran, Îro Ji Dest Husna Hebîb, b. 5, r. 128)

Feqîyê ku xwe ji ber eşqa Xweda bi birîndariyê wesifandîye hinek behsa dilê xwe dike. Di helbesta “Ey Av û Av” de û di gelek rêzên din de jî wesfê birîndarbûnê bikartîne. Ev rêz ji helbesta wî ya “Îro ji dest husna hebîb” hatine girtin ku di destpêka helbestê de peyva “îro” nîşan dide ku Feqî di silûka xwe de gihîştîye qonaxeke bilind. Di rêza “Qulzemê ‘Umman im ez” de jî Feqî bi remza umanê (deryayê) dîsa merhaleya silûka xwe û halê xwe eşkere dike. Remza umanê ji aliyê gelek şairên mutesewif ve hatiye bikaranîn. Mesela mutesewif û şairê navdar ê tirk Nîyazîyê Misrî jî dema ku silûka xwe qedandîye bi vê helbestê ve dest bi helbestvanîyê kirîye û di vê helbestê de halê xwe terîf kirîye.

Ey Niyazî katremiz deryâya saldik biz bugün

Katre nice anlasın ummân olan anlar bizi (Kılıç, 2012: 87)

(Ey Nîyazî me îro dilopa xwe berda nav deryayê. Dilop êdî çawa fêr bike, derya ancax ji halê me fêr dike.)

Gotin û remza Feqî, di vê mijarê de gelek dişibe gotin û halê Nîyazîyê Misrî. Li gorî me, her du şair bi van helbestan ve halê xwe terîf dikin ji bo ku her du di heman halî de bûne jî bi rastî halê hevdu terîf dikin.

2. 2. 9. Tewhîd û Wehdet

Tewhîd û wehdet di berhemên Feqîyê Teyran de jî di ilmê tesewufê de jî tê heman meneyê. Di meneya ferhengan de tewhîd ji xeyrê Xweda redkirina hemû îlahan e. Yanê kesên ku tewhîdê qebûl bikin ji xeyrê Xweda îlahîya hemû îlahên sexte red dikin. Lê belê sûfî, tewhîdê bi awayekî din fêr dikin. Li gorî wan tewhîd, ji xeyrê

Xweda redkirina hebûna her tiştî ye. Yanê ji xeyrê hebûna Xweda tu hebûneke din tune ye (Gölpınarlı, 2012: 55). Di bawerîya gelek sûfiyan de û bi Feqî re jî terîfa tewhîdê bi rastî di encamê de digihîje bawerîya wehdetê wicûdê. Di berhemên Feqî de jî mijara tewhîdê, di navbera meneya ferhengî û meneya wehdetê wicûdê de diçe û tê. Sûfî di halê tewhîdê de ji xeyrê Xweda hebûna tu tişt nabînin û hîs nakin.

‘Erşê ezîmê ekber e

Zînet û raza merkezî

Ew kursîya heq li ser e

Bê şems û gerdûn dibezî

Heq wahid e witr e fer e

Bê newm e baxvanê rezî (Feqîyê Teyran, Ellah Çi Zaten Ehsen e, b. 2, r. 103)

Ev benda Feqîyê Teyran bi naveroka xwe Ayetel Kursî tîne bîra meriv. Di helbestê de Feqî, pêşî behsa xusûsiyetên Xweda dike, bê newm (bê xew), li ser kursîya heq (Xweda), wahid, witr û fer. Di vir de bi taybetî li ser wehdetê disekine û diyar dike ku Xwedayê xwedî rezan (lutf û îkramên menewî), bê şîrîk e yek e û bê kêmasî ye. Ew ji kêmasî û xefletê yanê ji xewê munezeh e û di hakimîyeta mexlûqan de bi tenê ye.

Ew mîr kerîm e satir e.

Xweş hakim e d’barê xwe da

Xelqno! Ne dûr e, hazir e

Ew wahid e û bê îbtîda

Her çî bikit ew qadir e

Ew xaliqê bê bab û da (b.n. b. 6, r. 105)

Di vir de jî Feqî behsa Xweda dike û mîna sûreta îxlasê dixwaze nîşan bide ku Xweda ewil e û axir e. Ew xaliq e hemû hebûnan bi sebep, bi dê û bav dixuliqîne lê bi xwe nehatîye xuliqandin û bê dê û bav e. Ew yek e û di pêşîya wî de tu hebûneke din tune. Ew li ser milkê xwe hakim e û di milkê xwe de xwedî qudret e. Feqî terîf dike ku

Xweda qadirê her karî ye. Her çi dibe bila bibe ew di qudreta wî de ye û Xweda dikare her daxwazîya xwe pêk bîne.

Tewhîd e ‘ilmê hal e

‘Arif dîkin tefsîrî (Feqîyê Teyran, Feqe û Bilbil, b. 8, r. 150)

Li gor Feqî “tewhîd” ne ilmê qal e. Yanê ew bi tenê bi gotin û xwendinê nayê fêm kirin. Fêmkirin û pêkanîna tewhîdê ancax bi ilmê hal mumkun dibe. Li gorî sûfîyan tewhîd cureyeke halî ye û bi dîtinê bi hîskirinê tê zanîn. Yekîtîya Xweda bi jîyîn û tecrûbeyên menewî ve tê fêm kirin. Her wiha meriv dikare bibêje ku alimên ilmê zahîrî bê ilmê hal nikarin tewhîdê bi tamamî fêm bikin û ders bidin. Bi tenê kesên ehlê hal yanê bi tenê arifên ku Xweda ew bi irfanê muşeref kirine dikarin terfî û tefsîra tewhîdê bikin. Kesên ku Xweda bi halî nas nekin nikarin yekîtîya wî jî bi tevahî tefsîr bikin.

2. 2. 10. Nefs

Nefs peyveke erebî ye û di gelek meneyên cuda de tê bikaranîn. Ew di hundirê însan de hebûneke metafîzîk e ku wekî gewhereke letîf tê terfî kirin (Cebecioğlu, 2009:472). Ew amûrek e ku bi eslê însan ve hatîye girêdan. Bi pak kirinê pak dibe û bi qirêj kirinê jî xerab dibe. Di dîne îslamê de nefis bi delîlên ji Qur’anê xwedîyê heft qonaxan e. Ev heft qonaxên nefisê bi nefsul emmareyê dest pê dike bi nefsul kamileyê jî diqede. Di edebîyata tesewufê de û li gorî sûfîyan nefis, ne wicûdek e û ne jî xwedîyê cismek e. Nefs daxwazîyên xerab yê mirovan e. Çawa ku ruh di bedenê de mekanê başî û qencîyan e nefis jî bi heman awayî di bedenê de mekanê xerabîyê ye (Kuşeyrî, 2014: 181). Li gorî hin mutesewifan jî nefis û ruh du hebûnên di nav qelbî de ne û her du jî ji bo ku hakimê qelbî bin têkoşinê didin. Carinan nefis hakim dibe carinan jî ruh. Li gorî sûfîyan divê ku nefis muheqqeq bi rêzanîya murşîdekî bê terbîye kirin. Lewra ji bo ku însan bikare bigihîje meqama kamilbûnê yanê bikare xwe ji xûy, edet û daxwazîyên xerab rizgar bike divê ku teqez nefsa xwe terbîye bike. Digel van di tesewufê de nefis ji bo naskirina Xweda yanê ji bo merîfetulahê ji wekî miftehek tê hesibandin. Sûfî bi naskirina nefsa xwe û her wiha bi naskirina ruh û eslê xwe ve ber bi naskirina Xwedê ve diçe û rebê xwe nas dike. Feqî di mijara nefisê de behsa xusûsiyetên giştî yê nefisê dike û wê wekî beşeke beşerê ku muhtacê terbîye û islahê

ye terîf dike. Ew nefse di xefletê de dihesibîne û wê wekî ehlê xefletê terîf dike, di cihek de jî behsa nefsul lewame dike û li ser terbiyekirina wê disekine.

Canê di navê nefsi ye

Vêkra hemû bû beşerî

Maka wicûdan fanî ye

Er dê bizanî vî derî

Eslê rûha me baqî ye

Lew jê nedakin xawerî (Feqîyê Teyran, Ellah Çi Zatek Ehsen e, b. 18, r. 109)

Feqî li vir behsa nefsa însan dike. Ew dibêje ku piştê nefis û ruh tēketin nav bedenê, beşer pêk hat. Paşî jî dîyar dike ku hebûna bedenê (wicûdê) baqî nîne ew fanî ye, piştê demek dê tune bibe. Her wiha beşerê ji ser nefis û ruhî ve terîf dike û dîyar dike ku kesên ehlê rêya hal bin divê ku vê cudatîyê bizanin.

Li xwe şîrîn meke newmê

Ji nefsa xwe bike lewmê

Meçe nêzikî vê qewmê

Qewî ew fi'la xesar e (Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, b. 2, r. 203)

Di vir de jî Feqî ji heft qonaxên nefse behsa qonaxa duyemîn yanê behsa nefsul lewameyê dike. Ev qonaxa nefse bi giştî bi misilmanan re heye. Di vê qonaxa nefse de dema ku guneh û xeta bêne kirin nefis ji van xeletîyan aciz dibe û ji xwe lome dike. Ji ber vê jî vê qonaxê re dibêjin nefsa lomeyê.

2. 2. 11. Saqî

Saqî peyveke erebî ye û di ferhengê de tê meneya kesê ku avê dide, avdanîyê dike yan jî şerabê pêşkêş dike (Uludağ, 2012: 305). Di helbestên tesewuffî de saqî bi du meneyan tê bikaranîn. Yan di meneya çavkanîya şeraba eşqê yanê di meneya Xweda de tê bikaranîn, yan jî di meneya kesê ku şeraba eşqê belav dike yanê di meneya murşîdê kamil de tê bikaranîn. Di berhemên Feqîyê Teyran de saqî, di meneya murşîdê kamil de hatîye bikaranîn.

Were sofi misilman be

Bi saqî secdeyê bîne

Ku sûret mezherê zat e

Sifatê Heq Teala ye (Feqîyê Teyran, Îlahî Lew Dikim Zarî, b. 4, r. 237)

Feqî, “Saqî” li vir di meneya murşîdî de bikar tîne lewra ji sofiyên negihîştî daxwazîya teslîmîyetê dîke û dibêje ku rêya ku hûn tê de ne teslîmîyetê dixwaze. Eger ku hûn hewcehîyên vê rêyê yanê teslîmîyetê pêk neynin, wê çaxê li gorî meşreba me hûn misilman nayên qebûl kirin. Di her du rêzên dawîyê de jî Feqî, xusûsîyetên saqî tîne ziman ku dibêje sûreta wî mezherê zatê Xweda ye wî, bi eşqa îlahî dev ji wesfên xwe berdaye û wesfên meşûqê xwe wergirtîye. Êdî ew xwediyê sîfetên Heq Teala ye ku ji ber van sedeman ji bo saqî hurmet û teslîmîyet divê.

Şerab da min bi fincanê

Kirim saqî li meyxanê

Wekî gok im li meydanê

Li destê wê şepalê da (Feqîyê Teyran, Ji Eşqê Te Ezî Dîn îm, b. 7, r. 479)

Di beyta jorê de jî Feqî, mefhûma “saqî”yê ji bo xwe bikartîne û dîyar dîke ku çavkanîya şeraba eşqê yanê Xweda, ew bi şerabê serxweş kirîye û paşî jî ew li meyxaneyê kirîye saqî. Bi rastî eger ku di derbarê jîyana Feqîyê Teyran de agahîyên di destê me de têrê bikira, me dikarîya ji ser vê beytê ve îddia bikira ku Feqî di nav gelê kurd de murşîdî kirîye. Lê belê ji ber ku di derbarê jîyana Feqîyê Teyran de agahî gelek kêma in û ji bo îddiayeke wiha têrê nakin. Em bi tenê dikarin dîyar bikin ku wî, bi rêya helbestên xwe ve wezîfeya murşîdîyê kirîye.

2. 2. 12. Dil û Qelb

Di ferhengan de meneya qelbî zivirandin ve gerandin an guherandina cihê herfan e. Qelb di heman demê de ji bo ‘uzvekî girîng ê însan jî tê gotin. Lê belê di ilmê tesewufê de ji qelbî (dilî) perçeyek goştê singê meriv yan jî guherandina cihê herfan nayê qest kirin. Qelb di tesewufê de cihê e mekaneke e ku bi giştî bi eyniyê re tê şibandin û wekî cihê tecelîya Xweda tê terîf kirin. Helbestvan û alimên mutesewif qelbî wekî cihê keşf û merîfet û îlhamê terîf dikin. Nûrên Xweda, hikmet û razên rêya

tesewufê di qelbî de tecelî dike û sûfî bi qelbî dikare wan muşahede bike (Cebecioğlu, 2009: 341). Feqîyê Teyran jî di berhemên xwe de bi mefhûmên dil û qelbî qesta ‘uzvê însanan nake. Ew jî bi awayekî eşkere qelbî wekî eyneyê (mîr’ate) terîf dike û wî wekî cihê tecelîya Xweda dibîne.

Bê te mirar im meyt im

Qelbim ji surr mîr’ate ye

Ez kuştîyê natebitim

Fexra qûlûban te heye

Xelqno! Bi Furqan û xet im

Herçî dibêjim we ye (Feqîyê Teyran, Ellah Çi Zatek Ehsen e, b. 9, r. 106)

Feqî li vir wekî gelek mutesewifên cîhanê dibêje ku dilê min ji bo sirên îlahî eyne ye. Her wiha dîyar dike ku dilê wî ji bo tecelîya Xwedayê alemîn eyneyek e. Feqî li vir behsa mertebeyên qelban jî dike û li gor wî bilindahîya qelban bi tenê bi zanîna sirên îlahî û bi tecelîya Xweda pêk tê. Di vê helbestê de têkilîya tecelîya Xweda û sirên îlahî bi delîlên Furqanê re hatine dayîn. Her wiha Feqî di çarçoveya vê têkilîyê de îşaret bi bal ilmê ledûn dike. Lewra ilmê ledûn bi sirê qelban tê zanîn û li gor mutesewifan ev ilm ku di çarçoveya şerîetê de be, ilmeke mûteber e. Feqî vê têkilîyê bi gotina “Xelqno! Bi Furqan û xet im” didomîne. Her wiha ew jî wekî rêzên jêrê yên Yûnis Emre, dîyar dike ku gotinên wî ji Furqanê ne, ew jî ber xwe ve nabêje, ji Qur’anê dibêje.

Söz karadan akdan degül yazıp okumakdan degül

Bu yürüyen halktan degül Hâlık avazından gelir (Kılıç, 2012: 80)

(Gotin ji reş û spîyê nîne, ji nivîsîn û xwendinê nîne. Ev ê ku dimeşe ne ji gel e, ew ji dengê Xaliqê tê.)

Sûfî vê rewşê wekî cureyeke wehyê şîrove dikan. Dema ku meriv li berdewamîya helbesta ku me li jorê da binêre, Feqî bi xwe jî vê mijarê tîne ziman.

Ma ez dibêm vê gotinê

Bêy te ziban bê gotin e

Ew qal û qîlê di dinê

Zahir û batin sakin e

Bûn û mîqata mirinê

Ew j'bal te ne, ne j'bal min e (Feqîyê Teyran, Ellah Çi Zatek Ehsen e, b. 10, r. 107)

Li vê derê Feqî bi xwe vê pirsê dipirse “Ma ez dibêm vê gotinê” di dawîya rêzên xwe de jî bi xwe bersiva pirsê xwe dide “Ew j'bal te ne, ne j'bal min e”, her wiha dîyar dike ku ev gotin ne ji gotina Feqî ye. Ev gotin, sir û hikmet rasterast ji bal Xweda ve tî. Dil jî ji bo van gotin û hikmetan wesîle ye. Di nav helbestê de Feqî di navbera gotin û îlhamê de muqayeseyek dike. Li gorî terîfa wî gotinên vê dinyaya fanî, bê hikmet û bê qîmet in li ber gotinên ku bi rêya îlhamê ve ji aliyê Xweda ve tê.

Dilo rabe dilo rabe

Veke çavan ku êvar e

Nezan û bes di xew da be

Bi newmê ra mebe yarê (Feqîyê Teyran, Dilo Rabe, b. 1, r. 203)

Feqî di vir de xusûsiyeta qirêjbûna dilî terîf dike. Ji helbestê tê fêhm kirin ku dil dema bi xewê û bi xefletê re bibe yar wê çaxê qirêj dibe û taybetîya xwe wîndî dike. Yanê piştê wextan êdî ew ji bo tecelîyên Xweda nikare bibe mîna eyneyeke pak. Ji ber vê Feqî ji bo dilê xwe û ji ser dilê xwe ve ji bo dilê hemû sûffîyan banga şîyarbûnê dike. Wan hişyar dike ku xwe ji xefletê dûr bigirin.

2. 2. 13. Kemal

Di zimanê erebî de ev peyv tê meneya temambûn, çêbûn û gihîştinê (Cebecioğlu, 2009: 361). Her mexlûqek li gorî wezîfeya xwe bi hin xusûsiyetan ve hatîye xuliqandin. Mesela mêşê hingivê ji bo çêkirina hingiv hatîye xuliqandin û hemû taybetîyên bedena wî rewşa jîyîna wî li ser pergala hingiv çêkirinê hatîye xuliqandin. Şêr bi goştê têr dibe û diranê wî ji bo perçêkirina goştê hatîye xuliqandin, xezal gîya dixwe û bedena wî li gor xwarin û hezimkirina gîyayê hatîye xuliqandin.

Di nav mexlûqatê de bi tenê bi yekî re îdrak heye ku Xweda ji xeyrê wî xusûsiyeta îdrakê nedaye tu mexlûqekî din. Xwedayê ku ji çî mexlûqê çî xwastîye li

gorî wî xusûsiyet pê re xuliqandine ji însan jî tiştêkî (wezîfeyek) li ser fêm kirinê xwastîye û xusûsiyeta îdrakê daye wî. Ji însan xwastîye ku wî nas bike. Însan ku bi naskirina Xweda hatîye wezîfedarkirin di nefsa xwe de xwedî gelek astengî û îmtihanan e. Li ser rêya naskirina wî gelek tengasî hene ku ancax bi mucadeleyê ev astengî têne berteref kirin.

Di rêya tesewufê de însan bi rojî, nimêj û zikrê bi îbadet û tefekurê ve dibe xwedîyê hal û meqaman û bi vî awayî perdeyên navbera xwe û Xweda radike û Xweda nas dike. Bi vê naskirinê re her ku diçe di têkoşîna xwe de xurt û kamil dibe. Ev xurtbûn ne di bedenê de ye, ew di ruhê însan de di nefsa însan de pêk tê. Di mijara nefse de me behsa qonaxa dawî ya nefse kiribû ku ew qonax nefsa kamile ye û têkilîya wî bi însanê kamil re bi kamilbûnê re heye. Yanê ilmê naskirina Xweda ji xwe di eslê însan de heye lê belê ev ilm bi perdeyên nefse ve hatine perde kirin (Kılıç, 2014: 29). Mijara însanê kamil di qada tesewufê de mijareke girîng e ku li serê gelek tişt hatine nivîsîn. Li gorî vekolînan ev mijar cara ewil ji aliyê Muhyîdînê Erebi ve hatîye gotin û terîf kirin (Mutahhari, 2012: 22). Di vê mijarê de Murteza Mutaharî cudatîya navbera mefhûma “temam” û mefhûma “kamil”ê terîf dike ku terîfa wî bi rastî jî mijarê zelaltir dike. Li gorî terîfa wî ev her du mefhûm her çî qas di warê meneyê de nêzikê hev bixuyên jî bi rastî her du ji hev cuda ne. Mefhûma “temam”ê ji bo qedandina tiştêkî tê gotin mesela çekirina avahîyekî heta ku neyê qedandin ew avahî kêr e. Lê piştê ku avahî bi tevahî hate çekirin êdî jê re “temam” tê gotin. Lê “kamil” mefhûmeke din e ku piştê “temambûnê” tê. Yanê însanekî ku tamam e, lê belê “kamil” nîne, bi rêya tesewufê ve bilind dibe û merhale merhale kamil dibe. Bi rastî îhtimal heye ku di mijara “însanê kamil” de yan jî di mijara “kamilbûnê” de Feqîyê Teyran jî di binê tesîrê Muhyîdînê Erebi de mabe. Lewra Erebi bi vê mefhûmê ve pîranîya mutesewifan di binê tesîra xwe de hêştine.

Feqîyê Teyran di helbestên xwe de têkilîya kamilbûnê bi sê tiştan re datîne ku ev her sê tişt jî di ilmê tesewufê de têne qebûl kirin. Feqî pêşî behsa kamilbûna xelqê dike û vê kamilbûnê di di asteke jêr de dibîne û rêya vê bi aqilî re têkildar dike. Paşî ji bo ehlê tesewufê ji bo sûfîyan rêya kamilbûnê terîf dike û dibêje meşaleya nibûwetê yanê heqîqeta Muhemedî, ji bo kamilbûnê rawestgeheke muhim e û heta sûfî negihîjin wê rawestgehê nikarin bigihîjin meqama kamilbûnê. Di dawîyê de jî dîyar dike ku dawîya meqama kamilbûnê bi nêzîkbûna Xweda ve yanê bi halê ulfetê ve pek tê.

Xelqê Xwedê aqil kirî

Hem arif û kamil kirî (Feqîyê Teyran, Ey Av û Av, b. 33, r. 122)

Feqî ji bo xelqê, bingeha rêya kamilbûnê, bi aqilkirina Xwedê, bi naskirina Xwedê terîf dike. Li gor wî her çî kesê ku ji xelqê ye yanê ewam e, Xwedê aqil bike hikmetên Xweda îdrak bike ew kes dê nefsa xwe jî kamil bike.

Subhan ji şahê zulcelal

Fikrê me neqşê bê zewal

Hal bê mecaz naête bal

Kamil dibî b'ulfîyyetê

Ew dê bi vê kamil bitin

Derwêş ku sahibdil bitin

Dê nûr ji nûrê hilbitin

Ji meş'ala nubuwwetê (Feqîyê Teyran, Şêx Sen'an b. 4, r. 239)

Feqî di berdewamiya terîfa kamilbûnê de dîyar dike ku kesên ehlê dil bin, yanê dilê wan pak be û bikarin tê de tecelîyên Xweda, hikmet û siran bibînin, dê ji meşaleya nubuwwetê nûrê bigirin û ew dê bi nûra Muhemedî kamil bibin. Li gorî sûfîyan di alemê de mexlûqê ewil Hz. Muhemed (sew) e. Pêşî ew hatîye xuliqandin û ew wekî prototîpa însan e. Însan di dinê de ji wê prototîpê dûr ketîye û her çî kesê ku nêzîkê wê prototîpê bibe yanê nêzîkê heqîqeta Muhemedî bibe bi heman awayî nefsa xwe kamil dike û dibe însanê kamil (Kılıç, 2012: 100). Ji bo ku heqîqeta Muhemedî ji her kesî nêzîktirê Xaliqê xwe ye her însanê ku bi têkoşîna xwe ve bigihîje wê meqamê bi Xweda re dikeve nav ulfetê û li gorî Feqî bi vê ulfîyetê kamilbûna wî tamam dibe.

Kîmya li ba min 'aqil e

Însan bi 'ilmî kamil e

Re'ya ne ehlan muşkil e

Xelqê mudam di xefletê (Feqîyê Teyran, Bersîsê 'Abid, b. 133, r. 366)

Di berhemên tesewufî de bi giştî mefhûmên Heq û xelqê li dijî hev in. Li gorî mutesewifan xelq her dem ehlê nefsa xwe ye û li ser xerabîyê îtifaqê dike. Heq ji daxwazî û hewesa xelqê dûr e lewra xelq bi giştî bi ferman û hukma Heq emel nake ew bi hewa û menfeeta xwe qerar dide. Feqî jî bi heman usûlê xelqê bi xefletê sûcdar dike û qerara wan wekî muşkilê dinirxîne. Li gorî terîfa wî xelq ne ehl e ew ji bo ku ji hal û meqaman dûr e bi heman awayî ji Heqî jî dûr e û qerara wan muşkil e. Bi tenê kesên ku bi aqil û ilmî (hem zahirî hem batinî) fêr bûne û emel kirine xwe ji pey xelqê ne ehil xelas kirine û bi vî awayî gihîştine meqama kemalatê.

2. 2. 14. Fena

Fena,peyveke erebî ye û di ferhengê de tê meneya tunebûn û fanîbûnê (Cebecioğlu, 2009: 208). Di tesewufê de jî bi giştî di meneya fenafillah de tê bikaranîn. Sûfî bi mefhûma fenayê tunekirina hemû kar û hewesên xerab qest dikin. Însanekî ku di dilê wî de Xweda hebe û gihîştibe meqama fenayê, êdî bi wî re hemû cazîbeya masîwayê yanê cazîbeya hemû tiştên ji xeyrê Xweda tune dibin. Mal milk û meqamên dinyewî bala kesên ehlê dinyayê dikişînin lê belê fena halekî wisa ye ku di dilê sûfîyan de hemû şewqa ji bo dinyayê tune dike. Li gorî hin metesewufan bi fenabûnê hemû guneh û daxwazîyên gunehan, ji insan tune dibin û insan digihîje sifetê îsmetê (bêgunehbûnê) (Kelabazî, 2013: 185). Di halî fenabûnê de sûfî bi tenê hay ji Xwedayê xwe heye ji xeyrê wî her tişt li ber çavê wî fanî dibe. Feqîyê Teyran jî di helbestên xwe de behsa mefhûma fenayê kirîye. Ev mefhûm di cihek de di meneya fenafillahê de di cihekî din de jî di meneya fanîbûnê de bikaranîye. Di berhemên tesewufî de mijara fena û beqayê bi hev re tên bikaranîn. Beqa piştî meqama fenabûnê guherîna rewşa menewî ya salikan e ku bi wan re hewes fanî dibe lê belê eşq û îtaeta Xweda jî baqî dibe (Ulutaş, 2008: 476). Em ê di binê serenavê beqayê de behsa vê meqamê bikin.

“Mîm û Hê” şairkî pak e

Herkesê b’ruh bû ji make

Hemîyan dê ew fena ke

Ew jî şahê qudretê (Feqîyê Teyran, Îro Girya Me Tê, b. 24, r. 145)

Feqî li vê derê behsa fenafillahê dike. Li gorî terîfa Feqîyê Teyran ew şairekî pak e û hemû ruh ji çavkanîyek hatine. Mijara ruhî dê di binê serenavê ruhî de were dîyar kirin. Di berdewama bendê de Feqî behsa fenabûna însan dike. Li gorî terîfa wî Şahê Qudretê yanê Xwedayê alemîn bi eşqa xwe sûfîyan fena dike. Eşqa Xweda wisa dijwar e ku hemû sûfî bi wê eşqê ji hewes û daxwazîyên xwe ji xerabî û neqencîyên xwe xelas dibin. Eşqa Xweda xerabîyan dişewitîne û tune dike. Piştê ku di dilê sûfîyan de tiştên ji xeyrê Xweda tune bûn, aşiq digihîje halê fenayê.

Feqî go bilbil taze

Tu bilbilek sewda yî

‘Îşqa gulê mecaz e

Tu yarek bê wefa yî

Dostê ebed bixwaze

Da lê nebit fenayî (Feqîyê Teyran, Feqe û Bilbil, b. 12, r. 152)

Feqî di vir de fenayê di meneya fanîbûnê de bikartîne, ji bo ku sûfî bigihîje beqayê yanê bi meşûqê xwe re baqî bibe divê ku dostê ebed (Xweda) bixwaze. Lewra li gorî wî dostên fanî meriv jî bi xwe re fanî dike û sûfî ji bo ku di dinyaya fanî de tune nebe, divê ku daxwazîya eşqa heqîqî bike. Li gorî sûfîyan her çi însanê ku di wextê jîyana xwe de rizayê Xweda bi dest nexê û di dinê de negihîje Xweda, ew kes her wekî ku tune bûye. Lewra ji bo sûfîyan ku rizayê Xweda tune be her wekî ku tu tiştêkî tune ye.

2. 2. 15. Beqa

Mijarên fena û beqayê bi hev re ji nêzîk ve eleqedar in ku ji ber vê sedemê ev her du mefhûm di piranîya pirtûkên tesewufî de bi hev re hatine bikaranîn. Beqa meqamekî tesewufî ye ku piştê halê fenayê pêk tê. Di halê fenayê de xerabîya beşerê fanî dibe, yanê însan ji alîyên xwe yê xerab xelas dibe û bi awayekî tevahî pak dibe. Di meqama beqayê de jî piştê ku beşer ji wesf û alîyên xerab xelas dibe êdî di warê qencî û başîyê de jî baqî dibe (Yılmaz, 2015: 215). Di mijara fena û beqayê de Etar jî di Pendnameya xwe de wiha dibêje: “Ey lawiko, ji bo ku tu ji Xwedayê xwe xeberdar bî, merîfetê hîn be. Her kî arifê Xwedayê xwe be, di fenayê de dibîne beqaya xwe.” (Etar, b.n.ç., r. 28)

Feqî go bilbil taze

Tu bilbilek sewda yî

‘Işqa gulê mecaz e

Tu yarek bê wefa yî

Dostê ebed bixwaze

Da lê nebit fenayî (Feqîyê Teyran, Feqe û Bilbil, b. 12, r. 152)

Feqîyê Teyran di mijara beqayê de agahîyeke muhim dide. Ew behsa destpêka meqama beqayê dike û ji bilbil re dibêje ku “dostê ebed bixwaze, da lê nebit fenayî” yanê li gorî terîfa Feqî, rêya beqayê pêşî bi daxwazîya eşqa heqîqî ve dest pê dike û meşûqê heqîqî ji bo ku baqî ye di encamê de ew, aşiqên xwe jî digihîjîne meqama beqayê û wan baqî dike.

Feqî:

Perwane lew dimirit

Xweş nîn e ev bijînê

Zeîf e xwe nagirit

Tîj e berqa evînê

Di perdê nasebirit

Perde kemala dînê

Mela:

Perwane lew disojî

Li lem’eya cezbatê

Fida kirin ‘umr û jî

Di keşfa sebbehâtê

Ku da ji nû ve vejî

Baqî bit di heyatê (Feqîyê Teyran, Feqe û Melê, b. 33, 34, r. 192)

Li vê derê Feqî û Mela li ser mijara “beqa”yê sekinîne ku ji bo mesele bê fêhm kirin em mecbûr in gotinên her du şairan bi hev re binirxînin. Feqî, li vir behsa berqa evîne dîke û halê aşiqan dişibîne “perwaneyê / perperokê” û dibêje ku perwane dixwaze bigihîje ronahîyê, lê belê perde li ber ronahîyê heye ku ev perde li perwaneyê pir dijwar tê ku ew ji ber vê dijwariyê nikare di ber xwe bide û dimire. Li vê derê qesta Feqî ew e ku seydayê xwe di vê mijarê de bide axaftin û meseleya “beqayê” pê bide diyar kirin. Melayê ku bersiva Feqîyê xwe dide jê re rêzikên beqayê eşkere dîke ku li gorî Mela, perwane heta ku bi eşqa ronahîyê xîret neke û di rêya gihîştina ronahîyê de neşewite, yanê canê xwe ji dest nede nikare bigihîje beqayê. Li gorî Mela rêya beqayê, ji fenayê derbaz dibe ku pêşî hewce ye perwane fanî bibe, piştê ku perwane fanî bû wî çaxî ew dikare bigihîje heyata rastî û ji nû ve dikare bijî û baqî bibe.

2. 2. 16. Cemal

Cemal di edebîyata tesewufê de di meneya delalbûna Xweda de tê bikaranîn. Sûfî, sifetên Xweda yê ku nîşaneyê lutf û rizayê wî ne bi navê cemalê terîf dîkin (Uludağ, 2012: 86). Çawa ku Feqî jî di helbestên xwe de diyar dîke helbestvanên mutesewif bi israreke mezin daxwazîya cemala Xweda dîkin. Lewra rizayê îlahî, razîkirina Xweda ji bo wan armanca mezin e. Li gorî mutesewifan malê dinê û daxwazîyên dinê dema ku di dilê sûfîyan de cih bigire ew li ber cemala îlahî dibin perde. Ji bo ku ev astengî cemalê perde nekin sûfî dilê xwe ji masîwayê pak dîkin.

Sed hizar çav min divîna

Bayekî perde hilîna

Xet û xal min têr bidîna

Işq û qûtê can im ez (Feqîyê Teyran, Îro Ji Dest Husna Hebîb, b. 27, r. 134)

Feqî li vê derê bi “xet û xalan” ve cemala Xweda îşaret dîke. Li gor terîfa Feqî dema ku Xweda bi lutfê xwe perdeyên navbera xwe û evdê xwe rake meriv sed hezar çav dixwaze ku ev sed hezar çav jî ji bo temaşeya cemala Xweda meriv têr nake.

Aşiqê sêv û biha me

J’bo cemala mubtela me

Ger bibînim canfida me

Kes bi halê min nezan (Feqîyê Teyran, Ez Çi Bêjim, b. 6, r. 416)

Feqî xwe bi mubtelabûna cemalê diwesifîne. Cemal li gorî terîfa wî lufteke wisa mezin û bi qîmet e ku sûfî dibe mubtelayê wê û bê wê nikare îdare bike. Her wiha li gorî terîfa Feqî cemal wisa bi lezet e ku dema Xweda wê nesîb bike sûfî bi mirinê razî dibe. Wekî hemû mefhûmên tesewufî Feqî di dawîyê de dîsa vê şerhê datîne ku heta kesekî vî halî nejtî ne mumkun e pê bizane.

Tu pênc ferzî sucûda min

Qiyam û hem qu'ûda min

Tine carek te rû da min

Tu derman î û nivîşt î (Feqîyê Teyran, Ji Işqê Sotîme Welleh, b. 18, r. 438)

Ehsenallah tebarek

Ji sira wê cemalê (Feqîyê Teyran, Feqe û Melê, b. 5, r. 167)

Di vir de jî Feqî ji peyva “rûyê” cemala Xweda qest dike. Li gorî terîfa wî rizayê Xweda hemû îbadetên wî dorpêç kirine û razîbûna wî, lufî wî jî bo Feqî derman e. Her wiha dîyar dike ku lezeta cemalê jî bo birîna dilê sûfîyan dermanê herî xweş û bikêrhatî ye.

2. 2. 17. Zikir

Zikir, bilêvkirin û bibîranîn e, bibîranîna Xweda û dîrketina ji halê xefletê ye (Uludağ, 2012: 393). Di tesewufê de zikir jî bo nêzîkbûna Xweda yek ji wesîleyên herî muhim e. Li gorî sûfîyan zikir ne bi tenê dubarekirina navê Xweda ye. Ew, zikrê wekî terzeke jîyanê dibînin ku li gorî wan divê‘evd her tim Xweda di bîra xwe de bihêle yanê divê ku Xweda bi tu awayî neyê jibîr kirin. Ev bîranîna berfireh jî bo sûfîyan zikr e. Zikir digel bîranîna Xweda jibîrkirina hemû tiştên ji xeyrê Xweda ye. Bi vî awayî zikir di ilmê tesewufê de xwedîyê du alîyên girîng e. Yek herdem bibîranîna Xweda û du jibîrkirina hemû tiştên ji xeyrê Xweda. Sûfî zikrê bi vî awayî fêm dikin û pêk tînin. Feqîyê Teyran jî zikrê di heman meneyê de qebûl dike û ji bo

pakkirina dilê sûfîyan wekî wesîleyeke girîng terîf dike. Li gorî wî jîyana sûfîyê bê zikir mîna xwarina bê xwê ye ku lezetê nade tu kesî.

Qet bê hubê xêr nabitin

Mîr bê hîsab mêr nabitin

Can ji meyê têr nabitin

Dil bê zikir nûr nadetê

Zikrê civata bê melek

Sed car bikin, amî gelek

Şubhê te'amê bînemek

Dûr e ji zewq û lezzetê (Feqîyê Teyran, Şêx Sen'an, b. 20 r. 243)

Li gor Feqî zikir, nûra dilan e. Dil bi zikra Xweda nûrê dibînin. Dil bi zikra Xweda ji tarîtiya masîwayê xelas dibin. Her wiha sûfîyên ku bi dirustî zikrê bikin ji tarîtiyê xelas dibin û ji eşqa ku meriv jê têr nabe tehm dikin. Lê belê sûfîyên ku hikmeta zikrê fêm nekin ew nagihîjin tu qonaxek û ji seyra xwe jî tu lezetê hîlnadin.

Zikrê wacib e 'amî bikin

Nêzîkî şeyx sofî bikin

Murşîd murîdî hî bikin

Xaric bikin ji zulmetê (b.n. b. 21, r. 244)

Li gor terîfa Feqî zikra Xweda li ser her kesî wacib e. Lewra zikir ronahîya nûra Xweda ye û hemû evdên Xweda hewcedarê ronahîya wî ne. Di vir de divê ku du cureyên zikir ji hev bîr veqetandin ku yek zikra ewamê ye û bi vê zikrê kesên ku nû dest bi rêya tesewufê kirine bi alîkarîya zimanê xwe yanê bi wesîleya bilêvkirina zikrê ve qelbê xwe aram dikin. Lê piştê wextan eger ku Xweda pêşketinê nesîb bike zikrê ehlê dil dest pê dike ku ew zikir ji asta bilêvkirinê derbaz bûye. Di zikra ehlê dil de çawa ku me li jorê terîfa wê dabû bîranîneke kûr heye ku hemû jîyanê dipêçe. Ji xeynî van di vir de Feqî xusûsiyeteke tesewufî tîne ziman, li gorî wî hemû rê û rêzikên

tesewufê bi mamostetîya murşîdan ve pêk tîn û zikir jî ancax bi mamsotetîyeke pratîk bi hikmet û kûrahîya xwe ve tê fêm kirin.

2. 2. 18. Ruh

Ruh alîyê baqî yê însan e. Di pêşîya xuliqandina bedenê de hebû û piştê ku beden fanî bibe jî ruh dê bimîne. Bedena însan ji bo dinyayê hatîye xuliqandin lê belê ruh hebûneke cuda ye û li gorî tesewufê ew ji bo naskirina Xweda ji bo gihîştina cem Xweda hatîye xuliqandin. Lewra çavkanîya wî Xweda ye. Ew ji cem Xweda ve hatîye û serfirazîya wî jî, her bi gihîştina cem Xweda ye. Hin aliman ruh wekî letîfeyeke şîrove kirine û li gorî wan cihê wî qelb e. Muxatabê fermanên Xweda, berpirsyarê îmtihana Xweda ruh e (Uludağ, 2012: 298).

Canê di navê nefsi ye

Vêkra hemû bû beşerî

Maka wicûdan fanî ye

Er dê bizanî vî derî

Eslê rûha me baqî ye

Lew jê nedakin xawerî (Feqîyê Teyran, Ellah Çi Zatek Ehsen e, b. 18, r. 109)

Di serenava nefsê de me terîfa Feqî ya di derbarê nefsê de nivîsîye, ji bo wê em li vê derê heman meseleyê dubare nakin. Em ê li vir di çarçoveya terîfa Feqî de behsa mefhûma ruh bikin. Feqî li vir îşaret dike ku ruh ji bal Xaliqî ve yanê ji bal Xwedê ve hatîye û ruh jî mîna xwedîyê xwe baqî ye. Di vir de Feqî bi taybetîyên fanîbûn û baqîbûnê, ruh û bedenê ji hev cuda dike. Li gor wî her çi kesê ku ji ruhî bawer bike û neke bi wesîleya fanîbûna bedenê ve dê baqîbûna ruhê hîn be “Er dê bizanî vî derî”.

“Mîm û Hê” şairkî pak e

Herkesê b’ruh bû ji make

Hemîyan dê ew fena ke

Ew jî şahê qudretê (Feqîyê Teyran, Îro Girya Me Tê, b. 24, r. 145)

Li vir Feqî ji ser ruhê ve zatê Xweda nîşan dide. Di ayeta 29an a sûreta Hicrê de Xweda bi xwe beyan dike ku ruhê însanan ji ruhê xwe afirandîye. “Dema min ew

tekûz kir û min ji ruhê ku mexlûqê min e puf kirê, vêca di cih de hûn jê re herin sicûdê.” Her wiha Feqî di derbarê ruhî de vê agahîyê dide ku ruhê hemû însanan ji cihê hatîye. Maka ruhê her insanî, çavkanîya ruhê her kesî Xweda ye.

Hemyan murad eslê xwe ye

Ten sedefa canê me ye

Ruh perdeya nûra te ye

Hewl û quwet ji bal te tê

Ruh bê te qet-qet nalivîn

Zulfê di şeng ser nacivîn

Agir bi qelban nakevîn

Narê mecaza hirqetê

Meyla mecaz beşer divê

Dil daîma dilber divê

Ruh muhbeta ekber divê

Carna dibînin ru'yetê(Feqîyê Teyran, Şêx Sen'an, b. 13, 14, 15, r.242)

Beşer di eşqê de bi giştî qesta eşqa mecazî dikin lewra eşqa heqîqî barekî sivik nîne û her kes nikare wî barî wergire. Feqî di vê derê de pêşî rewşa beşerê yanê bi giştî rewşa insan dîyar dike û paşî jî rewşa xwe û aşiqan terîf dike. Li gor terîfa wî dilê sûfîyan her dem bi eşqa dilberê disoje û dilberê dixwaze. Her wiha rizqê ruhê hemû mirovan muhebata Xwedayê Ekber e ku ji her kesî zêdetir sûfîyên ku ruhê xwe nas kirine muhebata Xweda divên. Di dawîyê de Feqî serpehatîya xwe û ya hemû rêwîyên ehlê tesewufê dîyar dike. Ew Xwedayê ku bersiva daxwazîya evdên xwe dide daxwazîya Feqî û sûfîyên din qebûl dike û carinan bi dîtina ru'yetê nimetên xwe dide wan. Feqîyê Teyran di vê helbestê de ruhî wekî perdeya nûra Xweda terîf dike. Digel vê dîyar dike ku ruh bê Xweda, bê muhebata Xweda nikare hêza xwe zêde bide. Eger ku ruh ji Xweda dûr bikeve qet nikare bilive, yanê bê hêz dikeve. Lewra çawa ku ji bo

saxîya bedenê xwarin û av hewce ye bi heman awayî ji bo saxîya ruhî jî muhebeta Xweda hewce ye.

2. 2. 19. Ru'yet

Ru'yet di dîne îslamê de di meneya dîtina Xweda de tê bikaranîn. Li gorî îslamê digel hin îxtilafan tê bawer kirin ku misilman di axiretê de dê Xweda bibînin. Alimên mutesewif jî bi giştî di vê bawerîyê de ne ku misilman teqez roja axiretê Xweda dibînin. Lê belê digel vê, di tesewufê de tê bawer kirin ku însan ne bi çavê dinê bi çavê qelbê xwe ve li dinyayê jî dikarin Xweda bibînin. Hinek mutesewif ru'yetê wekî cureyek tecelîya Xweda şîrove dikin, hinek din jî bi çavê qelbî raste rast behsa dîtina Xweda dikin (Kelabazî, 2013: 73). Di mijara ru'yetê de di navbera alimên mutesewif de jî îxtilaf hene. Li gorî hinekan dîtina Xweda mukafata herî mezin e û ev mukafat ne mumkun e ku di dinê de bê dayîn. Lê belê li gorî hin mutesewifên din jî bi çavê qelbî ru'yet yanê dîtina Xweda di dinê de jî mumkun e. Ji helbesta Feqîyê Teyran tê fêhm kirin ku ew jî wekî qismê duyemîn difikire û dîyar dike ku di dinê de jî ru'yet mumkun e.

Kesê ku girtî yar e

Bi dil yekê d'hebîni

Êdî nayê qerar e

Dê daîm bixwînî

Xiyal û xem di dar e

Divê kengê bibîni (Feqîyê Teyran, Feqe û Bilbil, b. 4, r. 148)

Meyla mecaz beşer divê

Dil daîma dilber divê

Ruh muhbeta ekber divê

Carna dibînin ru'yetê (b.n. b. 15, r. 242)

Feqî di vir de behsa dilê sûfîyan dike ku wî daîma mehbûbê xwe divê û mehbûbê ku daxwazîya dilê sûfîyan qebûl dike carinan ru'yetê nîşanê wan dide. Feqî

di derbarê ru'yetê de terîfeke berfireh nake lê belê di meseleya dîtina wê de bi awayekî eşkere fikra xwe dîyar dike. Li gorî wî qelbê ku meşûqê ekber yanê Xweda dibe, carinan dikare ru'yeta wî bibîne.

Ji eşqa te ezî dînim

Şev rojê d'xîyalê da

Hero carek te nabînim

Wekû gerham di malê da (Feqîyê Teyran, Ji Eşqa Te Ezî Dîn im, b. 1, r. 479)

Di vê derê de jî Feqî ji ber ku têra xwe ru'yetê nabîne gilî û gazindan dike û dîyar dike ku ji ber eşqa Xweda dîn bûye.

2. 2. 20. Felek

Felek di ferhengan de di meneya asîman, gerstêrk û bextê de tê bikaranîn. Di edebîyata klasîk û edebîyata tesewufê de mefhûma felekê, bi giştî di meneyên neyînî de têne bikaranîn (Pala, 2011: 149). Di bawerîya mezhebên ehlê sunetê de gilîkirina ji felekê yan sûcdarkirina felekê dirust nayê dîtin. Lewra Xaliqê qedê û bextê insanî yanê Xaliqê felekê jî her Xweda ye û li gorî aliman her kes jî 'emelên xwe berpirsyar e. Tu kes nikare felekê û îmtihana Xweda sûcdar bike. Le belê her çî qas alimên mutesewif, sûcdarkirina felekê neven û li dijî vê derkevin jî, di helbestên sûffyan de felek bi awayekî nebaş hatiye terîf kirin. Di helbestên Feqîyê Teyran de jî felek, wekî mefhûmeke neyînî hatiye terîf kirin. Felek, di berhemên Feqî de bi bê wefabûnê, bê mirwetîyê, bê îtibarîyê hatiye wesifandin.

Ey felekê bê wefayê

Te çira muhlet nedayê

Yar di nav axê gihayê

Ey felek bê mirwetê

Ey felekê bê î'tibar

Min bi te nîn in qet çu car

Nê te gelek mehbûb veşar

Paşî ewan xal û xetê (Feqîyê Teyran, Îro Girya Me Tê, b. 8, 9, r. 141)

Li gorî Feqî, felek ji ber ku mehbûbê bi çerx û fetlên xwe vedişêre bê wefa û bê îtibar e. Felek ji bo ku li ber xet û xalên meşûqê dibe perde Feqî jê ne razî ye û qet pê îtibar nake.

2. 2. 21. Uzlet

Uzlet di ilmê tesewufê de dûrketina ji xelqê ye ku sûfî, ji bo xweparastina ji gunehan xwe bi tenê dihêlin (Uludağ, 2012: 364). Xelwet û înziva jî di edebîyata tesewufê de bi meneya uzletê ten bikaranîn. Sûfî ji bo ku xelq û Heqî wekî du mefhûmên li dijî hev dibînin li gorî bawerîya wan meriv ji xelqî çî qas dûr bikeve ji alîyê din ve ew qas nêzîkê Heqî dibe. Lewra li gorî sûfîyan xelq jî mîna malê dinê ye û ji masîwayê tê hesibandin. Di ilmê tesewufê de îltifata xelqê yanê pesindayîna xelqê ji bo sûfîyan rêya rîyayê vedike û sûfî rîyayê wekî tofaneke menewî dinirxînin. Her wiha wekî gelek mutesewifan Feqîyê Teyran jî, ji bo nêzîkbûna Xweda uzletê pêşniyaz dike.

Yarîya xelqê ne hemwar

Jê bikin tobe, îstixfar

Dê kene kamil gunehkar

Tenîya duhn veketê (Feqîyê Teyran, Bersîsê ‘Abid, b. 91, r. 356)

Di vê derê de Feqî uzletê îşaret dike û ew, ehlê dil hişyar dike ku xwe ji yarîya xelqê ne hemwar dûr bikin û ji dostîya xelqê tobe bikin. Her kesekî ku Xweda ferasetê dabe wî û rêya tesewufê xistibe nesîbê wî divê ku berê xwe ji xelqê veqerîne, berê xwe bide Heq. Dema ku dilê wî bi xelqê ve meyl bike lazim e ku ji ber vê meyla xwe tobe bike lewra meyla xelqê wekî tenîya bi dohn e, ev cureyê tenîyê dema ku di laşê meriv bigere paqijîya wê gelek zehmet e. Her wiha tê dîtin ku Feqî muhebeta bi xelqê re wekî xetereyê mezin, wekî belayê ku jê xelasbûn pir dijwar e dinirxîne.

2. 2. 22. Firqet

Firqet di edebîyata klasîk de di meneya cudabûn û cudamayîne de tê bikaranîn (Pala, 2011: 159). Ji bo aşiqan firqet halekî girîng e ku ew gelek car vî halî dijîn. Mefhûma firqetê di edebîyata tesewufê de û di helbestên Feqîyê Teyran de wekî

mefhûmeke neyînî tê dîyar kîrin. Firqet, xusûsen bi mefhûma eşqê re têkildar e. Ji bo aşiq çawa ku di pêşîya wusletê de mukafata herî mezin ru'yet yan jî cemal e, bi heman awayî firqet jî, ji bo aşiqan bi rastî derdekî neyînî ye ku eş û elema wê tu zewqê nade aşiqan. Ew ji bo eşqa wan belayekî pir mezin e. Şairên mutesewif dema ku behsa eşa firqeta xwe dikin bi giştî wê dişibînin hin tiştan. Feqîyê Teyran jî wekî hemû sûfîyên aşiq ji eşa firqetê gilîdar e û ew jî firqeta xwe dişibîne bendê, narê (agirê), derbê û kerbê.

Ma di benda firqeta te

Canfedayê xidmeta te

Da bibînim rehmeta te

Nobedarê xan im ez (Feqîyê Teyran, Îro Ji Dest Husna Hebîb, b. 17, r. 132)

Di vir de Feqî behsa halê firqetê dike û di wî halî de bendewarîya xwe ya bêçarîyê tîne ziman. Helbestvanên sûfî bi giştî di rewşa firqetê de lave û fizar dikin bi meşûqê xwe de, da ku wî halî bi zûtî ji ser wan rake. Feqî jî, ji bo ku Xwedayê Rehîm bi rehmeta xwe bike û wî ji halê firqetê xelas bike, dîyar dike ku bi canfedayî nobedarîya rehmetê dike.

Herçî dîkit ew mîr dîkit

Xêr û şeran teqdîr dîkit

Daxan li qelban pir dîkit

Sohtim bi narê firqetê (Feqîyê Teyran, Îro Girya Me Tê, b. 5, r.140)

Di vir de jî Feqî eşa firqetê dişibîne agirê û bi bawerîyeke samîmî teslîmîyeta xwe pêşkêşê Xweda dike. Li gorî terîfa wî Xwedayê ku xêr û şeran teqdîr dike ji her tiştî agahdar e û her çi pêk bê bi ilm û zanîna wî ye. Her wiha ew bawer dike ku halê firqetê jî bi teqdîra wî ye. Feqî digel hemû eş û elema firqetê dîyar dike ku ji halê xwe razî ye û teslîmê hukmê wî ye.

Firqeta wê her bi derb e

Daîma eşan û kerb e

Ê ku dî zanî çî derb e

Min ji xewfan xew netê (b.n. b. 18, r. 144)

Li vir jî Feqî dîsa behsa êş û kerba firqetê dike. Li gorî terîfa wî firqet halekî bi êş û kerb e, ev rewş sûfiyan diêşîne û kerba wan zêde dike. Di bendê de Feqî, dîyar dike ku ew ji ber derba firqetê birîndar bûye. Di dawîya bendê de mefhûma xewfê jî tê bikaranîn. Feqî dîyar dike ku ji ber firqetê ketîye nav tirsê û ji xewê bûye. Her wiha ew di navbera firqet û xewfê (tirsê) de têkilîyeke datîne ku em ê wê têkilîyê di binê serenavê xewfê de pêşkêş bikin.

Bê ism û cismê dilberê

Çi b'kim bi ava kewserê

Dê ixtiyar kim seqerê

Nar xweştir e ji firqetê (Feqîyê Teyran, Şêx Sen'an, b. 197, r. 293)

Feqîyê ku heta niha firqet dişibanda nar û digot “narê firqetê”, di vir de asta dijwarî û êşa firqetê bilindtir dike û derdixe asta herî jor. Li gor terîfa wî agir li ber êş û elema firqetê wisa sivik dibe ku êdî êşê nade, xweşîyê dide û ji meriv re xweş tê. Her wiha vî agirî jî dişibîne agirê cehennemê û dîyar dike ku agirê herî dijwar (ê cehenemê) ji firqetê xweştir e. Bi rastî Feqî di vî bendê de şibandineke ecêp pêk tîne. Ew ji ser mefhûma firqetê ve dîyar dike ku ava kewserê (cînetê) bê feyde û lezet e, agirê cehenemê jî bê êş û elem e. Bi vî awayî dixwaze ku bide zanîn rewşa firqetê çi qas rewşeke dijwar e.

2. 2. 23. Dilber

Di helbestên tesewufî de mefhûma dilberê wekî wesf û navê meşûqê tê bikaranîn. Ev peyv ji lêkera “dilbirinê” tê (Uludağ, 2012: 108), ji bo ku meşûq bi eşqa xwe dilê aşîqê dibe jê re dibêjin dilber. Feqîyê Teyran di bendek de taybetîyeke dilberê kifşe dike. Li gorî terîfa wî rûyê dilberê mîna hîvê ye.

Seher her rojê meyxanê

Xerab û serxoş û mest im

Mela uzra me meqbûl e

Ku dilber mahê sîma ye (Feqîyê Teyran, Îlahî Lew Dikim Zarî, b. 5, r. 238)

Feqîyê ku bi eşqa meşûqê di dema seherê de xerab û şerxweş bûye, bangê Melayê Cizîrî dike û dîyar dike ku ji bo aşiqan ‘uzr û qebahet tune ne. Lewra dilber xwedîyê sûreteke wisa bedew e ku mîna hîvê ye. Her çî kesê ku hay ji rûyê dilberê hebe serxweş dibe û ev serxweşî ji bo wî qebahet nîne.

Ew dilbera gerden letîf

Way nazika qametelîf

Qamet ji reyhana xeffîf

Wêran ez im malim xirab

Ey dilberê wey dilberê

Feryad ji destê keserê

Avek ji ava kewserê

Wêran ez im malim xirab (Feqîyê Teyran, Dilber, b. 2, 5, r. 157-158)

Feqîyê ku behsa dilberê dike yanê behsa wesf û bedewîyên meşûqê dike di dawîyê de jî tîne ziman ku ew ji ber eşqa wesfên wî wêran bûye.

Di dilda dilberek sade

Letîf û şox û bekzade

Ji qeydan kirime azade

Nihanî birime dîwanê (Feqîyê Teyran, Dilo Carek Xwo Hişyar Ke b. 4, r. 473)

Feqî di vir de jî pesna dilberê dide û dîyar dike ku cihê dilberê dil e. Li gorî terîfa Feqî tiştêkî din ku bala meriv dikişîne rêza “Ji qeydan kirime azade” ye. Lewra ji vê rêzê tê fêhm kirin ku eşqa dilberê eşqeke wisa bi tesîr û hêzdar e ku meriv ji qeyd û bendên hemû tiştên dinyewî azad dike.

2. 2. 24. Xewf

Xewf peyveke erebî ye û di meneya tirsê de tê bikaranîn. Di edebîyata tesewufê de xewf di meneya tirsê Xweda de tê bikaranîn (Secadî, 2004: 374). Sûfî mefhûma xewfê wekî tirsê cehenemê fêhm nakin. Li gorî wan xewf dûrmayîna ji Xweda ye. Ew

ditirsin ku bi kar û 'emelên xwe ji Xweda dûr bikevin. Xewfa wan ji ne razîbûna Xweda ye. Ew ditirsin ku dilê meşûqê ji xwe bihêlin. Ji bendeke Feqîyê Teyran tê derxistin ku ew jî, xewfê wekî şairên din ên mutesewif fêm dike û wisa terîf dike.

Firqeta wê her bi derb e

Daîma êşan û kerb e

Ê ku dî zanî çî derb e

Min ji xewfan xew netê (Feqîyê Teyran, Îro Girya Me Tê, b. 18, r. 144)

Li vê derê Feqî di navbera mefhûmên firqet û xewfê de têkilîyeke datîne û ji ser vê têkilîyê de terîfa xwe ya xewfê dîyar dike. Li gorî wî xewf hîsekî dijwar e ku ji ber wî xewa sûfîyan nayê. Firqet jî dûrketina ji Xweda ye ku sûfî ji wî halî gelek gilîdar in. Her wiha li gorî Feqî xewf, tirs a cehenemê nîne ew tirs a dûrmayîna ji Xweda ye. Dema ku Feqî bi firqetê dikeve halê dûrmayîne, ji ber îhtimala nerazîbûna meşûqê ditirse û ew xewf (tirs) xewê lê diherimîne.

2. 2. 25. Heybet

Heybet di seyr û silûka sûfîyan de halekî tesewufî ye ji bo ku têkilîya wî bi halê unsê re heye di kitêbên berê yê tesewufê de bi halê unsê re hatîye îzah kirin. Ev her du hal jî di netîceya tecelîya Xweda de pêk tên. Dema ku Xweda bi navê xwe yê Celal tecelîyê qelbê sûfîyan dike ew ji ber dijwariya rewşê dikevin halê heybetê û gelek zehmetîyan dikêşin. Dema ku Xweda bi rehma xwe bike û di dilê sûfîyan de bi cemelê tecelî bike, halê sûfîyan bi coş û xweşî vedigere unsê (Hücvirî, 2014: 434). Feqîyê Teyran, halê xwe yê heybetê di helbestên xwe de dîyar dike û her wiha tê fêm kirin ku Feqî ji gelek halên sûfîyan derbaz bûye.

Tîr tên ji qewsê surme lê

Agir ji ber wan hilhilê

Ser ta qedem tîk bûm xule

Dîn bûm ji remza heybetê

Heybet puling ku dîn kirim

Bê sebr û bê teskîn kirim

Zulfên herîr xemgîn kirim

Herdem ku ahîne me tê (Feqîyê Teyran, Îro Ji Eşqa Sorgulê, b. 2, 3, r. 469)

Li gorî terîfa Feqî halê heybetê halekî wisa dijwar e ku sûfî ji ber dijwarîya wî halî dîn dibin. Di kitêbên tesewufî de jî dema ku behsa qiseyên sûfîyên berê tene kirin rengê halê heybetê bi heman awayî bûye û nîşaneyên wî jî bi her sûfîyî re nêzîkê hev pêk hatine. Gelek sûfî dema ku behsa tecelîya Xweda ya bi rewşa Celalê dikin tînine ziman ku bi vî awayî dîtina heqîqetê li wan gelek dijwar hatiye û nekarîne ji vê rewşê re sebir bikin. Kifşeye ku Feqî jî di binê giranîya vî halî de gelek aciz bûye û dibêje “Bê sebr û bê teskîn kirim”.

2. 2. 26. Wîsal û Wuslet

